



# REWŞEN

Hejmar 8 - Çirya pêşîn

"Herçî bire şûrî destê hîmmet  
Zebtkir ji xwe re bi mîrî dewlet  
Bê ceng û cidal û bê tehewvir  
Qet vê şîxulê mekin tesewvir"  
-Ehmedê Xanî-

Kovara Yekîtiya Rewşenbîrêن Welatparêzêن Kurdistan

- Komcivîna Yekîtiya Rewşenbîrêن Welatparêzêن Kurdistan a Dûwemîn
- "Sîstema Cîhanê ya Nuh" û şoreşa Kurdistanê
- Ji Wedat AYDINê nemir re nameyeke vekirî
- Otonomî beçareti û binketin, serxwebûnxwazî rizgarî û serkevtin e

Hevpeyvînek  
bi Serokê ERNK  
**Abdullah  
OÇALAN** re

-+-

- Çend gotin li ser navan û navlêkirinê / M. Onder
- Mîr Celadet Bedirxan û hînbûn / Konê Reş
- Niştimana xwe binase: Colemêrg / Piştîwan B.
- Alîk û Fatikê / Usxan - Dumîlî
- Binêrin tometên olperestan  
çawa em kirine neyarêv hev / Xurşîd Mîrzengî
- Caferxanê Şîkakî / Ehmed Şerîfî
- Yekemîn çîroka Kurdî ya hunerî / Salimê Casim

# REWSEN

Kovara "Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistanê" ye

Kovara Kurdî ya çandî, hunerî, wêjeyî, dîrokî û ramyarî ye.

Salê çar hejmar têne weşandin

Navnîşana birêvebiriya kovarê:

YRWK:

Maxstr. 50-52  
5300 Bonn 1 / Germany  
Tel.: 0228 - 63 09 90

Abonetî:

Buhayê abonetiyê di salê de:  
Almanya 20.- DM  
Welatêñ din 34.- DM

Buhayê hejmarekê:

Almanya 5.- DM / Danîmarka 15.- DK /  
Swêd 20.- SEK / Fransa 15.- FF /  
Swîsre 5.- SFR

Bank:

YRWK  
S. Moussa  
Spendekonto:  
Sparkasse Bonn  
BLZ: 380 500 00  
Konto Nr.: 35 09 34

Piştî şandina mafê abonetiyê, ji çakiya xwe re fatora pereyan bişînin ser navnîşana YRWK.

Ji kovara Rewşen 3.000 nimûne çap dibin

Têbinî:

Eger ji aliyê nivîskaran ve bal nehatibe kişandinê, em wan agahdar dikin ku:  
- Em dikarin, nivîsan kin an jî dirêj biweşînin.  
- Nivîsan serrast bikin.  
- Biweşînin an jî neweşînin.  
- Nameyên digihine destêñ me, na-yêne vegerandin.

REWSEN



Li benda roja serkevtinê em ê tim biqîrin:

"An Kurdistan, An Neman!"

## Bîblografiya YRWK

### ★ 9 Nisan 1988:

YRWK; di civînekê de, bi besdarbûna 100 rewşenbîran, li bajarê Bonnê hatîye damezi-randin.

### ★ 2-7 Çirya Pêşîn 1989:

Beşdariya "Hefteya Çanda Kurdistan" - Holanda.

### ★ 27-28 Gulan 1989:

Komcivîna Yekemîn-Bonn

### ★ 5-10 Çirya Pêşîn 1990:

Beşdariya "Hefteya Çanda Kurdistan" - Stuttgart.

### ★ 15-17 Adar 1991:

Beşdariya Konferansa Stockholmê li ser pirsa Kurdan.

### ★ 22-23 Hezîran 1991:

Komcivîna Duwemîn - Bonn

### ★ 28 Hezîran 1991:

Îmzekirina protokola hevkariyê li gel Komeleya Ronahî ya Kur-dêñ Gurcistanê.

### Weşanêñ Rewşen:

1- Kovara Rewşen hejmârê 1-8.

2- Dilopeka Xwîna Dila, (Helbest) - Cankurd.

3- Dokumentên terora dewleta Tirkîyê - (Wêne) Zulfîkar TAK.

4- Kurdistan dagîrgeha di nava dewletan de (Devletler-arası Sömürge Kurdistan), lêkolîn - Î. Bêşîkçî.

5- Zagona Tunceli û Jenosîda Dêrsimê (Tunceli Kanunu ve Dêrsim Jenosidi) lêkolîn - Î. Bêşîkçî.


6- Kela Dimdimê, (Destana helbestî) - Jan Dost.

7- Zanyarî, Îdeolojiya Fer-mî, Dewlet, Demokrasî û Pirsa Kurdan (Bilim, Resmi Ideoloji, Devlet, Demokrasi ve Kurt Sorunu) lêkolîn - Î Bêşîkçî.

8- Dîwana Pertew Begê Hekarî (helbest, kilasik) - Wergerandin ji tîpêñ Erebî - Zeynelabidîn Zinar.



Rûpel 6 - 16



Rûpel 34 - 40



Rûpel 17 - 22

## NAVEROK

### Rûpel

|  |         |
|--|---------|
| Ji bo xwendevanan.....   | 4 - 5   |
| Komcivîna YRWK a Duwemîn .....   | 6 - 16  |
| Ji Wedat Aydin ê nemir re nameyeke vekirî / J. Esper .....                       | 17 - 22 |
| Otonomî bêçaretî û binketin, serxwebûnxwazî rizgarî û serkevtin e / Mirhem ..... | 23- 26  |
| Çend gotin li ser navan û navlêkirinê / Mahmut Onder .....                       | 27- 29  |
| Mîr Celadet Bedirxan û hînbûn / Konê Reş .....                                   | 30 - 32 |
| Hevpeyvînek bi Serokê ERNK A. OCALAN re .....                                    | 34- 39  |
| “Sîstema Cîhanê ya Nuh” û şoreşa Kurdistanê / YRWK .....                         | 40 - 41 |
| Ax... Ax Birazî / Kamuran Simo .....   | 42- 43  |
| Çawan Xelîl bû “şoreşger”? / Dr. Kurdo Husêن .....                               | 44 - 46 |
| Niştimana xwe binase - Colemêrg / Piştîwan B. ....                               | 47      |
| Alîk û Fatîk’ê /Usxan .....  | 48- 49  |
| Binêrin tometên olperestan çawa em kirine neyarêv hev / Xurşîd Mîrzengî .....    | 50 - 54 |
| Helbest: Sebrî Botanî, Xamevan, Gundî, Vanîkê Elîxan .....                       | 55 - 57 |
| Destana Şîrîn û Ferhad / Beşîr Botanî .....                                      | 58 -59  |
| Caferxanê Şikakî / Ehmed Şerîfî .....  | 60 - 61 |
| Yekemîn çîroka Kurdî ya hunerî / Salimê Casim .....                              | 62      |
| Lo Lo Wezîro / Mehabad Kurdî .....   | 63 - 64 |
| Protokola Hevkariyê .....  | 65      |
| Nameyêv Xwendevanan .....  | 66      |



Rûpel 47

### REWŞEN

# Xwendevanê delal

## Gelî xwendevanê REWŞENÊ

Biborin, heta niha di her hejmareke Rewşenê de hûn rastî guhertinênuh dibin. Erê, vê carê dîsa me amblema YRWK li ser ruyê pêşî guhertiye. Her weha rûpela duwemîn jî ji nuh ve hatiye xêzkirin. Guhertina amblemê yek ji bîryarê Komcivîna me ya Duwemîn e. Bîryara ji nuh ve xêzkirina rûpela duwemîn jî di civîna redaksiyona Rewşenê de hatiye wergirtin. Hêviya me ew e ku, kovara we her here ciwantir bibe û di dilê we de ji xwe re cihekî bi rêz û rûmet bigre.

### Hevalên hêja, rewşenbîr û xwendevanê welatprêz.

Ev du-sê mehêne amadekirina hejmara 8'an di dîroka gelê me de gelekî pêwistin.

Tevgera Rizgariya Netewa Kurdistan, di domaneke gelekî dîrokî re derbas dibe. Her roj serkevtin û pêşketinênuh pêk tê. Dijminênuh me ber bi rewşike bêçaretî û tarî ve diçin. Ketine ber kîferatîn mirinê. Lewma jî bi navê "avakirina sîstemeke cîhanî ya nuh" hêzên împiryalîzmê, û di serî de jî împiryalîzma Emerîka dixwazin xwîneke nuh bidin dijminênuh me û bi vê armancê iroj, hêzên xwe li Rojhilata Navîn û bi giranî li welatê me bi cih din. Hêviyên împiryalîzmê tenê li ser vê xalê kom dibin ku, bikaribe şoreşa Kurdistanê ji rewanê wê yê radikal û serxwebûnxwaz vala bike. Serokatiya hemdemî û şoreşger ji holê rake. Ji bona ku dewletêna faşîst bigîn vê mebes-ta xwe hemû duvikîn xwe, kev-neperestêna netewî û hêzên reformist jî dixe nava kar û dixwaze ew êrîşen xwe li dijê riya serxwe-bûnê bi hovîfî tund bikin.

Welatê me Kurdistan, bûye na-venda şoreşen Rojhilta Navîn. Li dora xeta me hemû hêzên anti-împiryalist û şoreşger kom dibin. Baş tê zanîn ku çawa împiryalîstên vê rojê -bi taybetî piştî *iflaskirina* sosyalîzma reel-mîna gurênuh dev bi xwîn xelekêna êrîşen xwe dibin ser hemû gelên bindest yên ku, ji bo azadî, demokrasî û serxwebûnê şerê xwe bilind dikin.

Niha li bakurê Kurdistanê roj bi roj gelê me kozik û çeperên nuh vedigre. Di gund, deşt û ci-yayêne Kurdistanê de, gerillayêne ARGK lêdanê mirinê li hêzên artêşa faşîstan dixin. Li hemû bajaran jî gelê me rabûye ser piyan, di bin ala ERNK de xwe kiriye yek, serîhildanê xwe bilind dike. Gelê me vê rojê bi sed hezaran dimeşe, dixwaze vê mesajê bigîhîne gelên cihanê: *Edî dem hatiye em bibin xwedîyên mala xwe û Komara Kurdistanê ya demokrat û azad ava bikin.*

Belê, hemû xelekêna şerê taybetî ji hev dikevin. Polîtika û manevrên Ozal valê derdikevin. Ne qanûna afûya bi şert dikare li pêşîya me bibe asteng û ne jî sextekariyên mîna serbestkirina zimanê kurdî dikarin mejîye gelê me jî rê derxin, ji ber ku êdî gelê me bûye xwedîyê pêşengê xwe yê hemdemî, bûye xwedîyê Eniya xwe ya yekbûyi û bûye xwedîyê şûrên tolehildanê, gerillayêne ARGK. Ka çete û cahşen wan li kuderê mane. Kontira û Ozel tîm (hêzên taybetî) ên wan dikarin çibikin. Na... partiya gelê Kurdistanê PKK di kongreya xwe ya çaran de bersiva hemû pirsan daye û banga yekîtiya rast û durist bilind kiriye. Yekîti tenê li ser bingeha prensipên serxwebûnê û bilindkirina şerê çekdarî dikare were ava kirin. Di metropolên împiryalîzmê de yekîti tenê di salonên xwes de li ser masan dimîne. Yekîti di çiya û baniyên Kurdistanê de û li ser bingeha xwînê tê ava kirin. Yekîtiya ku gel dixwaze yekîtiya berxwedan û têkoşînê ye. Hemû mirovên bi rûmet û şeref jî vexwendiyê wê yekîtiye ne.

Dewleta faşîsta Tirkîyê dizane

ci bi serê wê tê, lewma ci hêza xwe heye seferber dike û karekterê xwe yê rast weke dewleteke terorist nîşan dide. Di vê dawiyê de we dît çawa êrîşen xwe bi destê kontir-gerillayêne şerê taybetî û "komên mirinê" hajot ser gelê me, bê cudahî dixwaze jin, zarok û kalênuh me qir bike. Nimûneya herî zelal jî ewe ku roja 10'ê Tîrmehê bi çek û silahêne xwe gelê me yê sivîl li bajarê Amedê da ber gulleyan.

Erê, roja 10'ê Tîrmehê di dîroka me de, giringe bi tîpêng agirî were nîşandin. Çawa gelê me li zarê xwe yê hêja şervanê demokrasî û serxwebûnê, rewşenbîrê nemir endamê bijare yê YRWK Vedat AYDIN xwedî derket. Çawa ew roj kire weke rojeka serîhildana netewî. Belê, li Amedê gelê me weha digot: *"Qedera xwe em tenê dikarin binivîsin. Giring e leşkerên faşîzmê ji welatê me derkevin. Kontir-gerillayêne faşîstan nikarin me rawestînin û bitîrsînin. Hemû Kurdên hêja wê bibin Vedat AYDIN."*

Gelê me bi keviran êrişî ser leşker û tangên dijmin dikir û diqêrî: *"Biji PKK, Bijî Serok APO!"*

Bi vê rabûnê Amed bû manifestoya serîhildanê û li ber çavênen gelên cihanê nişanda ku ci dibêje û ci dixwaze. her weha serîhildanê xwe gihande piraniya bajarêne Kurdistanê.

### Xwendevanê delal,

Niha, şerê rizgariya me yê nûjen ketiye sala xwe ya heştan. Êrîşen li ser bajarêne Girkê Amo, Şîrnex û Cizîra Botan mîzgîna vê yekê bûn. Bi ronî hate xuya kirin ku ev şer şerê hemû gelê Kurdistanê ye. Ne leşkerên faşîstan û ne jî hêz û teknîka împiryalîzmê nikare vî şerî bide rawestandin. Gava 15'ê Tebaxê, ku di 1984'ê de hatibû avêtin niha gihiştiye bilindahiyêne pîroz û tîm jî bilind dibe. Rejîma tîrkan li ber vê rasitiye, dirûxe û tê xwarê. Tevaya cihanê hîm, hêz, rûmet û viyana gelê kurdistanê naskiriye. Seriyen faşîstan ketine nava gerî-

nekên bê dawî. Dûr an jî nêzîk wê seriyêن wan bigindirin. Bi hêviya peydakirina derfeteke xelasiya xwe, dîsa destê xwe dirêjî axa başûrê welatê me kirin. Belê, hêviyêن wan bûn bela serê wan, hîn bêhtir perîşan, rezîl û riswa bûn. Roja 5'ê Tebaxê ku bi deh hezaran leşker, bi tang, top, firoke û helikopteran êrîşî başûr kirin, rastî qehremaniya gerîlayêن ARGK û gîrsêن gel yên welatparêz bûn. Operasyona ku digotin: "Wê mîna seyran û şahiyeke derbas bibe" ji bona wan bû meşeka ber bi mirinê ve. Lewma tenê rev û bi sedan kuştî bûn para wan. Serokêن ARGK jî weha nîşandan "Kurdistan li ser navê bavê kesekî nehatiye tapo kirin. Gotinêن bakur û başûr derbas na bin êdî, tenê Kurdistan heye".

Artêşa faşistan sernizm û şikestî ji vê operasyonê vegerî û hêzîn ARGK ev azmûn (examination) bi serfirazî derbas kirin.

### Xwendevanêن hêja,

Dema ku ev bûyer pêktêن gelê me li başûrê Kurdistanê jî nişan dide ku, qet armanceke din, ji derveyê serxwebûnê nikare bibe buhayê xwîna şehîdan, ne otonomî û ne jî "otonomiya rasteqîne" nikarin gelê me ji rî derxin. Pêşmerge tenê weha dibêjin "Yan Kurdistan yan Neman!" Kesêndixwazin bibin wezîrên dewleta Irakê, bibin berdestiyêن Saddam bila herin, tiştekî wan bi gel ve girê bide nîne. Eve gelê me li bajarêن Hewlêr û Silêmaniye, Zaxo û Dihokê dengê xwe dighîne me û dixwaze axa welat ji hemû hêzîn gemar paqîj bike. Ya rast berxwedana gîrsêن gel e. Ya rast hêvî û daxwazêن jîn û zarakên me ne, ku bi canê xwe êrîşî leşkerêن Saddam dîkin. Ya rast serîhildan û rabûn e.

Li kîleka vê rabûnê jî li Rojlatê Kurdistanê jî gelê mî xwe komî ser hev dike. Hêdî hêdî dikeve ser riya serxwebûnê. Ne otonomî û ne jî hezar carî xudmûtari nikarin bersiva hêvî û daxwazêن gel bidin.

Belê, li her çar hêlêن Kurdistan

nê riya tekoşînê yek rî ye, di binala serxwebûnê de, rabûn, serîhildan û berxwedan e.

Xwendevanêن hêja, van rojan parsek dîsa di navbera Ankara, İstanbulê û Bexdayê de diçin û tênen. Pazara kirîn-firotinê didomînin. Xwe dihavêjin bextê doktorêñ tirkan û bi dil û can sipasiya wan dîkin û dibêjin: "Eman em di bextê we de ne, eger çend rayen kurd di mejiyê me de mabin, hilkişînin, bila êdî em bibin markayen orîgînal (Made in USA)". Belê, bi rastî jî wan "orginalîte" ya xwe, ji her demekê bêhtir vê rojê isbat kirine.

### Xwendevanêن rêzdar,

Dewleta faşista Tirkîyê hildiweşe, dirûxe û ber bi dawiya xwe ve diçe. Lewma bi hovîti û barbarî, vê carê destê xwe tavêje terorê. Dixwaze têkoşîna gelên Kurdistanê û Tirkîyê rabiwestîne û dure li hemberê civaka Ewrûpî bêje: Eve Tirkîye bûye welatekî demokrat. Belê bila baş were zanîn, êdî gelê Kurdistanê bi hemû çareyêن sexte razî nabe. Ci bibe bila bibe, gelê me ji hemû şêweyêñ fedekariyê re amadeye. Tu kes nikare têkoşîna me çember bike. Êdî cîhan dengê me dibihîse. Kurdistan ne Kurdistana berê ye. Gelê Tirkîyê jî ne mîna berê ye. Dîwarê tirsê hatiye hilweşandin û jîyana gel ya rojê bûye raperîn û serîhildan. Guleyên tolehildana hezârên salan bi destê gerîllayêن ARGK her rojê bi xurtî û hêz li singa dijminên xwînxwar û dagîrker dikevin. Erê, vaye zarokêن Dêrsimê, Maraşê, Keledizê, Helepçê, Amedê û Mehabadê ji nûh ve di riya serxwebûn û azadiyê de dimeşin. Pira azadî û berxwedanê Zonguldakê û Botan dighîne hev. Keda karkerêن şoresser û demokrat bi têkoşîna gelê Kurdistanê ve dibe yek.

### Rewşenbîrêن welatparêz,

De werin em bimeşin, binivîsin, bixwînin, bistirin û bi dilpakî bêjin: Roj roja bilindkirina pêlêñ berxwedanê ye. Roj roja yekîti,

hevgirtin û êrîşê ye. Roj ew rojeku em dîwârêن zindanê hilweşînin û gelên xwe derbasî azadî, demokrasî, xweşî û ronahiyê bikin.

Bese, bila êdî kes hêviyêن xwe bi dijmin ve girênedê. Bese êdî em xwe nexapînin. Senaryoyên sexte ji bona otonomiyê, ji bona mafêñ çandî û ji bona mafêñ mirovan bila rawestin. Riya Kurdishiya serxwebûn û azadiyê ye. Riya berxwedanê, şeref û rûmetê ye. Destên Saddam û Ozal yê gemar di nava xwîna me de ne. Evana nikarin bibin dostên Kurdish. Hemû têkiliyêñ bi van re têkiliyêñ xulamî û rezaletê ne. Hêzîn împiryalizmê jî bila ji welatê me derkevin. Bila çadir û betaniyêñ xwe bar bikin. Yê Kurdish biparêzin Kurd bixwe ne. Yê Kurdistanê ava bikin em bi xwe ne. împiryalizm ne heyrana çavêñ me ye, ew heyrana petrol, hebûn, sererd û binerdêñ me ye.

### Xwendevanê delal, Rewşenbîrêن hêja,

Mizgîniya beyanê nêzîk dibe. Vê carê Roj ya me ye, û wê bi rengêñ ala me ya, kesk û sor û zer were der. Pêwist e em bi rewane berxwedan û êrîşê li ser rewşa welat û hêviyêñ gel binivîsin. Kovara we Rewşen kovareke geleki mêvanhez e, singa xwe ya fireh ji nivîsêñ hemû welatparêzan re vedike û li benda we ye.

### Rewşenbîrê delal,

Gazidandan nekin, nebêjin "Hêvalên Rewşenê tenê siyasetê dizanîn". Em ci bikin? Ev qedera Kurdish e. Bawer bikin gelek caran em helbestêñ xwe bi gotinêñ: Evîn, şevîn, gul û nêrgizan destpêdikin û hîna nîvî nebûyîn, balafir, tang, kontir-gerîlla, Hayrî Kozakçioğlu û Ali Hassan Al Maçit têne bîra me.

Belê, her çiqasî siyaset ji bona me weke nan û avê bûye, lê dîsa jî, hemû tiştêñ xweş û delal dikarin li ba me cihê xwe bibînin.

Em li benda mêvaniya we, her dem amadene.

**Rewşen**

# KOMCIVINA YRWK ya DUWEMÎN BI SERKEFTIN HATE BESTIN

*"Di riya rizgariya netewa Kurdistanê de pêşvebirina çand, tore, wêje û zimanê kurdî"*



Di komcivîna YRWK de gelek bîryarê dîrokî û watedar hatin girtin

Foto: REWŞEN

*"Di riya rizgariya netewa Kurdistanê de pêşvebirina çand, tore, wêje û zimanê kurdî"*

Di bihara sala 1988'ê de, Yekîtiya me YRWK, bi civîneke dorfirê ku bêhtîrî 100 rewşenbîrê Kurdistanê tê de amade bûbûn, damezirandina xwe bi fermî da xuyakirin. Ev nêzîkî çar salan e ku YRWK di nava germiya jiyanê de, tevlî hemû zorî û nexweşîyan rîya xwe vedike û ber bi pêş ve dice. Niha, YRWK di nava karvaniyê de bûye xwe-

diyê serpêhatiyên hêja û bi nirx.

YRWK di vî temenê (umrê) xwe yê kurt de, gelek civîn, hevdîtin, semînar û xebatêن cihêreg pêk hanîne. Di meha Gulana sala 1989'ê de jî, Komcivîna xwe ya Yekemîn bestand. Di komcivîna yekemîn de, bi giranî li ser **pirsgirêk û gelşenî ideoloji û ramanî yên rewşenbîriyê** hate rawestan. Pişî komcivîna yekemîn, tevlî hemû kîmanîyên ku di karvaniyê de xwe nîşan didan jî, Yekîtiya me dest bi xebatên çapemenî û rîkxistinî (rêkxirawî) yên firehtir kir. Heta vê rojê 7 hejimarên kovara REWŞENê hatine der û 10 berhemîn rewşenbîrê welatparêz û pêşverû jî çap bûne. Li

gelek welatêن Ewrûpa şax û niwêne-riyên Yekîtiyê hatine avakirin.

Pişî amadekariyênu ku demeke dirêj hatine domandin, di rojê 22-23'ê Hezîrana 1991'ê de, komcivîna duwemîn bi beşdarbûna bêhtîrî 70 endam û mîhvanan, li bajarê Bonnê bi ser ket. Komcivîna Duwemîn ku weke pileyeke xebat û karguzariyê rewşenbîrê welatparêz bi vê nirxandinê dest bi karûbarê rojeva xwe kir. Rewşenbîran, di tevayê cîhanê de, di têkoşînînetewî û cînî de, rolên pêwîst û girîng leyîstine û dileyizin. Ji bo Kurdistanê jî girîng e weha be. Li welatê me gelek caran rewşenbîrê me pîvanênerast ji bo xwe hildi-

bijêrin. Her kesekî ku dizane bixwîne û binivîse, ne rewşenbîr e. Rewşenbîr ew mirov e ku bi nivîsa xwe dixwaze civakê biguherîne û ber bi pêş de bibe. Her weha jî, her demê amade ye ku bawerî û ramanê xwe bi karvaniya xwe biyâş bike (ispat bike/biselimîne). Mirovê ku civaka xwe nas neke, kul, êş, jan û derdêن gel nas neke û nebîne, nikare bêje ez rewşenbîr im. Di qesir û avahiyêن xweş de, dûrê jiyanâ gel û ji qedîr, çare û hêviyêن gel vejetandî, rewşenbîriyeke durust nikare serê xwe hilde.

Delameta rewşenbîrê Kurdistanê guhertin û pêşvebirina civakê ye. Rewşenbîrê Kurdistanê neçar in. Divêt di nava gel de, ji gel hînbibin û gel hînbikin. Anku hem şagirt û hem jî mamostayêن gel bin. Di Kurdistanê de gotineke rast, di dem û cîhê xwe de dikare li hemberî dijminan rola gulleyekê bilîze.

Rewşenbîrê Kurdistanê li kêleka zelalkirina van pirsan neçar in. Her wisan jî, li ber çareserkirina pirsên xwe yên rîkxirawî jî neçar in, yekîtiya xwe di riya rast de û di nava karvaniyê de ava bikin.

## *Êrîşên împiryalîzmê û dagîrkeran, Biryar û berxwedana gelê Kurdistanê*

"Komcivîna duwemîn, bi kîliyeke bê dengî, ji bona şehîdên Kurdistanê, şehîdên serxwebûn û azadiyê, dest pê kir. Diwana komcivînê û protokolnivîsê hatin hilbijartîn. Her weha Komcivîne dest bi girtina xalêن rojevê kir. Li ser rewşa cîhanê, Rohilata Navîn û Kurdistanê, bi kurî ev nîrxandinen ramyarî hatin pêşkêş kirin:

Ji her demekê bêhtir niha, Rohilata Navîn û welatê me Kurdistan, bala awira gelemeperiya cîhanê kişandiye ser xwe. Nemaze, pişî rawestandina serê Xelîcê (Şerê Bendava Faris), domaneke nuh di jiyanâ gelê herêmê de dest pê kirîye. Mekanîzmeya nakokiyêن bingehîn xwe livand û navenda şer derbasi welatê me Kurdistanê bû. Li hemberê êrîşên emperyalîzmê û dagîrkeran, berxwedana şoreşgerî ya gelê me bilind bû. emperyalîzm vê rojê, bi azîneyêن (meto-

dên) êrîş û zorbaziyê, dihajo ser gelên Rohilata Navîn û bi navê avakirina "Sîstema Cîhanî ya Nuh" li hemberê viyan û berjewendiyêن gelan, radiweste. Nexasim, pişî iflaskirina sosyalîzma reel împiryalîzmê kariye Yekîtiya Sovyetî li dû xwe bikişîne û durûtiya împiryalîzmê eşkere û zelal bû. Li hevberê rabûna gelan, bûye parastvanê rejîma Saddamî faşist û fatureya şer avêtin ser pişta gelê me û bêhtirî ji du mîlyon mirovîn me ber bi mirinê ve hajotin. Belê dîsan jî kes nikare bibêje, ku împiryalîzm bi ser ketiye. İroj gelên Rohilata Navîn rabûne ser piyan. Şerîn xwe yên mafdar; şerîn rizgariya netewî û çînayetî bilind dîkin. Împiryalîzm ketiye nava rewşike bêçaretiyê, ku qet nikare xwe jê rizgar bike. Di welatê me de jî, alozî û heriyekî weke li Vietnamê derdikeve pêşîya wê. Împiryalîzma ku dibêje ezê çekan li cîhanê kêm bikim, di civîna dawiyê ya NATO de, biryarêن zêdekirina çekan li Rohilata Navîn standiye.

Gelê me, di başûrê Kurdistanê de, pişî jarketina rejîma Saddam, serîhildanê serxwebûn û azadiyê bilind kir. Belê mixabin, ji ber valabûna mezin ji aliyê serokatiyê ve, nikarîbû ji wê rewşê, sûdênen mezin bigire û careke din rastê koçberî û qirkirinê bû. Bingeha vê yekê jî ew bû, ku serokatiya li wir, nikarîbû li hîvî û daxwazên gel xwedî derkeve û konevaniya xwe ya serbixwe ava bike. Lewma jî dîrokê careke din, salên 1975 û 1988'an hanîn pêşîya me. Bi ser de jî, hîna li ber serma û seqemê, ji birçebûn û belengaziyê bi hezaran mirovîn me dimirin. Serokatî jî bi rengekî ne bi viyan, ne bi bîr û baweriyêن gel xwe, havête hembêza dijminê faşist, kete bazaarî kîrrîn û firotinê, bû bingeha meşandina politîkayêن împiryalîzmê li ser Kurdistanê. Bi armanca avakirina asteng û aloziyan li pêşîya şerî serxwebûn û azadiyê, kete nava karvaniyekî ku pişta xwe dide plan û programên împiryalîzmê. Niha jî hewl dide xwe, ku hêzeke dişşoreşê pêşve bibe.

Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan-YRWK, çare û riya rizgariya ji vê rewşê, weha dibîne: Girîng e berxwedana gelê me bi hîm û hêzîn xwe yên serbixwe, bi rewan û viyanekî aza dom bike û di riya serxwebûnê de gelê me, meşa xwe ya azadiyê bi biryarêن

xurt bidomîne.

Di demeke weha de, ku li başûrê Kurdistanê ev bûyer pêk dihêن, li bakurê Kurdistanê gêrillayêن şerê serxwebûn û azadiyê, her rojekê hilgavtinênuh pêk dihênin. Girsên gelî jî, li hemû bajarên Kurdistanê, serîhildanê xwe xurt dîkin, ber bi serkevtin û serefraziyê ve diçin. Dewleta Tirk a faşist, roj bi roj, di krîza aborî (ekonomîkî), ramyarî (siyâsî) û leşkerî de noqî bin erdê dibe. Hemû dek û dolabên wê vala derdikevin. Li ser bingeha şerê çakdarî yê li bakurê Kurdistanê, yekîtiya gelê me jî dihê avakirin; nemaze, ku niha sistêma cerdevanan (çeteyan) hildiweşe û ji hev dikeve. Dewleta Tirk li vê dawiyê, dîsan dixwaze manavreyeke nuh bike karê xwe; pêşemîn bi derxistina biryara "efûyê" û bi deranîna "Zagona li Dijî Terorîzmê" dixwaze şerê xwe yên taybetî li hemberê gelên Kurdistanê û Tirkîyê bi zagonî mafdar nîşan bide. Gelê me, bersiva van hemû keft û leftên faşizmê bi xurtkirin û firehkirina şerê gêrilla, bi serîhildanê gelî dide.

Kin were gotin, li her çar perçeyên Kurdistanê bîr û baweriyênen serxwebûn-xwaziyê xurt dibin. Gelê me ji xwe retenê riya berxwedanê hilbijartiye..."

Di dawîya nirxandina ramyarî de ku ji hêla dîwana komcivînê ve hate çêkirin, piraniya beşdaran tevî danûstandinê fi-reh bûn û li ser van xalan bal hate kişandin:

Bê guman e ev platforma komcivînê xwediye kapasîteyeke xurt e. Tu gelş û pirsgirêkên konevanî ku em li ser, li hev nekin, tune ne. Çawa be YRWK di karvaniya xwe de kariye karaktera xwe ya ramyarî û prensîbên xwe yên bingê-hîn, ji gel û rewşenbîran re zelal bike. Ji xwe YRWK di eniya gel de, li dijî dagîrker û paşverûyan cihê xwe girtiye û konevaniyekî welatparêz a rast bi rê ve dibe. Armanç ew e ku her mirovekî rewşenbîr, li gora derfet û gengaziyênen xwe, têkîli navâ tekoşîna rizgariya netewa Kurdistanê bibe. Hemû besdarê komcivînê di vî alî de hemraman û homojen (mutecanîs) in.

Her weha pêwîst hate dîtin ku, rewşenbîrê Kurdistanê li ser guhertinê van salên dawîn çêbûne, vekolinê berfireh çêbikin. Girîng e, bersiva pirsên mîna: Sedemîn bingehîn ên guhertinê

ku li Ewrûpa Rojhilat çêbûne ci ne? Li Sovyetê ci dibe? Sosyalîzma reel cîma hilweşîya? Tiştê ku împiryalîzm dixwaze di bin navê "avakirina Sistemeka Cîhanî ya Nuh" de çê bike, ci ye? Li hemberê van guhertinan ci ji rewşenbîrê Kurdistanê dihête xwestin?

Piştî ku konevaniya YRWK di her warekî de bi zelaî hate şirovekirin, komîteya kargêr a YRWK ku di komcivîna yekemîn de hatibû hilbijartin rapora xebatê YRWK yên du salan pêşkêş kirin. Rapora komîteya karger bi tevayî 17 rûpel bûn. Niha, di vir de em ê çend xê-zan ji naveroka raporê biweşînin:

"Di avakirina Yekîtiyê de, pirsa girêdana bi gel û welat ve bingehîn e. Gelşen herî dijwar ku li pêşıya xurtkirin û firehkirina YRWK derdikevin, ev in: Ku, rewşenbîrê kurd li Ewrûpa, heta koçbe-

xwazin dibine navgîn û alavên (aletên) politikayêñ asîmîlekîrin û xwewindakirina kesaniya kurd û Kurdistanê. Ev cûre rewşenbîr, pir heyranê navê xwe ne. Belê navê Kurd û Kurdistanê jî, bi pariyên nan û çend hestîyan, bi otomobilên Volvo û çend quruşen ku dawiya mehê digirin, xwe erzan difroşin.

Komîteya Kargêr, berî her pirsekê li hemberê van raman û baweriyên çewt, enyeke şerî rastî û nerastiye vekiriye û bi prensip û xebatê xwe yên girêdayê berjewendêñ gel, serkevtinî kiriye para xwe.

Her çendî ku hevalên komîteya Kargêr pir caran bi sivikî li karê rîkxistinkirina YRWK nihêrîne û ji xwe re weke karekî bingehîn nedîtine, belê pêwistîya tijekirina vê valahîyê hatîye zanîn û gelek hewildan bûne ku şax û niwêneriyêñ

nava çend welatêñ Ewrûpayê de belav dimînin, pişî caran problemê teknîkî li pêşıya wan derdikevin, lewra civînên peryodîkî dereng diman. Bingeha xebatêñ kolektîv sist û qels dima. Têkîlî û alîkarî di nava wan de baş ne dihate kirin. Bi vê yekê jî kontrola li ser şaxan qels dima û destê alîkarîye baş nedîghîste wan.


Heta niha gelek astengêñ rîkxirawî ji holê hatîne rakirin û têkîlî bi sedan mirovêñ rewşenbîr re hatîye çekirin. Encamîn hêja êdî xuya dikin. YRWK bûye berhememeke şerî rizgariya netewî ya nûjen û çawa be jî wê eniya rewşenbîriyê bi eniya şerî serxwebûn û azadiyê ve bike yet.

Cudahiya bingehîn di navbera YRWK û komikêñ "rewşenbîr" ên Kurd li Ewrûpa de ew e, ku YRWK berdewama karûbarêñ rewşenbîrêñ welatparêz ên li welat kar û xebatê dikin li hemberê şerî li Kurdistanê pêş dikeve bi berpirsiyareke dîrokî daye pêşıya xwe û bûye perçeyekî eniya gel li dijî dagîrker û paşverûyan.

Kin were gotin, em rewşenbîrêñ welatparêz nikarin çavêñ xwe ji şerî hebûn û tunebûnê bidine alî. Girîng e em xwe bê rîkxistin nehêlin, yekîtî û sandîkatêñ xwe ava bikin. Bêterefferî nayê wê wateyê ku em li hemberê zilm û zordariya dijmin bê gotin bimînin. Di bin navê bêterefiyê de mirov nikare girêdayî bimîne. Ev tucar ne rast e. Di rewşa Kurdistanê ya îroyîn de bêterefferî dikeve hembêza dijminan û li hêviya gelê xwe xwedî dernameke. Rola rewşenbîran ew e ku, bi hemû berhemêñ xwe, bi hemû hunerêñ xwe, agirê şoreşê gurr bikin û delametêñ welatparêziya rast li gora pîvanêñ nuh pêkbînin.

Li ser vê bingehê her roj têkiliyêñ me bi her çar perçen Kurdistanê re xurt dibin û bi dehan name û nivîs digihêne destê sernivîsariya REWŞEN ê. Hemû nivîs û berhemêñ YRWK jî, bi firehî xwe digihînîne hemû navendêñ xebatê yên welat, Rojhilata Navîn û heta bigîhê gitîyêñ zindanan jî.

***Bi zimanê gel nivîsin,  
Di dilê gel de  
cih girtin***



reke gelekî bilind bi pirsên jiyana xwe ya kesanî ve mijûl dibin û berjewendêñ xwe li pêşıya berjewendêñ gel û welêt dikine çember. Piraniya wan girsên gelî weke keriyêñ pez dibînin. Lewma jî weke ku mirovek ji nexweşîya penceşêrê (kanser) direve, rewşenbîrê Kurdishî, li Ewrûpa ji pirsên rîkxirawî û civatêñ gelî direvin.

Di bin navê serbixwebûnê de, dixwazin galegalâ "pêwîstî bi rîkxistin (organîzasyon) tune ye" pêş ve bibin. Bi van bir û baweriyên xwe jî, bixwazin-ne-

YRWK li hemû welat û bajarêñ Ewrûpayê, werine vekirin. Di vî warî de, Komîteya Kargêr di van her du salan de, bi dehan civînên rewşenbîran çêkirine. Her weha girêdayê Komîteya Karger, niha Komîteya Mamostayêñ Welatparêzêñ Kurdistanê û komîten Xwendevanêñ Welatparêzêñ Kurdistanê karê xwe dikin. Şaxê YRWK li Swêdê jî, damezrîandina xwe bi fermî danezan kiriye û di meha Gulana 1991'ê de konferansa xwe ya yekemîn bi ser xist.

Endamîn Komîteya Kargêr ku di

Ji her welatekî bêhtir li Kurdistanê pêwîstiya nivîsina bi zimanê gel cihêkê mezin digire. Rewşenbîr ew mirov e ku psîkolojiya gel nas dike û dizane çawa kela dilê wî rabike. Zane çawa wî bikişîne nava şer û çawabihêle ku bîr û baweriyê rast di mejiyê wî de hêlîna xwe çebikin. Lewma pêwîstiya me berî her tişî bi zimanekî rast, hevgirtî û gelî heye. Belê ev nayê wê wateyê ku girîng e her rewşenbîrek bi şêweyê êl, gund, malbat û herêma xwe binivîse û vê mîna rastiyê bispêre tevayıya gel. Ev ziman ji rewanê wî yê yekbûyi dûr dixe û asteng û nexweşîyan derdixe.

Her çendî ku sernivîsariya (redaksiyon) REWŞENê bi vê teoriyê dest bi liv û tevgera xwe kiriye, lê belê di karnameyê de lê xwedî derneketiye. Pirî caran bi zimanê akademîkî hatîye nivîsin û bi wê yekê jî gelek nivîs ji hêla xwendevanan ve nehatine famkirin. Ev rîdarî, bûne bingehêne gelek rexneyê mafdar yên xwendevanan.

Rexne û pêşniyarên xwendevanan li ser van xalêñ jêrin kom dibin:

- Pêwîst e dema ku nivîs ji zimanekî din têne wergerandinê, bi zimanekî kurdi yê hesan û xweş werine amadekirin.
- Girîng e bêhtir cih were dayîn bona diyalektêñ Kurdi yên soranî û zazî (dumili).
- Ji bo çi kovara REWŞENê piştî jimara 4'ê bedewatiya xwe ya formasyonî winda kiriye?
- Girîng e kovara REWŞENê ji mehê carekê derkeve. Eger ne gengaz be dikare du mehan carekê derkeve.

- Ji bo çi mirov dibêje belku hemû nivîsen REWŞENê ji hêla mirovekî ve têne nivîsin.

Piştî jimara 3'ê (Gulan 1989) gelek problemêñ teknîkî peyda bûn û kovara REWŞENê saleke temam nikarîbû xwe bigehîne xwendevanan. Belê niha ew problem ji holê rabûne û piştî jimara 5'ê û heta niha REWŞEN bi peryodîkî û her sê mehan carekê derkeve.

Nivîsen ku digihine redaksiyona REWŞENê, ji sedî 30 helbest in. Lewma ji pirî caran em neçar dimînin ku giraniya helbestan di kovarê de xwe serdest dike. Nivîsen ku bi naveroka xwe dewlemend in û bi teknîka xwe jar in, ji hêla redaksiyonê ve têne serrastkirin. Lewma



jî bi şêwenivîsa xwe mîna hev xuya dîkin.

Jimara 4'ê bi pirsên ramyarî (siyasi) tije bûye, ev rast e. Ji ber ku ji hêlekê ve nivîs û dokumentên komcivîna yeke-mîn hatibûne weşandin û ji hêla din ve ji em weke prensîp tiştekî ji derveyê ramyariyê nabînin. Tiştek derveyê berjewendê çînayetî tune ye.

Redaksiyonê ev pirs tev di civînên xwe de anîne rojêv û pir bi firehî li ser van pirsan hatîye rawestan. Niha, hêdî hêdî giraniya xwe ava dike û bûye xwendîyê serguzariyekê mezin. Pirsên ziman çareser dibin û bi rewan û daxwaziyên gel nivîs amade dibin. Belê girîngiya hebûna lêkolinêñ kûr hîna di rojêv de cihê xwe digire. Ji sedan name û nivîs-en ku gihiştine me, ev rastî derkeve holê: REWŞEN kovareke gelekî bi nirx e, ji hêla her kesekî ve dihîte hezkirin û pejirandin.

Niha problemêñ ku derketine pêşîya REWŞENê, ji gelek aliyan ve çareser bûne. Belê, wê bi formasyona (şîklê) hejmara heftan dewam bike heta demeke din. Her weha ji aliyê ziman ve redaksiyona Kovarê bûye xwendiyê zanîn û hunerên mezin.

Bûroya navendî ya YRWK li bajarê Bonnê baş nehatiye bi kar hanîn. Gelek rojan girî dimîne. Lewma jî di servîsa gün û hatîna nameyan de, gelek caran kîmasî çebûne. Ji bona dema pêşîya

me girîng e bûro bi kêmânî ji heftê du rojan bi sistematîkî vebe û her mirovekî wê rojê bikaribe bi telefonê li gel navenda YRWK bihaxive.

### *Bûyerêñ li welat pêktêñ, êrk û delametêñ YRWK*

Damezirîna YRWKs, hêviyeke mezin daye hemû rewşenbîrê welatparêz û dilsoz. YRWK li berhemên hêja û bi nirx ê her rewşenbîrekî xwedî derdikeve. Belê, pirs girêdayê naveroka nivîsan e. Gelo di welatekî weke Kurdistanê de, rol û karguziye rewşenbîran ci ye?

Em ji kesekî naxwazin ku propaganda rût û reklaman bike. Pirs ew e, ku mirov bikaribe bûyerêñ li welat pêk têñ, qehremanî, berxwedan, rabûn û serîhîdanêñ gel di nivîs, tore û hunera her rewşenbîrekî de bixwîne.

Ji xwe YRWK ji bona ku, bibe afîrandkarê bingehêne pêşvebirina çand, tore wêje û zimanê Kurdi hatîye damezîrandin. Heta vê rojê jî gelek vekolînêñ civakî, dîrokî, torevanî, ramyarî, aborî... hwd belav kirine û ev xebat bi xurî vê rojê jî didomin. Her weha me dest pê kiriye hemû nirxên kilasîkî yên gelî carêke din biweşînin û belav bikin.

Heta vê rojê, zencîra weşanên REWŞENê gihiştîye 10'an û dawiya vê zincî-

rê wê neyê... Li kêleka van weşanan heta niha 7 jîmarêñ REWŞENÊ ji derke-tine û bi dehan jî belavokêñ konevanî û bangêñ yekîtiyê, hevgirtin û serîhildanê hatine belavkirin.

## *Perwerdekirina zarokan, Mamoste û Yekîtiya Xwendevanan*

Di nava civaka Kurdistanê de, bê gu-man e ku mamoste dikarin roleke gelekî mezin di warê pêşvebirina ziman û çan-da Kurdi de bileyîzin.

Ji bona parastina keleporêñ kurdî û perwerdekirina zarokêñ kurd li derveyî welat, YRWK di meha Adara 1991'ê de bi beşdarbûna 30 mamostayêñ kurd li Almanya civînek çêkir û komîteya Mamostayêñ Welatparêzê Kurdistanê da-mezirand.

niya şaxêñ Yekîtiyê kongreyêñ xwe yên lokal çêkirine û bi fermî hatine damezi-rin. Belê, hîna xebateke bi girêdan û koordinasiyoneke xurt bi rê ve neketiye. Hîna hevalêñ di komîteyên şaxêñ Yekîtiyê de cih digirin, xwe ji amatoriye rizgar nekirine û Yekîtiyê (YXWK) nekariye kongre ya xwe ya gelempêr berhev bike.

Her çendî YXWK hîna nebûye xwe-diyê serpêhatiyêñ mezin jî, belê bîr û baweriyêñ reformist di nava xwendevanan de hatine perçqandin û ev yek hiştiye ku her kes sextekariya "yekîtiyê" din ên kevin fam bike.

Çawa li her welatekî girsêñ xwendev-anan ji bo rizgarî û serxwebûnê li ber xwe dane û cihêñ xwe di nava refêñ têkoşînê de girtine, niha xwendevanêñ Kurdistanê jî hewl didin ku bi destê alî-karî û yarmetiya YRWK rolêñ xwe yên pêwîst bileyîzin.

## *Kurdistanê*

Pareke gelê me, pir belavbûyi di nava komarêñ Yekîtiya Sovyetê de, diji. Her çendîn ku ev demeke dirêj e ji we-latê xwe dûr ketine û heta van salêñ dawîn çûn û hatin gelekî dijwar bû, posideyêñ asîmîlasyonê li ser wan cihê xwe negirtine, ziman û çand hatine par-astin.

Bi demê re bireke rewşenbîrêñ kurd, bi dehan doktor, profesor û nivisevan peyda bûne. Belê, bi rastî her çendî ku li ser tarîx, folklor û pirsêñ Kurdistanê nivisîne jî, nivisêñ wan ne ewçend kûr in, ji ber ku piraniya wan, Kurdistanê tenê li ser kaxetan dinasin. Gelek dûrî bûyer û rastiyêñ ku li Kurdistanê pêk têñ mane. Lewma weke delameteke bin-gehîn a YRWK jî, çêkirina têkiliyan li gel wan cih digirt.

Heta vê rojê gelek rastî, nûçe û



Bi armanca avakirina "Yekîtiya Mamostayêñ Welatparêzê Kurdistanê, YMWK" xebatêñ tund û xurt didomin. Ji sala 1988'ê ve, di bin banê YRWK de, girsêñ xwendevanan li gelek welatêñ Ewrûpa û bi taybetî jî li Ewrûpa Rohilat, xebatêñ xwe di sbin navê "Yekîtiya Xwendevanêñ Welatparêzê Kurdistanê-YXWK" de, dikin. Heta vê rojê pira-

Heta niha ji bona nasdana Kurdistanê, ji bo gelên cîhanê, gelek xebat ji hêla YXWK ve hatine kirin. Her weha li gel piraniya xwendevanêñ welatêñ din têkilî hatine çêkirin.

## *Rewşenbîrêñ Kurdêñ Sovyetê û pîrsa*

înformasyonêñ Kurdistanê gihiştine wan. Welatparêziya rast weha dike ku bi lez ewna li dora riya rast kom dibin. Her çendî çend mirov ji wan tenê berjewen-dêñ xwe yên kesanî diparêzin jî, belê piraniya wan bona hemû karûbaran am-adekariya xwe nişan didin.

Ji hêla Komîteya Kargêr ve li piraniya komarêñ Sovyetê gelek civîn, semî-

nar û rasthatin, di salên 1990-'91ê de hatine çêkirin. Erk û delametên YRWK bona Kurdên Sovyetê hatine gotin û heta niha gelek berhem û encamên hêja derketine holê.

Rewşenbîrên Kurd yên li Sovyetê ku bûne mîvanên YRWK û li ser gelek pîsan civîn çêkirine, ev in: Dr. Memoyê Xalit, Ordîxanê Celîl, Cemîla Celîl, Celîlê Celîl, Prîskê Miho, Karlêne Çaçanî û Yûra Nebiyêv.

Niha di komarêن Sovyetê de, rewşenbîriyeke rast pêşve dikeve û hemû rewşenbîr ber bi rastiya Kurdistanê ve têن û êdî dizanin li Kurdistanê çi dibe."

Ev bû pir bi kinahî naveroka rapora Komîteya Karger.

Piştî xwendina rapora Komîteya Kargêr, raporêن şaxêن YRWK (Swêd, Frenga, Îngîltire, Danîmark) hatine xwendin û pêşkêşkirin. Her weha raporêن komîteya Mamostayan û Yekîtiya Xwendevanan jî hatine xwendin û dawî rapora diravî ya YRWK hate xwendin.

Piştî xwendina van raporan tevan, komcivîn derbasê danûstandinê li ser xebat û karûbarêن Yekîtiyê bû. Ji hêla besdarêن komcivînê ve bi giranî ev nirxandin, pêşniyar û rexne hatine kîrin:

"Çi nexweşî û zorî hebin girîng e YRWK konevaniyeke weha nîşan bide ku bikaribe hemû rewşenbîran li dora xwe kom bike. Dibe ku, her kes nikaribe bi çendî Komîteya Kargêr bixebite. Lê belê her kes dikare cihekî vala li gora xwe tije bike. Girîng e konevaniya YRWK hinekî firehtir û nermtir be. Armanç tenê ew e ku tu kesên welatparêz xwe ji dora YRWK nedine alî. Dema ev tişt tête gotin, nayê wê wateyê ku YRWK bê prensibêñ ramyari be, belê bi metodêñ hîn firehtir mirov dikare têkoşînê bike.

Mamoste İsmail BÊŞÎKÇÎ, xebateke mezin ji bona civaka Kurdistanê pêşkêş kiriye. Wî bi dehan pirtük li ser pirsêñ civaka me nivîsiye. Ji bo çi(?) rewşenbîrên Kurd van erk û delametên xwe bi cih nehanîne. Girîng e rewşenbîrên Kurdistanê civaka xwe baş nas bikin û huna û xwe tenê ji bo serxwebûnê bidine nîşandan. Eger em van tiştên hatine gotin tevan dizanin, hingê girîng e em xwe bidin ber pîrsiyariyê û hînek barêñ giran hilgirin.

Di civaka Kurdistanê de gelek serêşî hene. Ev serêşî li gora koçbera dîrokê ne. Civaka me di qonaxa bindestiyê de ye. Êşen rewşenbîrên kurd jî, ji êşen gel in. Bersiva hemû êşan jî gerek e mirov bi xurtkirina organîzasyon û Yekîtiyê bide. Her weha jî şexsiyeteke (kesaniyeke) xurt ava bike.

### *Dijmin em perçe kirine. Em çi bikin da xwe bikine yek?*

Ji bo çi em nizanin bi zanistî kar bikin? Di welatê me de qalibêñ mezin hatîne danîn. Yek ji wan qaliban otonomîzm e. Heta ku otonomist hebin tu tiştek nayête kirin. Şexsiyeta kurd nayête meydânê. Divêt ku ramanêñ otonomîzmê ji holê werine rakirin. Girîng e rewşenbîr jî baweriya xwe, bi xwe bînîn û di civakê de rola xwe bi serkeftîn pêk bînîn.

ye û giraniya xebatê di riya serxwebûn û azadiyê de rîkxistinkirina rewşenbîran e.


Gerek e em baş bala xwe bidin cihanê û zanibin perspektîfa wan ji bo sibehê çi ye. Her weha jî girîng e em dijmînê xwe jî baş nas bikin, liv û tevgera wi kontrol bikin.

Redaksiyona REWŞENê bêgav (mecbûr) e her demekê, raya giştî ya xwendenvanê xwe zanibe. YRWK bêgav e bi alîkariya hemû hunermendêñ kurd ên bi tiyatro, sînemê û hwd ve kar dîkin, mijûl be.

Pêşvebirina YRWK bi pîrsa rîkxitina wê ve girêdayî ye û ew jî li ser van xalan kom dibe:

- Hilbijartina komîteyeke objektîv û xurt ku, bikaribe bi koordinasyon, plan û program bixebite. Bikaribe hemû komîteyên şaxan jî kontrol bike û perspektîvan bide pêş wan.

- Girîng e Yekîti di nava xwe de şaxan çêbîke weke şaxêñ Mamosteyan,



Gelş û pirsgirêkên me zelal in. Belê gerek e em ji kêmânî û şâşiyêñ xwe pêzanînen (tecaribêñ) mezin derêxin û kêmâniyêñ ku di karvaniya komîteya kevin de derketine ji wan sûd bigrin û bi rewaneke nuh xebateke xurt dest pê bike.

Gerek e neyête gotinê ku di xebata YRWK de kovara REWŞENê her tişt e. Girîng e vê baweriye her kes zanibe: REWŞEN tenê yek ji berhemêñ YRWK

doktoran, avûkatan û hwd.

- Girîng e Yekîti gelek libbaziyan bi navê xwe çêbîke û li gel hemû rewşenbîran têkilî çêbîke, alîkariya wan bike û ji wan jî alîkariyê bigire.

- YRWK xwedîyê karektereke Kurdistanî ye. Nivîs, bîr û baweriyeñ me tev ji bo Kurdistanê ne. Eger pir tişt li ser rewşenbîriya perçen Kurdistanê yên başûr û rohilat ne hatîbin belavkirin, ew yek, bi qasî derfet û gengazên me ha-

tiye kirin.

Bi van nirxandin, pêşniyar û rexneyan ev xal gihîste dawiyê û bingehêne ramanî yên geleki xurt ji bo wergitina bîyareñ nûh peyda bûn.

## *Ji komcivîna Duwemîn a YRWK çend bîyareñ bijartî*

Piraniya bîyareñ komcivîna YRWK'ê ya yekemîn (yên pêk hatine û pêk nehatine ji) ji bo vê qonaxa pêşıya me weke bîyareñ girîng û pêwîst hîna xwe davêjin holê. Lewma li vir emê tenê çend bîyareñ bijartî ji komcivîna duwemîn rêz bikin. Bîyareñ komcivîna YRWK'ê ya yekemîn bi tevayî di hejmara kovara REWSENê ya 4'ê de belav bûne.

### *Bîyareñ girîng yên bijartî ev in:*

- Piştgiriya şerê serxwebûn û azadiya Kurdistanê, danîna têkiliyan bi hêzên demokrat, pêşverû û mirovperwer re

- Pêşxistina mekanîzmayê ragihandinê yên kurdan, pêşkêskirina alîkariyê ji kesen ku navgînê ragihandinê yên weke sînema, şano, rojnamegerî û hwd pêşvedixin re.

- Danîna têkiliyan bi saziyên navnetewan re ku piştgîren mafdarî û demokratîyê ne

- Çêkirina têkiliyan bi kesen pêşverû yên wênekîş, heykelterâş, karîkatûrist û rojnamevan re

- Xurtkirina aliye rêkxistinî yên Yekîtiyê, avakirina şaxen Yekîtiyê li piraniya welatêن Ewrûpa, xurtkirina têkiliyan bi welat re, avakirina komîteyên mamostayan, doktoran, avukatan û hwd. di bin banê Yekîtiyê de.

- Parastin û pêşvebirina zimanê kurdi, amadekirina pirtûkên dersê û ferhengîn kurdi-kurdi.

- Vejandin û zîndekirina dîroka kurdi, ji nuh ve weşandina pirtûkên klasikî ku, nirxen giranbiha yên tore û wêjeya kurdi ne, xwedî derketina li hemû berhemên rewşenbîrênen welatparêz û belavkirina pirtûkên wan.

- Wergerandina pirtûka "Hozanvanê Kurd" Sadiq Behaddîn ser tîpêñ latînî

- Derhanîna pirtûkekê li ser stranbêj û dengbêjêne Kurdistanê yên çûne ser dilovaniya xwe (koçî-dinya kirine).

- Pêşkêskirina alîkariyê ji bo radyo-yen kurdi yên li Ewrûpa.

- Weşandina kovara REWSENê bi rengekî periyodîkî, pêşvebirina formasyon û naveroka wê.

- Her salê carekê çêkirina berberiyeke wêjeyî (hewîrkanekê) li ser çîrok, vekolîn û helbestan. Her weha amadekirina komîteyekê ji bona vê pîrsê.

- Amadekirina civîn û konferansan ji bo rojnamevanan û agahdarkirina wan li ser bûyerên ku li Kurdistanê çedibin.

- Salê carekê amadekirina dosiyakê li ser rewşa Kurdistanê û şandina wê bona hemû saziyên navnetewî.

Her weha em dixwazin li vira bîyareñ ku di warê maf û dadimendiyê de hatine wergirtin, bi temamî biweşînin.

"Bi gelemerî li Kurdistanê xwe rêkxistinkirina netewa kurd bi azadî hatiye qedexe kirin. Daxweyankirina raman, bîr û baweriyan, bi qanûnan hatiye qedexekirin û sûc tête qebûl kirin.

Li Kurdistanê şikence, girtin, perçiqandina mafêñ Mirovan bêhtir dibin û didomin. Jiyana mirovan ji ber *KurdBûna* wan di bin tehdîde de ye. Mafê jiyanê, ku maf û azadiyeke bingehîn e, bi berdewamî dihete perçiqandin. Lî hêleka kuştinê rasthatî û keyfi, kuştinê di bin şikenceyan de hîna didomin.

Gund dihêne şewitandin, gundî ji gundan dihêne derêxistin, erdê Kurdistanê ji mirovan dihete valakirin.

Li bakurê Kurdistanê qanûnê girêdana awarte (Hejmar 2935), qanûnê jîcîh hîlkirin û sansûrê (Hejmar 285 û 430) hîna nehatine rakirin. Bi ser de ji, di vê dawiyê de bi qanûn hejmar 3713, qanûna li dijî terorê hate derêxistin. Bi vê yekê, zimanê kurdi hatiye qedexekirin, netewa kurd kesbûna wî tête înkarkirin. Gelê kurd dixine bin zîlm û pîkoliyê. Cezayêñ giran têne bi kar hanîn. Bi vî awahî hemû peymanen mafêñ mirovan dihêne perçiqandin.

Niha gava mirov dihêne girtin, bê ku derbixin pêşıya dadgehê, 30 rojan dihêne pîrsiyarkirin. Dihêne şikencekirin û dadparêz nikarin wan bibînin.

Di girtîgehêne dewletêñ dagirker de

hoyêñ nebaş li ser girtiyêñ siyasî yên kurd didomin. Girtî rûberê azîneyêñ derî mirovahî dibin.

Nivîsîna bi zimanê kurdi, weşan, çapemêni, peyvin, di herçar hêlén welêt de rûberê cezayêñ giran dibin.

Bi navê qanûnê li "dijî terorê" mirovan bi taybetî infaz dikin, sistema izolasyonê, yanî cezayêñ hucrê didine girtiyêñ kurd.

**Rêkxistinêñ ku divêt mirov bi wan re têkiliyan çêbikê ev in:**

1- Komeleyêñ Mafêñ Mirovan

2- Sendîkat û rêkxistinêñ girseyî yên din, ku demokrat in.

3- Rêkxistina Azadiyê ya Navnetewan (London, Ingilistan)

4- Dîwana dadmendiyê li bajarê La Hey (Hollanda)

5- Komîsyona Mafêñ Mirovan a Ewrûpayî (li Strasbourg - Frense)

6- Komîsyona Mafêñ Mirovan a Yekîtiyê Netewan (li Amerika).

Li kêleka van hemû bîyaran her weha du bîyareñ xwedî taybetiyeke mezin hatine girtin. Ew ji ev in:

- Şandina bersiva mesaja, bi rêz Abdullah OCALAN û nîşandana ku hemû besdarêñ komcivînê wê di xizmeta gel û welat de heta dawiyê di bin ala serokatiya hemdemî de bimeşin.

- Bi navê platforma komcivînê mesajek ji rewşenbîrê bi rûmet İsmail BEŞIKÇÎ re hate şandin û ew weke endamê rûmet û şerefê yên Yekîtiyê hate pejiran din.

Berî ku rojeva komcivînê bigihê dawiyê, ji hêla besdaran ve komîteya kargêriyê (ji 9 kesan), ji bo redaksiyona kovara REWSENê ji komîteyeyeke ji 6 kesan hatin hilbijartin.

Di encama xebatêñ besdaran de, komcivîna duwemîn a YRWK'ê bû bilindahiyeka xebat û karûbarêñ bi nirx, bû bangeke xurt ji bo hemû rewşenbîrêñ welatparêz ku xwe di nav rezêñ Yekîtiyê xwe de kom bikin.

- **Bijî tevgera serxwebûn û azadiya gelê Kurdistanê!**

- **Bijî Komcivîna Duwemîn a YRWK !**

# Ji axaftinê Komcivîna YRWK a Duwemîn.

**-Av. E. Xemgîn** (Niviskar, lêkolînvan)

Ji bo ku YRWK bikaribe bighêje encamên baş û bi xurtî alîkariya têkoşînê bike, giring e rewşenbîr tev, xwe nuh bikin ú pîvanê rewşenbîriyê yên nuh bi-pejîrinin. Mirovê bixwaze muhra xwe li guhertinê civakî bixe, giring e hemû zanebûn ú hunera xwe bide gel. Eger rewşenbîrek nikaribe di dilê gel de cih bigre, pêwist e li xwe vegere û kesaniya xwe bide ber rexneyêngiran.

Gelê Kurdistanê ji rewşenbîrê xwe gelek tiştan dixwaze. Divê em bersiva daxwazên gel bidin. Şerê Serxwebûn û azdiyê li Kurdistanê bilind dibe. Her roj bûyerên nuh pêktên. Rewşenbîr, gereke bi girêdana van pirsan ve li erk û delametên xwe xwedî derkevin. Bizava iro li welatê me di bin rêberiya karkeran de ye. Rewşenbîrê Kurdistanê heta vê rojê pir hindik li gel xwedî derkevin. Heta mirov dikare bêje di gelek waran de li dûv gel mane û li dora serokatiya rast bi xurtî kom nebûne. Sedemên vê yekê jî gelekî zelal in, girêdana bi berjewendîn kesanî ve mejiyê wan xwariye û çavêwan tarî kiriye.

Belê, YRWK di riya rast de, gelek qonax derbas kirine. Niha bûye xwediyê serpêhatiyêne mezin. Lê hema tiştên hâtine kirin têrê nakin û ne li gora bilindbûna têkoşîna gelê Kurdistanê ye.

Zeroyêni li pêşya rewşebîran gelek bûn. di serî de di bin posîdeyên çanda dagîrkeran de piştxûz û xwar bibûn. Niha tevgereke ku bikaribe destê alîkariyê dirêji hemû rewşenbîrê welatparêz bike heye. Lewma, divê dem neyête winda kirin. Ci valabûn heye gereke tijî bibe. Rewşenbîr bila bi koka xwe ve werin girêdan. Helbet di nav têkoşîn û xebatê de wê rihetiya kesanî (şexsi) ya me hinîkî xerab bibe, lê hema bê wê yekê jî nabe. Li welatekî dagîrgeh wekû Kurdistanê pêwistî gelekî bi fedekarî û dirustiyê heye.

Pirsa me jî di vê cîhanê de ew e ku cihekî me jî hebe. Serê me bilind be û ji bin nîrê zordarî û nexweşiyê derkevin.

Di cîhanê de tu kes koletiyê qebûll na-ke, lê bêhna me rewşenbîrê Kurd xuya dike pir fireh e. Vê çendê jî nabe. Em nabêjin, em ji kesekî mezintir in, lê belê em ji kesekî jî ne biçûktir in. Mafêni ji bona her kesekî hatiye pejirandin giring e ji bo me jî were qebûlkirin. Zagonêni di cîhanê de niha serdestin, zagonêni zoñ u xurtiyê ne. Eger mirov ne xurt be tu mafêni mirovî jî tune ne.

Kurd hewceyê peydakirina zora xwe ya mafdar in. Lewma jî zora şoşegê-rî li Kurdistanê giring e li dij dagîrkeran hîn xurttir û dijwartir bibe. Rewşenbîrê welatparêz jî bila arê berxwedanê gurr bikin. Bi nivîs, raman û mejiyê xwe li welat û leşkerên azadiyê xwedî derkevin (...).

**-Av. D... ji Botan**

Kombûna rewşenbîrê Kurd li Ewrûpa, xebat û çalakiyên YRWK pîroz dikim û berî her tiştî silavên gelê Kurdistanê ku rabûye ser piyan û gêrillayênen serxwebûnê digihînim we, bi navê têkoşîna li Botan li dare, serkevtin û serfiraziya we dixwazim.

Bizava gelê Kurdistanê di bin serokatiya hemdemî de dewleta dagîrker hajotîye ber bi koşeyeka teng û bêçare dihêle. Niha dewlet neçar dimîne vê rasîtiyê bipejîrîne, ci dike nikare serjêriya xwe rawestîne, êdî ruxandina wan eşkere û zelal bûye.

Piştî dest pê kirina krîza kendawê, polîтика dewleta Tirkîye ya heftî salan li erdê ket û hebûn a Kurdan cara yeke-mîn li Tirkîye hate pejirandin. Nermiya ku dewlet dixwaze nişan bide, eşkere ye ku sextekariyeke mezin e. Armanc ji rê derxistina tevgera gel e, ku her rojê xurt û zexim dibe.

(...)

Ji bo tevgera Kurdistanê were rawestandin, dijimin her roj zagonênuh yên teybetî derdixe. Niha jî zagona bi navê "Dijî terorîzmê" derxistîye û bi vê zago-nê şerê xwe li hember gel eşkere dike. Bi hovîti êrîşen xwe dibe ser hemû

mafêni mirovan.

(...)

Ji bona em bersiva vê rewşê bidin giring e em kêmahiyênen xwe ji holê rakin û hemû gelşen ku hene çareser bikin. Baweriya min heta dawiyê heye ku ev platform wê bikaribe li dora xwe yekîtiya hemû rewşenbîrê welatparêz di riya riz-gariya netewî de ava bike.

Careka din hezar silav, serkevtina we hêviya me ye, ez geleki sipasdarê we me.

**-Av. K... ji Botan**

Bi beşdarbûna Komcivîna we ez ge-lekî kêfxweş bûm. Ji serî de sipasiyênen xwe pêşkêsi hemû hevalan dikim û di ka-rûbarê YRWK de serkevtinê dixwazim.

Hevalê Avukat D... geleki li serrewşa welêt rawesta, tiştîkî ez li ser zêde bikim tune ye. Ez dixwazim ji hêleka din ve li ser Komcivînê rawestim.

Dixwazim bizanibim ka YRWK ji roja çêbûyî ve ci kiriye? Di van herdu salan de avukatên me ci kirine? Doktorên me û nivîskarên me ci kirine? Gerek e li vira mirov hesab bide hev. Kî çiye û kî dikare ci bike?

Her roj li Cizîra Botan, Şîrnex, Hez-ex, Lîcê... û hwd. raperîn û serîhildan çêdibin. Em rewşenbîrê li vira ji bona wan me ci kiriye û dikarin ci bikin? Ez weha dizanîm delameta vê Komcivînê bersivdانا van pirsan e.

Eger wijdan û rewanê berpirsyariyê bi mirov re hebe, tiştîn mirov karibe bike gelek in. Avukat, doktor, nivîskar, rojnamevan gerek e bibin parêzvanê gel û qet hebûna dijminan nepejîrinin. Eger mirov nikaribe tiştîn mezin bike, bi kêmanî em dikarin li şehîdên xwe xwedî derkevin û bi mebesta şehîdbûna wan gelê xwe rakin serîhildanê. Rewşenbîr eger nikarin tiştîkî bikin, bila herin ta-zîya şehîdan, hînek tirsonêk hene newêrin wê yekê jî bikin.

Nexweşî û kêmanî di nava me de gelek in. Bi rewanê rast kirina hemû pirsan gerek e em bitêkoşin. Rewşenbîrê Kurdistanê eger hemû valahiya heye tije

nekin, wê hinekêni ji civaka me biyanî, ji wê rewşê sûd bigirin, zorî û astengan li pêşîya me avabikin.

(...)

Her hebe YRWK di riya gel de, ji bo serxwebûn û azadiyê. Careke din hezar silav.

**-Yora Nebiyêv** (Serokê komela Ronahî ya Kurdên Gürçistanê)

Gelekî sipasî we dikim. Hemû hevalen me, dost û welatparêzê Kurd li Gürçistanê we silav dikin û di karûbarêne we de serkevtinê dixwazin.

Em kurdên sovyêtê heta demeke kin berî niha, me gelek tişt nizanibûn. Niha, em xwe perçeyekî gelê Kurd dibînin û jî nêzîk ve hemû bûyerên ku li Kurdistanê pêktên dibihîsin. Dilê me gelekî gerim dibe, dema em dibînin Kurdan riya serxwebûnê girtine, armanc û daxwaziyê xwe vê çendê zelal kirine. Em dizanin pîrsa Kurdistanê û Kurdan tev bi hev re girêdayî ye. Her cihekî posideyên xwe li cihê din dike. Li ser vê bingehê em pîrsa Kurdistanê tenê yek pîrs dibînin.

Heta niha me cudahiyêni di navbera ramanê reformist û ramanê şoreşgerî de, li Kurdistanê nizanibûn. Belê, em hîn bûne ku dijminêne Kurdistanê çîne û ji ci azîneyan fam dikin.

Jî vê rewşa ku nuh li Sovyêtê derkekiye gelê me sûd girtiye. Êdî gelek komleýen me çêbûne û têkiliya me bi Awrûpa û welat re çê bûye û hîn jî xurt dibe. Her weha jî li gelek cihan jî gelê me careke din rastî belav bûnê dibe, zorî û nexweşiyêne mezin bi serde tê.

Li Sovyêtê heta sala 1929'ê hinek tiştê baş ji bo Kurdan hatibûn kirin. Lî belê piştî wê demê dîsa rewşa Kurdan xerab bû û di salê 1937 û 1945'an de rastî koçberkirin û belavbûneke nuh hatin, niha jî rewşeye weha serê xwe hil-daye. Belê, iro Kurdên Sovyêtê geleki şiyarbûne û bi taybetî piştî jehirkirina Helepcê me xwe naskir. Piştî wê xeleka jenosidê li ser Kurdan me gelek meş û mîting çêkirin, em hînê gelek tiştan bûn.

Di van herdu salêni dawiyê de me xebat û têkoşîna PKK jî famkir û gelê me niha li her derê hezkirina xwe jî bo PKK nîşan dide û hîviyêne xelasîya xwe tenê bi şerê PKK ve girê dide.

Rewşenbîrêne Kurdistan Sovyêtê jî weke rewşenbîrêne li welat heta vê rojê jiya-

neke belavbûyî dijîn, pêşîya wan ji gelek hêlan ve tê girtin, alîkarî baş bi wan re nayê kirin û bûrokrasiya dewletê gelek nexweşîyan li pêşîya wan derdice.

Emê piştî vê Komcivînê, protokoleke alîkarî û hevgirtinê di navbera komela me Ronahî û Yekîtiya Rewşenbîrêne Welatparêzê Kurdistan de çêbikin. Li ser bingeha alîkarî û hevgirtina xurt riya rewşenbîrêne me jî wê ronî bibe û gelek karêne hêja wê pêkbêne.

(...)

Careke din gelek sipas û bi hîviya roja serkevtinê, em ji niha ve soza xebatê didin.

**-Birêz Nêdim** (Rojnamevan-Almanîya)

Li Kurdistanê kîlî bi kîlî guhertin û pêşketinênuh pêktên. Li hemberê wê têkoşînê em gunehkarin. Heta niha me çikiriye? Delamîten herî gîran giringbû rewşenbîr pêkbîn. Belê niha gel bi rîketiye, gelek pêşve çûye, em jî niha dibin dûvê gel. Eger ev rewş dewam bîke, bi rastî trajediyea herî mezine. Qet li welitekî rewşenbîr ji pîrsa gel evqasî dur neketine.

Pir hindik rewşenbîrêne Kurdistanê piştî sala 1970'î ketin rê, tevlî hemû zoriyan riya gel vekirin û hemû gelş û pîrsgirêkîn ideolojîk çareser kirin. Belê, pîraniya rewşenbîrêne Kurd -bi gîranî yên niha li derve yê welat in- li ked û xuhdana gel xwedî dernakevin. Ji bo pîrsêne xwe yên kesanî radibin û rudinin.

Giring e rewşenbîrêne me vê pîrsê fam bikin: Rewşenbîr ne tenê nîvîskarin belê weha jî şervanîn. Rewşenbîrêne herî mezin vê rojê gerillayêne serxwebûn û azadiyê û serleskerêne wan in. Ji ber ku ew tenê bi temamî dikarin bêjin: Em azad in, em serbest in.

YRWK, giring e xwe bide ber rexneyen gîran. Dema behsa siyasetê dibe, bêhna gelek rewşenbîrêne teng dibe û dijîn xwe veşîrin û birevin. Di bingeha vê pîrsê de tirsonekî, liberalîzm û vejetandina ji gel heye. Her weha jî gelek rewşenbîr dema behsa siyasetê dikin, nikarin tiliya xwe danin ser xalêngirîng û nîzanîn xebatê konevanî bikin.

Niha gelek heval rexneyen gîran li xebatê digirin, ev tiştê gelekî başe, lê hema her hevalek jî gereke alternatifêne xwe bide nîşandan. Her hevalek gereke

bi xurtî di nava komîteyêne YRWK de cih bigre. Xebatêne hêja tenê bi plan û programêne dorfireh û objektiv pêktêne. Bi lavlav û gazindan tiştê pêşve naçe. Pêwîsiya civakê bi lêkolînê fireh û bi perspektifêne rast heye.

(...)

Eger vê rojê evqasî em karvaniya welatê rojhîlatê Ewrûpa yê û bûrokrasiya wan, didin ber rexneyen gîran, giring e em pêşveçûna xwe ji azîne û metodêne wan biparêzin û tempoyen jiyanâ xwe xurtbikin.

(...)

Rewşenbîr neçarin xwe ji moxilê derbas bikin. Têkoşîna li welat biparêzin. Ev jî tenê bi xebatê kolektif û bi rîkistinîye dikarin pêk bîn. Hesab dayîn û hesab pîrskirin giring e di YRWK de hebe, ji herkesê bêhtir divê em demokrat bin.

Tenê bi alîkariya rewşenbîrêne welat û avakirina komîteyeka kargêr ya xurt YRWK wê bikaribe rola xwe bileyîze.

Hîviya min serkevtina Komcivînê ye. Gelek sipas.

**-Birêz Xelîl** (Mamoste-Frense)

Şoreşa Kurdistanê pêşdikeve li derve yê welat komeke mirovan sextekariyê dijîn û dixwazin li ser xwîna şehîden Kurdistanê spêkolasîyonan bikin. Lewma, barê rewşenbîrêne welatparêz girane.

Di demeke evqasî giring de, mixabin ku li Parisê mirovên weha hene ku xwe rewşenbîr dibîn, xwe rizgarvanê gel dibîn, belê ji sibê heta êvarê tercumaniyê dijîn û bûne girtiyêne tijekirina berîkên xwe. Bi rastî ev bê şermiyeke mezîn e. Ev cure, rewşenbîr dikarin hemû nîrxên xwe bifroşin, tenê jiyanâ xwe ya kesanî, rizgar bikin.

Kêmaniyêne merkeza YRWK di van herdu salan de gelek derketine. Di serî de jî pîrsa koordinê nehatîye çareser kirin. Girêdanêne merkezê û endaman geleki kêm bûbûn. Di dema pêşîya me de, gereke koordine bi telefon, name û civînan were çekirin.

(...)

Li Parisê niha rewşa yekîtiyê pir pêşdikeve, her meydanek jî destê mirovên sextekar tê girtin. Êdî bi qedera gel wê kes nikaribe bileyîze.

(...).

Serkevtin para me be, sipas.

## Mesaj û pîrozbahiyên ku gîhiştine Komcivîna YRWK a Duwemîn

### Mesaja sekreterê gelempêri yê PKK Serok APO

Ji Kongreya YRWK ya Duwemîn re, Dostêl delal, Rewşenbîrê hêja, hemû besdarê Komcivina Duwemîn a YRWK,

Ji dil li hemû delege û mîhvanê besdarî Kongreya YRWK ya Duwemîn bûne silav dikim û di karûbarê We de serkevtinê daxwaz dikim.

Îro, ku hûn kongreya xwe dibestûnîn, welate me Kurdistan rûberê pêşveçûnên dîrokî yên mezîn dibe. Diyar e, ku em di encama berxwedaneke mezîn de gihane van rojan. Li ser vê bingehê gelê me xwedî li kesbûna xwe ya resen derdikeve, hîma xwe ji bo serxwebûn û azadiyê dide xebitandinê. Gelê me, di serîhildana netewî de yekbûna xwe ya netewî diafirîne, yekbûna ramyari ava dike. Gelê me di bin rîberiya xwe de, rîkxistinê xwe û yekîtiyê xwe yên welatparêz pêş ve dibe.

Birek ji civaka me, ku delamet û berpirsiyariyê pêwîst ên têkoşîna rîzgariya netewî li pêş wan hene, rewşenbîrê me ne. Vê rojê rewşenbîrê me ji her demê bêhtir pêdiviyê yekîtiyê ne. Lê em dibînin hîna hun belav



in, ji hevûdu dûr ketî ne, ji yarmetî û piştgiriya hevûdu bê par hatine hiştînê. Ev jî dîbin sedemîn, ku rewşenbîrê me nekaribin hinerê xwe pêşkêşî gel û têkoşîna pêş ve diçe bikin. Bi rasû jî heyâ pîvanekê rewş weha ye.


YRWK dikare bi xebatê xwe û giraniya xwe vê valahiyê dagire. Lewma divê di hemû qadan de baş xwe rîkxistî bike, divê bizaveke girêdayê viyana gelê me bi rî bixe. Heke di vê pîrsê de serkevtin çêbibe, rewşenbîrê me dê bikaribin rola xwe bi dij-

**Divê  
rewşenbîrê  
me di karvaniyê  
de bibin lingekî  
têkoşîna me ya  
serxwebûn û  
azadiyê û  
têkoşînê bi  
hunerê xwe  
têkûz bikin.**

warî bileyîzin. Divê rewşenbîrê me di karvaniyê de bibin lingekî têkoşîna me ya serxwebûn û azadiyê û têkoşînê bi hunerê xwe têkûz bikin.

Bi hemû hêviyê pêşerojê, li pêş kongreya We, ez ji dil û can silavê xwe li rewşenbîrê li welat û derveyî welat dikim; serkevtin di karûbarê We de daxwaza min e.

Bi slavê min ên şoreşgerî  
20'ê Hezîranê 1991  
**Sekreterê Gelempêri yê PKK  
Abdullah OCALAN**



### Mesaja endamê YRWK li Amedê Vedat AYDIN û hevalêni (Telegram bi tirkî) Dostêl hêja,

Biborin em nikarin besdarî Kongreya we bibin. Derfet nedane me bona hatina wir. Belê em di wê bîr û baweriyyê de ne ku Komcivina we, wê bikaribe, biryaren xurt bigre. Em bi hêvîne ku komcivina we roleke giran di têkoşîna Kurdistanê de, bilize û di naya karvaniyê de bi xurtî encam û berhemê hêja biafirîne.

Silav li hemû dost û hogiran, besdarê komcivînê li gel pîroz-bahiyên serkevtin û serfiraziyê.

21 Hezîran 1991  
Şaxê YRWK li Amedê

**Xwendevanê hêja,**  
Biborin em nikarin hemû mesajan biweşînîn, lewma tenê emê navê rîkxistin, komele, yekîti û mirovên ku mesajên wan heta roja komcivînê gîhiştine me rîz bikin.

Mesajên rîkxistinê siyasî û yekîti-yên welatparêzan:

- Mesaja Eniya Rizgariya Netewa Kurdistan - ERNK, liqê Libya.
- Mesaja Yekîtiya Xortên Şoreşgerên Welatparêzen Kurdistan - YXWK (Niha YCK), Komîteya Navendî.

- Yekîtiya Hunermendêن Welatparêzen Kurdistan - Hunerkom.
- Yekîtiya Karkerên Welatparêzen Kurdistan - YKW, liqê Libya.
- Mesaja Yekîtiya Xwendevanê Welatparêzen Kurdistan - YXWK, liqê Yekîtiya Sovyet.
- Mesaja Yekîtiya Xwendevanê Welatparêzen Kurdistan - YXWK, liqê Bulgaristanê.
- Mesaja Komeleya Hevgirtina malbatên Şehid û Girtiyen Kurdistan - Hevkom.

- Mesaja Niwênerayreti YRWK li Frense.
- Mesajên Rewşenbîrê welatparêz ku di Komcivînê de amade nebibûn ji evin:
- Mesaja Jewad Mella - London.
- Mesaja Ahmet Şerîfi - Rojhîlatê Kurdistanê.
- Mesaja Abdullah Osman - Berlin.
- Mesaja Şahînê B. Soreklî - Awsturaliya.
- Mesaja Abdullah Schox - Lindau, Almaniya.
- Mesaja Hûseyin Hebes - Bonn.

## Mesaja Platforma Kongreya YRWK a Duwemîn bona Serok APO.

Ji Sekreterê Gelemerperî yê **PKK Abdullah OCALAN** re,

Di pêşveçûna dîroka gelê Kurdistanê de, di xebatên serxwebûn û azadiya kurdistanê de, êdî rewşenbîrêne welatparêz xwe gihadine koçbereke pêwîst, ku bi her awayî dikarin li ber xwe bidin û di nava gel de, di bin banê yekîtiya xwe de xwe kom bikin. Li ber ronahiya xeta ku We daniye, niha gelek pirsgirêkên di tariyan de bûn, ronahî bûne û her mirovok êdi bi hesanî dikare di nava rêzen xebatê de cihê xwe bigire.

Em rewşenbîrêne ku di Komcivîna Duwemîn de gihiştine hevûdu, bi wê bîr û baweriyyê liv û tevgerê dîkin ku. hesabê veqatandina ji demê bidin û pira azadiya gel pêş ve bibin. Erk û delametê rewşenbîrêne welatparêz tenê bi girêdana bi xebatê ve dikarin werin cih. Em tev baş

## Mesaja Platforma Komcivînê bona Dr. İsmail Beşikçi

Dostê me yê hêja û bi rûmet İsmail Beşikçi!

Li Kurdistanê, têkoşîna rizgariya netewî ber bi rojê azad ve diçe û pêwîstî û hewcedariyê xwe ava dike. Têkoşîn di civata Kurdistanê de dîtinên nû bicih dike û şexsiyeta Kurd a nûn diafirîne. Weke her têkoşînekê, têkoşîna me jî pir aliye, Li dijî hemû dijmnan, dostêne me yê hêja jî di qada têkoşînê de ne.

Hun, ji ronakbir û zanayêne me Kurdan re, wek minakeke têkoşer û hêja ne. Em bawer dîkin ku li Kurdistanê, ronakbirêne wek We, ku girêdayiyê zanîyarî û rastiyê ne zêde dibin. Bi têkoşîna xwe ya mezin û serbilind, We, di her demê de piştgiriya gelê Kurdistanê kiriye. Ev helwesta We ya rast û bi zanîstî durûtiya ranakbirêne tîrk eşkere û mehkûm kiriye. Gelê kurd bi dostaniya mirovokî wek We serbilind e. Em ronakbirêne Kurd jî, berhem û xebatê We yê hêja ji bo xwe û mirovayetiyyê xezîneyeke mezin dibînin. Rexneyêne We yê rast û bi dostanî riya me ronakbirêne Kurd ronî dîkin.

Xebat, ronakbirî û şoresgeriya We ya coş, ji bo me û gelê me dibe çavkanîyen moral û keyfxweşiyê. Em We li

dizanîn, rewşa niha û hoyêne derketîne pêşîya çavan, encamên berxwedana serdemî ne, şervanên serxwebûn û azadiyê bi xwîna xwe vekirine. Li Kurdistanê êdî her tiştek, giring e muhra şoresê lêbîkeve. Tiştên pêşverû tenê ew tiştin, ku mohra şores û berxwedanê li wan dikevin û dikarin bibin malê gel.

Gelê Kurdistanê di nava xebatê de çandeke nuh afirandiye û bûye xwediyê kesbûneke serdemî.

Ji niha û pêve jî, em rewşenbîrêne Kurd, berhemên şoresê, şerê serxwebûn û azadiya Kurdistanê, ku berxwedana gerîlla û serhildanêne gelê me afirandine, ji xebata xwe re bingeh bigirin û di vê riyê de berpirsiyariya xwe bidin pêş. Lewma em careka din silavêne xwe pêşkêşî We dîkin û diyar dîkin, ku ci bikeve ser milê me. emê bi cih bînin.

Bi silavêne şoresgerî

23'ê Hezîranê 1991  
Platforma Kongreya YRWK a Duwemîn



derê xwe nikarin bifikirin. Hun her tim di nava me de ne. Di 22-23 yên meha Hezîranê 1991'ê de Komcivîna YRWK ya Duwemîn li Bonnê civiya. Bi tevâyiya dengan Hun endamê YRWK yê şeref û rûmetê hatin hilbijartin. Komcivînê biryar girt, ku ev biryar bi nameyekê ji bo We bê şandin.

Komcivîna me, ya Duwemîn silavêne xwe yên germ û şoresgerî ji bo We dişine. Û dide zanîn kû baweriya We ya xurt û karûbarê We yên rewşenbîrî, riya têkoşîna me zelal û aram dike.

Bi silavêne germtürin.

23. Hêzîrn 1991  
Komcivîna YREWK ya Duwemîn

## Marşa canbêzaran Ji Seydayê Cigerxwîn ra

Osman Sebri

Ez benî, piştî ku min ev mars berpêyî we kir divê tu me neki dizê rêzê xwe. Gelek silav û xweşî.

Kurdê gelparêz

Ji bo serxwabûn

Divê birijînî

Bi comerdî xwîn

Him divê xebat

Ji bona welat

Da bibin xudan

Rêzik û qanûn

"Serbilindî, dewlemendî divêtin xebat"

"Bê dijwari, bê xwînxwari em naçin welat"

Me armanc yek e

Girtina welêt

Ji dil me diçe

Sed agir û pêt

Çavêne xwe veke

Hey xortê ciwan

Neyar ne hişt xwîn

Di rehêne me mêt

"Serbilindî, dewlemendî divêtin xebat"

"Bê dijwari, bê xwînxwari em naçin welat"

Divê hûn her yek

Mîna gurê har

Sînga xwe veke

Bajon ser neyar

Min ji we navê

West û rawestîn


Di riya welêt

Em giş canbêzar

"Serbilindî, dewlemendî divêtin xebat"

"Bê dijwari, bê xwînxwari em naçin welat"

Kovara HAWAR  
Jimara 49  
15 Ilon 1942




## J. ESPAR

Heştê Tirmehê ye. Ji rojan roja duşemê. Li Stockholmê roj diçirise. Çük bi den-gên xwe yên *rengin* û delal bi rojê re ketine xeberdanê. Kulfikan dilê xwe ji havînê re vekîriye. Ezman zelal û bê deng e. Pêlén deryayê carnan gelek hêdî li qeraxê dikevin. Kêf kêfa swêdiyan e. Ew, tav û germahî ketine ber singên hevdu. Ez jî li tavê mîze dikim, wekî ku min qet nedîtiye. Destê min dirêji radyoyê dibe, ez dê li nûçan guhdarî bikim. Saet nêzê 6'ê êvarê ye. Nûça pêşı: "Laşê serokê Partiya Gelê Kedkar (HEP) yê Dîyarbekirê Wedat Aydin li nêzîkê qeza Medenê hate dîtin. Sê kes, sê rojan berê Wedat Aydin ji mala wî dîgrin û dîbin, berê lê eşkence dîkin û paşê jî wî didine ber gulleyan. Kesên ku dîçin mala Wedat û wî dîbin xwe wek polîs didin nasîn." Spiker ji sedîsed xwendina nûçan didomîne. Lê, ez nema dikarim guhdarî bikim. Dilê min teng dibe. Gewriya min tije dibe, hêstirê min ên gerim xwe berdidin ser dilê min û li wir difetisin. Demeke gelek dirêj ez nikarim xwe tev bidim. Bi dengê hevala xwe ya kar ez serê xwe bilind dikim. Hevala min dixwaze li halê min bipirse. Ez zanim, hevala min a swêdî ji wehşeteke weha re nenas e. Di cihana wê de cihê bûyerên weha tune ye. Lê dîsan jî qasî ku zimanê min digere û mejiyê min ê tevlîhev dest dide, ez behsa jiyan û têkoşîna te dikim. Û tu bi rûyê xwe yê ronî û ges têyî mîvaniya min. Ez û tu dest bi xeberdanê dîkin.

Hevalê min ê dilovan, nizanim tê bîra te, me hevdu çawan nas kir? Dîsan weke îro havîn bû. Tav ji îro xurtir û jiyan jî ji îro xweştir bû. Ez nizanim kîjan roj bû, lê sal 1973, cih jî li Amedê (Dîyarbekir) bû. Li taxa Ofîsê kamyonê genim barkirî li dorê bûn. Ber bi êvarê bû, germahiya

tavê hîn jî ji kolanan derneketibû. Ez li Ofîsê di bûroya nasekî me de rûniştibûm. Ji nîşka ve tu ketî hundir. Tu xorxekî ciwan, tije û çeleng bûyî. Bi hatina te, hewa civata me guherî. Te bi dengelî bilind û bi şêweyekî jîndar dest bi xeberdanê kir. Kenîna te ya ges carnan axafti-



Wedat Aydin (1953 - 1991)

nate dixemilandin. Te, ji me re behsa rêt-wîtiya xwe dikir. Tu ji Stenbolê nû hatibûyî. Niha nayê bîra min ka gi rozet bû, lê rozetek li ser yaxa çakêtê te hebû. Te got: "Ji bo vê rozetê hindik mabû faşist li Enqarê (Ankara) min bikujin." Min bi dîqet li te mîze dikir. Bi her halê xwe te bala min dikîşand. Ji her hareketê te xuyabû, tu pir bi xwe bawerî. Axafîna te ya jîndar hareket û kenîna te ya sempatîk tesrîke pozitîv li ser mirov dihişt. Civata me, ji aliye temen ve ji me gelek mezintir bû. Lê gişan jî bi dilxweşî guhdariya te dikir. Di navbera me de dosta-niyeke ji dil wê rojê ji dayîk bû. Lê me nizanibû ev dostaniya me, rê ji hevaltiya salan re vedike. Ji ber nasîn me yên

muşterek em çend caran hatin gündê we. Tu di nav jiyan gundiye kî sade de bûyi

## Şervanê barîkadan

Kurdistanê bê dengiya salan hêdî hêdî li pey xwe dihişt. Terora faşîzma 12'ê Adarê, ji tesîra xwe gelek tişt wenda kiribû. Xort û ronakbîrê Kurdistan dest bi munaqeşeyen gerim kiribûn. Pirtûkên Marksîstî û çep di nav xwendevanan de belav bûbûn. Gelek xort li riya şoreşa Kurdistanê digeriyan. Wêjeyen çep dihiştin xwendevanen nû. Kom û grübîn politîk dixwestin şikleki bigrin. Cîhan pir biçûk bûbû. Pekîn-Moskova hatibûn ber deriyê me. Jiyana serokên şoreşen hinek welatan gelek balkêş bû ji bo me xortan. Her roj teoriyên nû dihiştin Kurdistanê. Tevlîheviyeke têra xwe bi heyecan hebû. Kurdistan weletekî kolonî ye an na? Kurd bila rêxistina xwe ya serbixwe çêkin an na? Kurd netewe ne an kêmâni ne? Sovyet sosyal emperyaîist e an sosyalist e? Şerê çekdarî pêwîst e an na? Mijarên sereke yên munaqeşeyen wê demê ev bûn. Lê di hinek komele û deran de, hinek kesan dest bi karê rêxistinî kiribû. Kovarîn siyasi hazırlıya weşanen xwe dikirin.

Li Amedê ji bo unîversîtan îmtihan çêdibûn, gelek xort ji bo îmtîhanan li Amedê ne. Hat bihîstin ku Turkeş, serokê partiya faşist (MHP) tê Amedê.

Gelê Amedê mîvanekî faşist nedîxwest û li dij hatina wî xwe ji protestoyan re û şer re amade dikir. Gel li gelek cihê bajêr kom bûbû û di nav xwe de qise dikir. Munaqeşe dikir ka Turkeş faşist bi ci awayî ji Amadê bikine der. Ez li te di gerim di nav komên mirovan de. Ez dizam tu îro li Amedê dibî qehremanekî bê

nav. Lê, gera min tu encam nade.

Ser bi şewtandina ala partiya faşist ku li Derê Çiyê li bedenê eliqandî bû, dest pê kir. Gelê Kurd di şexsê Turkeşê faşist de, li dij faşizm û koloniyalîzmê kîn û dij-minatiya xwe bi serîrakirineke gelêri nişan dida. Di rojeva gelê me de îro, bi şewe-yekî gişî li dijî dewleta Tirk serîhildan tune bû. Ew serîhildana gişî di çend salan şûn de, bi dayîna hezaran şehîdan û bi rêtixineke milîtan dê bihatâ. Lê, serîhildana li dij Turkeş potansiyela têkoşîna gelê Kurd nişan dida.

Belê, wek tu jî baş dizanî, Turkeş li Amedê nikaribû qise bike û xwe bi zorê gîhandibû binê baskên dewleta xwe. Kal, pîr, jin, mîr û heta zarokan tevayıya gelê me heta êvarê, li dijî faşist û polîsan şer kiribûn. Bi vê bûyerê rûpeleka nû ya bi şeref ketibû dîroka Amedê.

Tavê ji zû ve ji me xatir xwestibû û em li ber qehwa Abîdê rawestiya bûn. Tu ji aliye fakultê ve ber bi me ve dihatî. Halê te bi gişî wek halê şervanê barîkadan bû. Soleke te tune bû. Rûyê te yê fi-reh ji derban têra xwe nesîbê xwe girtibû. Cilêن te qetandî û gemarî bûn. Lê, tu dîsan bi ken û kêt bûyi. Li ser pirsa me, te got: "Ez ji pişî nîvro vir ve li ser riya fakultê di şer de me." Me xwest em te bişenîn mal, lê te bi xwînsarî got: "Na lo tişt nabe."

## "kirassor"

Jîyan li welatê me, bi têkoşînê hîn ji bi mane dibû. Civata Kurdistanê ji bûyerênen mezin û dîrokî re berendam (namzet) bû. Te bawer dîkir ku azadî qasî her mîletekî mafê Kurdan e ji. Şexsiyeta te ya azad û serwext jîyaneye bê rûmet ranedîkir. Te li dijî koletiya dîrokî serî rakir û bûyi evîndarê azadî û serxwebûnê. Tu êdî têkoşerekî bê westan û bi têkoşîna xwe ya dirêj li qada şerê bûyi. Wek Spartakus te ji di qada şerî de berê hespê xwe kuşt. Ji ber ku di dilê te de, ji riya rizgariya welêt vejer tune bû.

Sal 1977 bû. Em herdu ji di refîn DDKD de ne. Em herdu ji li Amedê diçin dibistanekê. Di nûneriya xwendevanan de em bi hev re kar dîkir. Navê te di nav xwendekaran de Kirassor e. Ji ber ku kirasê te yê sor her tim li te bû. Tempoya xebata te, gelek bilind e. Ji bo ku em bigîhêjin te, em xwe pir dêşînin. Lê, dî-

san ji Kirassorê me her tim li pêş e. Enerjiya wî bê sînor e. Di her babetê xebatê de, muhaqeq dîtinê te hene. haraketê te yên bi bawer, bi der û dora te re, têkiliyên fireh çedikin. Şexsiyeta te ya xurt, milîtan û dînamîk karê me hemûyan hesan dike. Tu nefsbîcûk i. Karê biçük, mezin li gel te tune ye û ji bo wê ji li her ci tu heyî. Însiyatîv û kontrola te ya li ser xebatê aliyê te yê herî balkêş e. Ji her pîrsê re bersiva te, ji her problemê re pişaftina te heye. Tu xwedî tolerans i û bi sebr i. Tu dikarî mirovan guhdarî bikî. Mirovan nas dikî. Ji ber ku têkiliyên te, bi mirovan re ciddî ne. Tu sekter û teng nînî, lê bi biryârî, bîr û baweriya xwe, dîtinê xwe hişk diparêzî. Tu ji însanên tirsonek, pozbilind û pirxeber hez nakî. Û tîpên weha her car dijminê te ne. Tu ji dijminahiya mirovîn weha hez dikî. Karên herî ciddî û bi rîsk para te ne. Li Kurdistanê têkoşîna te li dijî faşist û paşverûyan di wê demê de ji bi nav e. Di pişaf-tinê probleman de pêşniyarên radikal ji te têr û tu bi xwe ji bicî tînî. Di dilê te de ci heye, di zimanê te de ji ew heye. Tu dîtinê xwe eşkere li gel her kesî dîbêjî û şexsiyeta xwe li hemberê her kesî diparêzî.

Tu bi tenê karê pratîk nakî, her weha xwendevanekî baş i. Tu zana û ronakbîr i. Gelek caran pirtûkên nû derdiketin em ji te fêr dibûn. Xwendinê ji xewa te gelek wext dizî dîkir. Tu xwedî jîyaneye kolektîv i û her tişt te yê me bû ji. Çaxa li ser peran bihatâ qisekirin te weha dogot: "Perên min ji bo pirtûk û endametiya min hebe bes e. Em dê bi peran çibikin." Jîyan ji bo te, têkoşîn ji bo welêt û mirovayetî ye. Felsefa jîyanâ te hewqas kurt û bi rûmet e.

## "Pirsa kurdistanê ne pirsa kêc û deveyan e"

Di navbera pêwîstîyên şoreşa Kurdistanê û pratiqa rêtixina me ya wê demê DDKD de, nakokiyêne mezin hebûn. Te li encamên wê politikayê pir caran rexne dîkir. Lê bûyerek hebû û te bi henekan ji xemîlandibû û her tim digot: "TÖB-DER (Komela Mamosteyên Tirkîyê) li Amedê mitîngek çekiribû. Liqê TÖB-DER a Arme-dê di destê DDKD de bû. Di mitîngê de sloganike weha bi xurtî û gelek caran hatibû avêtin: "Meyak Meyak dediler mil-

yonları yediiler" (Meyak meyak gotin û milyonan xwarin.) (1) Te digot: "De we-nin bêjin bi vê sloganê Kurdistan çawan rizgar dibe?"

Di dehê Tebaxa 1977'ê de faşistân li Stenbolê welatparêzekî xwendekar kuş-tibûn. Hakkî Uzar ji bajarê Bedlîsê bû û cenazê wî hatibû Bedlîsê. Em ji bi otobu-sekê ji Amedê diçin Bedlîsê. Di otobusê de hebûna te, rengekî din dabû rîwîtiya me. Tu bi moralekî bilind diaxîfî û surû-dîn şoreşgerî dibêjî, didî gotin. Di wê demê de straneke li ser Lenîn di nav xortên şoreşger de popîler e. Stranê weha dest pê dikir: "Sala hezar heşted heftê, şérîn Lenîn hate dinê." Em strana Lenîn dibêjîn. Şofêrê otobusê Hecî Şerif nerehet e. Çaxa ku navê Lenîn derbas dibe, Hecî Şerif parî ji bi dengekî bilind eşheda xwe tîne û duan dike. Hecî Şerif nasê min e. Ji min re dibêje: "Ez rica di-kim pismam ev strana Lenîn mebêjîn, dê felaket bi ser me de bê." Ez ji te re dibêjîm, lê tu evîndarê Lenîn i. Stran heta Bedlîsê tê gotin.

Em bi şev derengî digihêjin Bedlîsê. Em diçin xaniyê TÖB-DERê. Li hember xaniyê TÖB-DERê di dîwarekî de lewha partiya faşist ên Tirk heye. Tu çaxa ku lewhê dibînî, xwe têr aciz dikî. Ji ber ku lewha çend metran bilind e, tu li silimekî digerî. Tu çend kesan dişînî ji bo ku tiş-tekî peyda bikin û tu xwe bigîhînî lehveye.

Bajarê Bedlîsê di nav newalekê de ye. Xanî ji herdu alîyan ve li hevdu si-warbûne. Di nav çarşıya biçük de em çend caran diçin û têr. Tu li cihê xwe nasekinî. Li xaniyê komela PîMê (Komala li dij buhabûnê û bê kariyê) Afişen ku li dîwaran in, tu nişanê me dişî û dibêjî: "Ka wein vê afişê bixwînî!" "Fiatlar deve, Ücretler pire" (Buhayî deve û hatin kêt e.) Paşê ji tu dibêjî: "Pirsa Kurdistanê ne pirsa deve û kêcan e." Gelek xwendekar ji der ve hatine Bedlîsê. Gelê Bedlîsê bi meraq li mîvanê xwe yê ne-nas mîze dike. Bi te re em çend heval heta beyaniyê li ser cenazê Hakkî nobet digirin. Çaxa ku em Hakkî dibin goristânê, li kîlekên rê em dayîkên Kurdistanê dibînîn. Dayîkên me ji bo şehîdê xwe dîgrîn û lawjanan dibêjîn. Lê, deh salan şûn de dayîkên me ji bo law û keçen xwe yên şehîd dîlanan dikşînin. Heneyêwan yêbûkîtî û zavatiyê çedikin. Ev guherîna dayîkên me di dîroka me de qonaxeke nû ye.


Civata Kurdistanê dikele. Tevîheviyekê nedîfî heye. Hemberiyeke bê bext gelê me perçê perçê kiriye. Bi dehan grûb, komik û partî hene. Şert ne gelek dijwar in. Her deh xortênu ku têne gel hev, navekî li xwe dikin û bi iddiayêne mezin xwe davêjin holê. Bi taybetî grûbêne reformist, sist û qels bi dîtin û organizebûna xwe riya şoreşa Kurdistanê tarî dikin. DDKD bi tevayî ji rastiyê şoreşa welêt dûrketiye û enerjiya ciwanê Kurdistanê xerc dike. Serokatiya DDKD refêne şoreşger

kê nîşan nade.

### "Derketina der qedexe ye!"

Saet çarê beyaniyê de, em bi dengekî êrîşkar ji xew şiyar dibin. Bi megafonan li der ve anons tê kirin. "Derketina der qedexe ye!" Em radyoyê vedikin. Erê, artêşa faşist a Tirkan dest danîye ser hukim. Rojên giran li pêş me ne. Terora dewleta Tirkiyê wehşeteke nû dê li darxe.

bûn. Têkoşînê bawerîyeke xurt û fedakariyeke mezin dixwest. Di şertên faşizmêde, ya rêxistinê Kurdistanê dê berxwe bidana, yan jî dê qada têkoşînê terk bikiran. Di vê manê de, di nav rêxistinê Kurdistan de zelalbûneke gelek zû çêbû. DDKD pişî 12'ê Îlonê perçê bû. Perçeyen DDKD dîsan di nav xwe de perçê bûn. Hareketê reformistên din jî mehekê zû an jî dereng aqîbeta DDKDê taqîb kirin. Ango bi gotineke din, tevger û serokatiyêne ku xwe li gor pêwîstiyêne şoreşa



terk kirine û ketine pey berjewendiyêne xwe yên ferdî. Lî, sebra te nema di bin siya dar û lokalêne komelan de tê. Tu wenda dibî.

Hezîran an jî Tîrmeha 1980'î ye. Tu nû ji perwerdebûna şerê gerîlla vejeriyayî. Tu gelek zirav bûyî. Rûyê te yê gilover û fireh ji tavê reş bûye. Solêne spor û pantoreke jeans li te ne. Em di lokaleke sendîkayê de hevdu dibînin. Ez dibêjim: "Wedat çol gelek li te hatîye." Tu serê xwe dihejînî û dikenî. Niha tu bi her tiştê xwe ve ji şerê welêt re amadeyî. Lî, ka ew rêxistin? Pişte perwerdebûna leşkerî DDKD ji lokalêne komeleyan bêtir tu riye-

Tu têyî girtin. Û nema em hevdu dibînin.

Ez naxwazim ji te re behsa 12'ê Îlona 1980'î bikim. Ji ber ku tu hem şahîdê vê hovîtiya nedîfî yî û hem jî bûyî hedefa wê. Lî, ger tu destûr bi, ez dixwazim li ser encamên 12'ê Îlonê çend tiştan bêjim.

Cuntaya faşist ji me re mirin, talan, êşkence, malwêrani û surgûn bi xwe re anî. Ev alîyekî vê rejîma faşist bû. Ez bawer im, dê mirovayetî di gelek salêne din jî de li ser tawanêne rejîma faşist raweste û vê rejîma xwînxwar mehkûm bike. Lî, bi hatina rejîma faşist di civata Kurdistanê de pir tişt, ji binî ve guherîn. Berî her tiştî hoyêne li Kurdistanê pir dijwartir

Kurdistanê bi rêxistinî nekiribûn, belav bûn. Ji xwe belavnebûyîna wan tiştekî anormal dibû. Ji ber ku şoreşa Kurdistanê, di dema me de şoreşke herî giran û dijwar e. Ev şoreş, bi serokatî û pêşengiyêne sist, bê bawer û bê kapasite nedimeşıya. Jîyanê bi israr û zelalî da nişandan ku reformizm li Kurdistanê nabe dermanê tû tiştekî. Ji bo vê yekê jî ji rêxistinberî 12'ê Îlonê ji biî PKK rêxistin neman. Kadroyen kevin navêne wan ji bîr ve kir û nifşen nû jî navêne wan nebihîst in.

Di dawiya 1981'ê bû. Em li Amedêne. Tu jî ji zîndanê têyî berdan. Em bir-

yar digrin ku te biparêzin, bidin alî. Ji ber ku em dizanin tu dîsan têyî girtin. Lî, bîr-yara me nayê cih. Sedemê wî jî ev bû: DDKD bûye du cih. Bi navê yên "hundirê welêt" û "derê welêt." Yên hundirê welêt naxwazin te bişînin der. Ji ber ku li der rîxistin bi her awayî xuya dike ka ci rîxistin e. Lî, polîs karê xwe texîr nake, di hefetekê şûn de tu dîsan têyî girtin.

## "Berxwedan Jiyan e"

Adara 1982'ê ye. Li Amedê, mirov nikare nefesê bigre. Faşizma Tîrkan, bi zil-meke nedîfî di êrîşê de ye. Terora dewletê di demeke kurt be jî bi ser ketîye. Di zîndana Amedê de, mîrxas û şoreşgerên Kurdistanê li dijî terora dewletê li ber xwe didin. Bedêla şoreşgeriyê di rojêne weha de giran e. Bi şerefa xwe li ser pîyan mayîn, ne karê her kesî ye. Hêvî di zîndanan de dîl ketiye û dîvê azad be. Ji bo vê yekê jî li zîndana Amedê şerekî dijwar dom dike. Berxwedan bes li wê derê li ser piyan e. Di Newroza 1982'ê de tîrîjêne berxwedanê dîwaran zîndana Amedê yên stûr kun dikin û şewqa xwe didin Kurdistanê. **Mezûm** zilmê dikuje. Axa Kurdistanê bi bereket e. Berxwedan li ser vê axa pîroz jî nû ve zîl dide. Mîrxasen din bi serbilindî û ciwanmîrî jiyan-a xwe ya pak diyariyê axa xwe ya niştîman dikin. Edî mejiyê zilmê belav dibe. berxwedan dibe jiyan.

Tu jî di vê zîndanê de şoreşgerekî. Berxwedanvanê zîndanê yî. Di vê demê de serokê DDKD bi dil û can xwe teslimê faşizma Tîrkan dike. Ev bê bextî dibe sebeb ku tu bi salan li zîndanê bîmîn û em jî, ji welêt dûr bikevin. Tu edî li dij zordestiyê şervanê azadiyê yî û em jî li derê welêt surgun an jî di bakurê cîhanê de penaber...

15'ê Tebaxê ye. Li Kurdistanê, dengekî bi biryar û gurr bilind dibe û pişa xwe dide çîyan. Çiyayên mîvanperwer û heval. Çiyayênu ku bi salan in bi şîn û xemgîn in. Çiyayênu ku bi dehan car bûne warê şervanê azadiyê. Çiyayênu ku hêviya rojêne pêş, bi salan di bilindahiya xwe de xwedî kirine. Belê, dîrokeke ne nas vesartî bû di bejna van çîyan de. Ji serîhildana Dêrsimê vir de kesî silav nedabû wan. Bêrîkirinê dîlê wan peritandibû. Û iro ew ge-hîştibûn evîndarêne xwe. Rûyênu wan bi ken û dilê wan jî şâ bûbû

bi mîvanêne wan.

Piştî 15'ê Tebaxê 1984'ê dîrokê rû-pelekî nû vekir ji bo Kurdistanê. Dîrok dê ji nû ve bihata nivîsandin. Neteweyê Kurd bi derengî be jî riya rizgariyê dibû. Dê şerê azadiyê di vê axê de dom bikira û dom kir jî.

Bi dest pê kirina şerê gerillayêne pîroz û milîtan çehra Kurdistanê roj bi roj guherî. Şerê gerilla di nav gîrsen gel de, bere sempati û paşê jî destek dît. Gel bi êrîşen şervanê azadiyê şâ dibûn û xwe didan der û dora artêşa rizgariya xwe. Roj bi roj helqeya gel di der û dora ARGK de fireh dibû. ARGK edî artêşa gelê xwe bû, kampê ARGK bûn waran xort û keçen Kurdistanê.

## Tu li der ve yî

Cezayê ku dadgeha kolonîyalîst û faşîst dabû te, qediya bû. Bi cezayê kolonîyalîstan te gaveke jî bi paş ve ne avetibû. Hêviya te ciwan û jîndar bû. Ruhê te yê şoreşger ji berê geşir û xortir bûbû. Kîn û nefreta te li dijî dewleta Tîrkan ji berê zêdetir bûbû. Te di zîndanê de dijiminê xwe baştır nas kiribû. Bê guman dosten xwe jî... Serokatiya ku te pê bawer kiribû, teslimê dijiminê te bûbû. Lî, te bi berxwedana xwe bersiva wan dabû. Şexsiyeta te ya şoreşger, li zîndanê bi tecrûbeyen gelek buha dewlemend bûbû. Têkoşîna li derê zîndanan baweriya te xurtir kiribû. Têkoşîna rizgariya welêt çaxa ku dijimin gelekî bi hêz bû, dest pê kiribû û bi serfirazî dom dikir. Munaqeşeyen bingehîn yên li ser şoreşa Kurdistanê bi 15'ê Tebaxê qediya bûn.

Çend salen zîndanê li pey te mabûn, lê welat hîn jî bindest û ne azad e. Civata Kurdistanê tu fonksiyona xwe ya civakî nikare bîne cih. Mejiyê Kurdistanê belav e. Gelek ji hevalen te yên kevin dev ji kar û barêni siyasi berdane û bes dêbavêne zarokên xwe ne. Jîyanekê "nû" ji xwe re ava dikin. Di xortaniya xwe de, tişten ku ketibûn ser milen wan, wan kiribûn. Qey heta dawiya emrê xwe bi van karan re mijûl nabin(!) Te van "şoreşgerên kevin" didiyan di kolan û deran de. Lî, te biryara xwe carekê dabû, 15 sal berê. Agirê şoreşê di dilê te de gurr e. Te ev ruhê pak û pîroz bi salan li dijî her tişî parastibû. Te û têkoşîna rizgariya netewaya Kurdistanê bi dil hevdu

hembêz kir.

Te milen xwe şemirand û bi zeman re ketiyî hemberiyeke dijwar. PKK di civata Kurdistanê de şiyarbûneke mezin pêk a-niye. Di her warê jîyanê dê bûye qada şer. Valahî di gelek waran de heye. Tu bi enerjiya xwe ya bê sînor valahiyan tije dikî û meşa azadiya gelê Kurdistanê ber bi rojén serfiraz de dibî.

Di havîna 1989'ê de hevalek ji Swêdê hatibû Amedê. Di wê demê de tu bi piştigiriya berxwedanvanen zîndanê re mijûl i. Greva birçibûnê li Amedê li xaniyê Partiya Sosyalist de dom dikir. Destê te di desten dayikên şehîdan de ye. Hûn bi dîlan û stranen xwe piştigiriya şerên welêt dikan. Hûn bi sloganen xwe ji gerillayen qehreman re, berxwedanvanen zîndanan re silavan dişînin.

## Tevgereke nû, rîndiyeke nû

Şiyarbûn û têkoşîna Kurdistanê tu tixûban nas nake. Strana ku pêşmergeyan li çiyayen Kurdistanê afirandibû di devê bajariyan de ye. Tevgereke nû, rîndiyeke nû li Nisêbînê û li Cizîra Botan bejn dide. Têkoşîna bi çek û ya sivil dîghêjin hevdu û qonaxeke nû di dîroka me de vedike. Ev qonax hemdem e, modern e û bi teşîr e. Têkoşîn kerektereke nû digre. Dukandar, karmend, karker, gundi, bêkar, kwendekar, ronakbîr bi kurtî tevayıya çin û kategoriyan civata Kurdistanê xwedî li welêt derdikevin û ji bo wê têdikoşin. Gelê Kurdistanê ji kolonîyalîzma Tîrkan diqete. Di navbera xwe û dewletê de sînorekê stûr dikşîne. Peyva serîhildanê dikeve literatura politîkê, di keve dil û mejiyê gel. Civata Kurdistanê hêdî hêdî fonksiyonen xwe yên civakî pêk tîne.

Bi serîhildanen eniya şer li dijî dewleta kolonîyalîst fireh dibe. Dijmin edî nema dizane, ku kengê û ji kîjan alî ve êrîş tê. Dijmin şaş bûye. Edî bi her awayî hîs dike ku di welitekî din de hêzeke dagîker e. Dîwaran tirsê xirab bûne. Gel nema ditirse. Dora tirsê hatiye ser dijmin.

Hêzen nû yên civakî derdikevin qada şerî. Jin û keçen ciwan dibin pêşmerge û serîhildanen dikşînin. Ne yek, dudo û deh lê bi sedan, hezaran. Bi serê xwe ev bûyera civakî muhtacen lêkolîn û lêgerînen girîng e. Bê guman ev encama têkoşîneke dijwar e. Tradisyonen kevin û paş di civata Kurdistanê de ji navê radi-

bin. Civat bi şêweyekî şoreşger xwe di-guhêrine. Ya herî girîng, di dîroka Kurdistanê de guhertinêng bingehînê weha cara yekem e ku çedibin. cara yekem e, ku jin wek unsûrekî civatê roleke aktiv dileyîzin. Li Kurdistanê jin dîbin motora demokrasiyê, wekhevîyê û ya şoreşê. Bi vê tevgerê civata Kurdistanê xwe nû dike. Yekîtiya netewî bi tevgera jinan bi şêweyekî kûr û fireh pêk tê. Jin bi xwe re motifên nû tînin qada têkoşînê. Motora folkora Kurdan "tilîfî" dibe sembola aza-diyyê. Serîhildana jinan prestij û tesîra şoreşa Kurdistanê zêde dike.

Di civata Kurdistanê de ev guhertinêng kûr û bingehîn, di qada navnetewî de, di gelek navendêng politikî de pirsa Kurdistanê dike pirseke sereke. Peyvîn Kurd û Kurdistanê bi naverokeke nû di çapeme-niya cîhanê de cih digrin. Lêkolînvan, roj-namevan dîrokñas, sînemakar, nîvîskar Kurdan û Kurdistanê dixwînin. Kurdistan dibe mijareke aktûel ji bo siyasetvan û ronakbîrêng cîhanê. Ëdî nema kes qîma xwe li ser Kurdan bi çend peyvîn ansi-klopedîk tîne.

## Di salona dewletê de kurdi

Sal 1990'e. Wedat Aydin, tu di naven-da şerê welêt de wek ronakbîrekî bi namûs, militanekî bê tirs û serokê gel yê nefşbiçük bê westan têdikoşî. Ji cihê qada têkoşîna te yek jî, Komela Mafên Mirovan e. Tu birînêng şerê taybetiya dewletâng Tirkîye derman dikî. Tu jenosîd û provakasyonêng dewleta Tirkîye ji cîhanê re eşkera dikî. Tu ji bo her şehîdê azadî, serxwebûnê û serîhildanêng gelî bi rêxistin dikî.

Di 28'ê meha Çiriya Peşîn 1990'ê de, Komela Mafê Mirovan ya Tirkîye komcivîna xwe ya sêyem li Engerê li dar dixe. Tu wek nûnerê Amedê li hember çend hezar besdarêng komcivînê bi zimanê xwe qise dikî. Bê guman tiştekî ku tu dikî tu anormalî tê de tune ye. Li cîhanê her mirov gava ku hewcetî dibîne bi zimanê xwe qise dike. Mirov pişti ku bûye mirov, ango pişti ku ji heywanan cihê bûye û dikaribûye bifikire, dîtinêng xwe, hîsîn xwe anîye zimên. Ev ji xwe li derveyê îradeya mirovan wek fenomenêke tabii pêk tê. Li tû derê cîhanê û tû car dewleteke bi qanûnan zimanê neteweyekî qedexe neki-

riye. Lê pişti ku di 1923'ê de dewleta Tirkîye ava dibe, cîhan bi qanûnekê we-ha-re dibe nas. Nîjadperestiya Tirk qise-kirina me, bi qanûnekê qedexe dike û me Kurdan ji mirovan nahesibîne. Lê, nî-jadperstîn Tirk, bîryar nadîn pişti ku em Kurd ne mirov in, ka em ci ne? Ji bo vê yekê jî çaxa ku em doza welêt dikin, di eyîn wextê de, em mirovbûna xwe jî didozin. Ev jî kerekterâ şoreşa Kurdistanêng ya taybetî ye.

Sîk tê de tune ye, tu dizanî pişti axaf-tinê dê tu bêyî girtin û tu têyî girtin jî. Wek her girtiyêng welatparêz polîsîn Tirk te dîbin cihê êşkencê û berê çavêng te di-grin û duv re jî dest bi pirsêng xwe dikin:

**Pols:** Binêre tu ci dişibî mirovekî saf û paqîj. Ci rûyê te yê nûranî ye.

**Wedat:** Subhanallah, we jî ku ev yek dîti, ma kerematê we hene?

**Pols:** Ji xwe her gav weha dibe, yêng wek te bi kar tînin. Ma ji te pê ve kesekî ku bi Kurdi biaxafta tune bû?

**Wedat:** Hebû, bi kîmasî ji sedî bîst û pêncê salonê bi Kurdi dizanibûn.

**Pols:** Baş e, çima kesî din nepeyîvî?

**Wedat:** Ci ferq dike? Niha kî di şûna min de li vir bûna wê ev pirs ji wan biha-tina kirin. Vê carê jî qewlê musilmanan, bû nesîbê min.

**Pols:** Te di vê salona dewletê de, bi zanabûn ji qestî Kurdi qise kir.

**Wedat:** Erê, bi zanabûn û qest ez pe-yîvîm. Di kongreya mafêng mirovayî de, ji parêzgerêng mafêng mirovan min daxwaz kir ku li hemberê qedexekirina zimanê me yê zîmkî, vî karûbarê ne însanî bi-din rawestandin (....)

**Pols:** Baş e, tû kesî ku tu teşviqê vê axaftinê kir tune bû?

**Wedat:** Helbet hebû.

**Pols:** Kî bû?

**Wedat:** Diya min e. Peyvekê ji bi tirkî nizane. Bavê min li eskeriyê tirkî hîn bû. Min gava dest bi dibistanê kir, ez hîn bûm. Bapîrê min gava çû gorê peyvek bi tirkî nizanibû. A ji bo ez bibim tercûmanê hîsîn wan min ev axaftin kir. Ji iro pê ve eđî hûn dê rastê gelek kesen weha bêng.

**Pols:** Tu Tirk i an na?

**Wedat:** De îcar eyb e, pişti hewqas xeberdan hûn pirsek weha jî min dike. Xwene hûn ne li hêviyê ne, ku ez bêjîm "ez Tirk im." (2)

Tu li mehkemê jî bi Kurdi qise dikî û axaftina xwe diparêzî. Li ser axaftina kur-

dî, tu du mehan li zindanê dimînî. Li ser girtina te hem li derê welêt û hem jî li hundirê welêt protesto li dij dewletê çedibûn. Ji bo wê jî mehkeme mecbûr dimîne, te berdiye.

## Rewşenbîrekî bi bîryar

Tu dîsan li der ve yî. Şerê azadî û serxwebûnê geş û xweş e. Di çapeme-niya der û hundir de Wedat Aydin navekî nas û balkêş e. Em di bêdengiya Stockholmê de navê te bêhtir dibîhîsin. Di roj-nameyan de te dixwînin. Tu li Kurdistanê, di şexsiyeta xwe de rewşenbîrên milîtan temsîl dikî. Xusûsiyeten rewşenbîriya ku tu temsîl dikî, zelal in:

Ev rewşenbîr bi gel re ye û di nav gel de ye. Problem û hewcedariyêng civata xwe dibîne. Dizane ku rola rewşenbîran di pêşveçûna civatê de mezîn e. Anglo ew ji gelê xwe re lazîm e. Ev rewşenbîr fenomenêng civakî bi çavekî ob-jektîv dibîne û tehlîl dike. Berjewendiyen gel û welêt ji bo rewşenbîrên weha li ser her tişti ne. Ev rewşenbîr di navbera xwe û dewletê de sînorekî xuya kişandiye. Ev rewşenbîr netîrs e, aktiv e û xeyalperest nîne. Ev rewşenbîr jîr û xwedî perspektyeviski politik e. Dizane guherandînen civakî, bi rêxistinbûna civakî pêk tê. Ev rewşenbîr rexnegir e. Difikire û diafiîrîne. Ev rewşenbîr civatê nas dike, bûyeren ci-vakî taqîb dike û xwe nû dike. Ev rewşenbîr bi zanabûna xwe pozbilind û qure nîne. Heyranê xwe nîne. Nefşbiçük û xwedî tolerans e. Ev rewşenbîr xwedî wij-danekê pak e û xwe li hemberê civata xwe berpirsiyar dibîne. Ev rewşenbîr bi şexsiyeta xwe ya durist di nav gelê xwe de xwedî prestij û rûmet e. Ev rewşenbîr welatperest e, mirovez e. Ev rewşenbîr kapasita xwe ya fikrî, hunerî ji bo yekîtî û pêşvebirina gel bi kar tîne.

Bê guman gelek taybetiyen din yê rewşenbîrên dema nû hene. Lê yên ku niha hatin bîra min ev in. Belê, me gotibû têkoşîna xurt bi xwe re şertîn nû tîne û îmkanîn nû jî çedike. Dema nû gelek kanal û platformen legal jî afiran-dibû. Ev platform li benda rewşenbîrên jîr û dilsoz bûn.

Li Amedê komcivîna HEPê ya herêmî çedibe. Du berendam ji bo serokatiya HEPê hene. Yek tu yî û yê din jî nûnerê "Tevgerê" ye. Di hilbijartineke gelek de-

mokratîk de tu bi nêzîkî tevayıya dengan dibî serokê HEPê.

Ev platforma legal ji xebata te re gelek imkanên nû vedike. Tu serokê HEPê yê Amedê yî û di serokatiya PKKê de ji têkoşîna rizgariya neteweyî bi pêş ve diçê. Şer ji gundan û çiyan gihiştiye bajaran. ARGK her roj bajarekî an ji qezayekê dagîr dike. Serihildenê gel her roj mîvanê bajarekî nû ne. Tê bîra te, te qîma xwe bi karê hindik ne dihanî! Niha têra te kar heye li Kurdistanê. Tu her rojê li derekê yî. Şehîdên ARGK li hêviya te bûn. Divê tu di pêsiya cenaze de bi serbilindî bimeşıya. Dê-bavêن şehîdan dixwestin kurê wan Wedat li gel wan be. Li ser goristana şehîdan divê axaftin bihatalna kirin. Ji serihildenê bajaran re serokêni gel pêwîst bûn. Heyetên biyanî divê te bidîtan û te agahdarî bidana wan. Li dijî hovîtî û jenosidîn dewleta Tirk divê te presskonferans çêbikirana. Platformen rîexistinê demokratîk divê te bicivandana. Belê, serokê gel divê di nav gelê xwe de bibana. Li serê meha Tîrmehê ez li gel hevalekî bi telefonê dipeyivim û pîrsa te dikim. Heval dibêje; "Wedat deqîqeyeke nasekine." Şanzdeh sal in ku jiyana te her weha ye.

Di çarê meha Tîrmehê de tu ji nexweşxanê têyi tu çûyi ba kekê xwe yê Sidiq Tan. (3)

Tu ji wê têyi bûroya rojnameya Welât Nû (Yeni Ulke), li wê derê bi xebatkarê rojnamê re hûn li ser provakasyonên dewleta Tirk yên dawî disekinin. (4)

Xebatkarêni rojnamê ji te dipirsin: "Ge-*lo serok dora te ye?*" Bersiva te weha ye: "Dibe ku hûn wek henek dibêjin, lê ez rast dibêjin. Erê, dora min e. Lê mirina min ne bi bombe an ji tiştên weha ye. Dê li min metodeke nû bicerbinin."(5)

Tu rojnameya xwe dikirî û diçî mal. Di eynî şevê de kontr-gerillayê Tirk li deriyê te dixin û te dibin. Di 8'ê meha Tîrmehê de laşê te li nêzîkê qeza Medenê tê dîtin. Xebera şahedeta te di demeke pir kurt de li Kurdistanê û li tevayıya cîhanê tê bîhîstin. Eniya Rizgariya Netewa Kurdistanê li ser şahadeta te politikaya dewleta Tirk a nû weha tespit dikê: "... *Wedat AYDIN* ne hema weha bi nezanî hatîye hilbijartîn. Armanc jî ne tenê ew e, ku hema AYDIN were kuştin. Hedefêne taybetî yên vê teror û qirkirinê bi plan hene. berî her tişî dî kesbûna endamên HEP, IHD (Komela Mafêni Mirovan) û si-

yasiyên demokratîki de, dixwazin gelê Kurdistanê bitîrsînin. Gelê me eeskere tê tehdît kirin û tê gotin: Hûn dev ji têkoşînê ber nedîn, em dê we tevan bipelçi-qînîn. Çima?

*Li Kurdistanê, li kêleka têkoşîna gerîlla tevgereke gelî ya herî xurt birêve diçê û dagîrkerên Tirk di rawestandina vê têkoşînê de ketîne nav tengasiyeke herî mezin. Lewma ji serî didin van azîneyen gemar û derî mirovahî.* (6)

## Dîlana te!

Wedat, lawê Kurdistanê te di dehê Tîrmehê de nedî, ka li Kurdistanê û di tevayıya cîhanê de cihê ku Kurd lê hebûn ci qewimî? Kurdistan bi tevayıî li ser piyan bû. Ber bi te bazdida. Gel dixwest bigîje serokê xwe yê bi şeref û welathez. Kurdistanê bi rûbar û çemên xwe, bi çiya û deşten xwe, bi hîv û strîrkên xwe û bi dar û berên xwe berê xwe dabûn qezaya Medenê. Dil şikestî, lê bawerîxurt bûn. Jiyan xengîn, lê mejî bê tirs bû. Di devê her kesî de, navê te û peyva tolegirtin hebû. Cenazeya te bi ala ERNK pêçandî bi rê dikeve. Amed; warê şehîdan, xwedî dîroka bi xwîn li benda te bû. Bedena Amedê, çemê Dîclê, çiyayê Qerecdaxê xwe xemilandibûn. Wan dê dîlana te bikşandana. Gelê Kurdistanê bi sed hezaran ketübûn destêne hev. Çaxa ku tu bi 6-7 hezar otomobilan dikevî nava bajêr. Dîlana te dest pê dike. Di dîroka Kurdistanê de dîlaneke herî mezin û muhteşem. Gel strana te dibêje: *Bijî Kurdistan, bijî PKK, bijî serok APO!* Tu bi sed hezaran ber bi goristana Derê Mêrdînê dimeşî. Goristana ku çendekî berê te li wir qise kiribû. Azîz TURHALLI, gerillayê ARGK çendekî berê te biribû vê goristanê. Te gotibû: "Azîz şehîdî me ye. Ew ronakbireki welatê xwe bû û berpirsiyariya xwe zanibû. Ji bo bîr û bawerîyên xwe ji mirinê netirsiyabû. Erk û wezifeyên me ew in, ku em xwedî li şehîden xwe derkevin. Em nehêlin ku şehîdîn me di goristanen belediyê de bîn veşartin. Em dî rîwîtiya wan a dawî de wan bi tenê nehêlin. Serê me hemûyan sax be!"

(7) Pişî axaftinê, te dest bi surûda Ey Reqîb kiribû.

Gotinê te cihêni xwe digrin. Eynî wekî ku te gotibû, gelê me bi mîrxasî xwedî li şehîdîn xwe derdikeye. Hem ji

bi sed hezaran. Niha jî serokê xwe teslimê axa pîroz dike.

Serokê gel, tu dizanî dijminê me çav sor e, hov e û bê bext el Rabûna gelê Kurdistanê wî pir ditîrsîne û di Derê Mêrdînê de gelê bê çek gulebaran dike. Bi dehan law û keçen Kurdistanê dikuje. Lê Amed bi ser ketiye. Gelê me hêz û yekîtiya xwe bi vê rabûnê nas kiriye. Pişî serîhildana Amedê, li Kurdistanê li dehan bajar û qezan şîna netewî pêk tê. Li Ewrûpa bi deh hezaran welatparêzêen Kurdistanê ji bo te û şehîdên serîhil-dana Amedê meş, protesto, grevê bir-çibûnê, êrîsan li dijî konsolosxaneyen dewleta Tirkîyê çedîkin. Tu di dilê milyonan Kurdistanî de cihê xwe digrî û dibî qehremâne netewî.

Berî ku ez nameya xwe biqedinim, ez dixwazim tiştekî bêjîm, tişten ku li vir ji bo te hatine gotin, kêm in, hem ji gele. Di her rîza ku min nivîsand de min ev kîmanî hîs kir. Risma te çêkirin ne hêsan e. Peyv nikarin te bidin nasîn. Li min bibûre birayê min!

25.07.1991

(1) Meyak: *Li Tîrkiyê berî 1980'î ji bo mamoste û karmandan foneke. Her meh ji bo vê fonê ji meeşê wan pere dihatin birin.*

(2) Ev diyaloga di navbera Wedat G polisan ji nemeyeke Wedat hatîye gitin. Ev name ji aliye Wedat ve li derê welet ji yekê re hatîye sandin. Name pasê dikeve destê Armandê.

(3) Sidiq Tan: Endamê Komîta Kargê a Komela Maşa Mirovan a bajare Elîhê (Batmanê) ye. Kontr-gerillayen Tîrkan di 2.7.1991'e de bomba xistun otomobila wî û ew û kurê xwe birindar bûn.

(4) Dewleta Tîr 20 rojan berî kustina. Wedat Aydin li Amedê Elîhê, Sîrnaxê, Hêlale, Cizira Botan û Bazîde gelek kesen sivil kustin. Çend rîexistinen demokratîk û lokalîn rojnermeyen Kurd bi bomban hilwesandin. Di nav kustian de serokê belediya Hêlale Yakup Kara û car mirovan wî, ji Cizira Botan İbrahim Sarica, ji Kosarê Mehmet Salih Dogan, ji Bazîde İsmail Efe ji hebûn. (Binêre rojnama Berwedenê hejmara taybetî Tîrmehê 91)

(5) Rojnama Welatê Nû (Yeni Ulke): hejmar 38, 14-20 Tîrmehê.)

(6) Ji bo analîzen gîstî li ser vê buyerê li rojnameya berxwedanê hejmara taybetî binêre.

(7) Rojnameya Welatê Nû hejmar 38.

# Otonomîzm bêçaretî û binketin, serxwebûnxwazî rizgarî û serketin e

Mîrhem

Derketin û peydebûna neteweyan, çend sed salî kevn e. Mafê çarenûs û bidestvehanîna rojên ayendeyê (pêşerojê), ji şoreşa fransa û vir de, ji dayik bûye. Paş şerên cîhanî yên yekemîn û duhemîn, bi dehan netewêne ewrûpî, afrîkî, asyayî û Amerîkaya Latînî, dewletên xwe ava kirine. Hejmara dewletên endamên Yekîtiya Netewan, li dora 170 neteweyî ye. Endamê herî dawî ya Yekîtiya Neteweyan, dewleta Namîbya ye.

Em kurd, bêhtirî 30 milyon mirrov, hîna bindest in. Perçe-perçe ne û hîna jî piştî ev çend guherîn û serpêhatiyên seranserî yên cîhanî, me xwe nekiriye bi dilekî û hîna jî em baş nizanin, ka em ci dixwazin: Otonomî? Yan jî Serxwebûn?

Laş û gewdê me ji hev ketiye. Serê me li alîyekî û perçen gewdê me yên mayî li alîyekî din in.

Her netewe ji dayika xwe bû, em hê di zikê diya xwe de ne. Em dereng mane. Pir dereng mane. Derengiyek ku bi hejmara me û bi cografya me re, li hev nake û ne layiq ê kevnarî û rehkûriya me ye.

Em bi tirs in. Bi xwe ne bawer in. Em xwe kêm dibînin. Em bi çavênetewan li xwe nanerin û netewebûn û netewenebûyîna xwe dixin bin şik û gumanê.

Em di aliyê hîzrî (fîkrî), ramyarî (siyâsî) û îdeolojîkî de pir qels in. Hesta (hîs) netaweyetî, welathezî û welatperêziyê, li ba me ne xurt e û tiştî heye jî kêm e. Nîvrê û nîvqurmucî ye.

Em xwe ji neteweyen cîran, neteweyen tîrk, ereb û faris kêm-hunertir dibînin û bindestî û kolletiya xwe, mîna qederekê dihênin ber çavênen xwe.

Di nav me û neteweyen hawîrdorêne me de, di nav me û neteweyen cîhanê û cîhana pêşketî de, dûrahî û mesafeyeke mezin hatiye pê. Ev rîdûrî û mesafe her dihere fireh dibe. Rewşa me kirîtik e. Em di nav qonaxeke man û nemanê de li ber xwe didin. Rewşa Başûra Kurdistanê li ber çavan e. Tiştî hatiye serê gelê me nas e.

Berpîrsîyar kî ne?

Ev pirseke aktûel û di rojevê de ye. Bersivê dixwaze. Bersiva vê pirsê, divêt bête dan. Pir tiştî, ji derekê û pê de, pêşeroj û wêbeya me girêdayê bersiva vê pirsê ye.

Sal 1991 e. Ev du sed sal in, li welatê me berxwedan û bergirî heye. Li dora 70 salî ye ku Kurdistan ji hev hatiye xistin. Parçekirin, bûye mehkûmî statuya îro. Van 15-16 salên dawî, em bûne şahid û çavdêrên çend trajedî û boblatêne bê nimûne. Hem jî li pey hev... Li ku? Li perçe xwedî

tecrûbe, xwedî derbasbûneke dûr û dirêj.

Şikestina '75'ê, şoreşa çardeşsalî hilwşand. Mîna noka ku li kevir keve, bela bû. Gelê me, li Başûr derbeke xedar û kuşinde xwar. Paş re tirajediya Helebçê hat. Gund û bajarêne Kurdistanê hatin wêrankirin û kavilkirin. Hêzîn çekdarî belawela bûn û penaberiyekî girseyî jî li kul û elemêne bindestiya kurdan zêde bû. Tirajediya sisiyan hîna girantir û gelhêjentir hat. Di mehîn Adarê û Nîsanê de, gelê kurd li Başûr ji qurm de hilbû û pişta xwe da warêne bav û kalan û hawîrdor terqiya. Belê, sê tirajedî di 15-16 salan de... Li dû hev û ber bi ya dawî de, yek ji ya din xwêna-wîtit, gelqirkirtir û kuşindetir...

Dîsan ev pirs: Berpirsiyar kî ne? Kî ne berpirsiyarêne vî hesabê giran û vê tawanbariya mezin? Ci ne hoy û mercen van tirajediyan û van serpêhatiyên malkambax? Li kîjan aliyê cîhanê, xwîna kîjan neteweyî ev çend hatiye rijandin û neteweyekî ev çend xwînbê-nirx, kêmîbiha û bêxwedî heye? Berpirsiyarê vî tiştî û vê ecêbê divêt hebin. Eger hene divêt bi-hêne destnîsankirin. Di zemanê Komara Mahabadê de, paş komara Mehabadê li Rojhilat û Başûren Kurdistanê çend keys û derfetên dîrokî peyda bûn, da ku kurd jî rola xwe bilîzin û qedera

xwe bigirin destêن xwe. Ji ber çi ev keys û fersend ber nadîn û vala têن û diçin? Rabûna milyonan pişî ketina Şahê Ecemistanê (Îranê) û Raperîn û Serîhildana Adara 1991'ê li seranserê Başûrê Kurdistanê li bajarêن Silêmaniye, Zaxo, Dihok û Kerkûkê, Hewlêr û Xaneqînê çîma bê encam dimînin û çîma derbasî qanaxeke serkeftîtir nabin?

Kî ne berpirsiyar? Gelê serîhildêr, yan jî serokatiyên hevxebatkar?

Gelo kert û derecaya zordarî û kurdkujiya rejîma Baxdayê bi se-re xwe tenê dikare bibe sedema sivikkirina gunehê rîber û go-vendgêrên otonomîzmê?

Na...Em bawer nakin. Dagîrkeriya tirk ne kêmî dagirkerî û zordariya ereb û faris e. Ji wan xwênakirina gelê kurd, neteweyê kurd e. Nasnekirin û înkarkirina realîteya Kurdistanê ye. Nexweşî li vir dest pê dike û kaniya şikes-tin û binketinan ji vir bi xwedî dibe. Siyaset û îdeolojiya li dijî serxwebûnê, înkara xwe bi xwe ye. Çewt e. Bi hedef û amancêñ rizgariya neteweyî re li hev nake.

Dijminên Kurdistanê gişt xedar û xwînrêj in û ne ferqa nav wan e ya ku bêgavî û bêçareti anîye û enerjî û berxwedana dehsalan bê encam hiştiye. Sedemêñ din he-ne. Kurmê darê ji darê ye û kurm bi xwe divêt bête naskirin.

Li Bakura Kurdistanê serokatiya siyasi, serokatiya şoreşê ji aliye temen de xurtir û nuhtir e. Belê li vî perçê welatê me qev-zêñ mezin û gavêñ dîrokî hene. Ev cudahiyeck e. Ev cudahî demî, perçeyî ye yan jî encam û berê stratejiyeke cihê û serokayetiyeke cihê ye.

Her kurdekî hişyar, kurdê rewşenbîr divêt van pirsan ji xwe û ji dora xwe bike û ji bo bersivandina wan gelê kurd han bide. İro li welatê me bi dirêjahiya têkoşan û berxwedana dehsal û pazdesalan du şaxê stratejikî û du şêwe serokayeti hatine pê. Stratejî û serokatiyê otonomîxwaz û stratejî û serokatiya serxwebûnxwaz... Stratejî û serokatiya navçeparêz û otonomîst li başûr û stratejî û sero-

katiya serxwebûnxwaz û Kurdistanî li Bakur... Ya yekemîn di hebûna cebhe û rîberiya başûr de û ya duhemîn jî di hebûna Partiya Karkerê Kurdistanê-PKK de bi laş û gewde bûne.

Şikestinêñ li pey hev, xelekêñ trajediyan zerazengî li Başûr û pêşketin û serketinêñ li Bakur, rasterasta van herdû stratejî û van herdu awe serokatiyan têkildar dike. Ji şikestinan jî û serketinan jî serokayeti siyaset û mêjiyê serokayetiyan berpirsiyar in. Berpirsiyarî xwediyêñ xwe dinase. Xwedî ji berpirsiyariyêñ xwe nikarin birevin. Rev ne çare ye. Navçegêrî û otonomîxwazî li dijî serxwebûnê ye. Dijayetî û dijim-nayetiya serxwebûnê jî bivênevê nasnekirina gelê kurd, neteweyê kurd e. Nasnekirin û înkarkirina realîteya Kurdistanê ye. Nexweşî li vir dest pê dike û kaniya şikes-tin û binketinan ji vir bi xwedî dibe. Siyaset û îdeolojiya li dijî serxwebûnê, înkara xwe bi xwe ye. Çewt e. Bi hedef û amancêñ rizgariya neteweyî re li hev nake.

Pirêñ nava xwe û dewleta serdest nikare hilweşîne û di xebata xwe de nikare ji dil û can be. Ev stratejî ji serî de seqet û xwefelckir e. Xwenîvrêbîn e. Xweqeydkir û xwexwur e. Nikare bipêşkeve. Şexsiyetqels e. Mirovêñ mezin nikare derxe û rola serxwebûn û azadkirina gel û welat ji binî nikare bilize. Ne bi gel re ye. Li dijî gel e. Di çarçiva îzîn û mu-saeda dewletêñ dagîrker û împenalîstî de siyasetê dike û radibe û rûdînê. Ne serbixwe ye. Nikare serbixwe be. Mêjîkevn û ne hemdem e. Siyaseta serxwebûnê û rizgariya neteweyî rîkxirawêñ serbixwe, şexsiyetêñ xurt û serbixwe û serokêñ modern û serdemîñ dixwaze. Yek ji van jî, li ba otonomîxwazî û herêmperestiyê nîn e. Nikare pêkbê û hebe. Em dê di çend xalan de li ser çend xisletêñ binereti yêñ otonomîz-mê rawestin. Nekirkêrî, kurtbînî û neşarezayıya wê munqaşe bikin û hinekî jî bi kurtî piratîka siyaseta otonomîstiyê bi bîr bînin.

## Ji awira partî û serokayetiyyê pirsa otonomiyê

Bê rîkxirawbûyîn, organîzene bûyîn û bê planbûyîn, ji problemen me yên herî mezin in. Pirsa neteweyî û mafê neteweyekî sihmîlyonî, pirseke mezin e û bê rîkxirawekî neteweyî nikare çareser bibe. Kîlîta pirsêñ mezin û serdemâ me, girêkîn dîrokî, gelşen navneteweyî partiyek xwurt e. Gelşa rîkxirawî gelşike merkezî ye û bê partiyek merkezî tu netewe naghêñ mafêñ xwe. Siyaset û stratejiya otonomîzmê, nikare rîkxirawêñ neteweyî ava bike û avakirina rîkxirawêñ neteweyî bi hedef û programa otonomîzmê re nagunce.

Kadro û serokayetiyyê iro, karmend û serokêñ dewleta sibehêne. Otonomîzm li dijî dewletê ye, anku ji bo dewleteke kurdî kar nake. Pirsêñ xwe dixwaze di çarçewa dewleta serdest de derman bike û ji ber vê jî, ji bo avakirina partiyek xwurt û xwedî otorîte xwe naêşîne û bê hewil e. Bi peyvîñ din; ototnomîzm ne xwedî teoriyeke rîkxirawî ye û bêteorîbûyîna otonomîzmê di vê eniyê de, ji her alî bêhtir dixwuye.

Ji awira serokayetiyyê jî mêjiyê otonomîxwazî ne serdemî û modern e. Serokayetiyyê otonomîst li Başûrê Kurdistanê dirêjayî û dewamîn serokayetiya zemanê Barzanî, serokayetiya 11'ye Îlonê ne. Serokayetiya 11'ê Îlonê serokayetiyeke kavnar û tradîsyonel e. li vir malbatparêzî û navçeparêzî giran û xwirt e. Ü du otorîte hene. Li alîyekî otorîteya tradîsyonel ku pişta xwe dide hiyerarşıya kevnar û emirmende û li aliyê din otorîteyeke cûreyî (şiklî) û perdeyî ku otorîteya partiyê ye. Otorîta bingehîn (esasî) li vir, otorîteya tradîsyonel û malbatperest (ailecî) ye. Otorîteya partiyê nîn e.

Partî çekê neteweyî û yekîtiya

neteweyî ye, bikêrtirîn çek e. Çe-kê otorîta modern e û divêt bibe mezintirîn otorîte. Bê partiyekê xwurt, eşîretqevêz, mezheb û he-rêmderbaskir, welatgir û hemdem yekîtiya gel nikare pêk bê. Otorîten malbatî, eşîrtî û mezhebî rî-lêgirîn yekîtiyeke zexim û neteweyî ne. Yekîtiya neteweyî nikare li ser esasê xwurtkirina deshelat û sulteyên kevnar bête pê. Hilweşandin û jihevxitina wan dixwaze. Heger peyv û fermanên sero-keşirekî yan jî malbatmezinekî di ser ya partî re bête girtin, li wir otorîta partî çênebûye. Hebe jî cûreyî û derewîn e. Ji bo nimûne; heger peyva lawê serokê partiyê di ser her otorîteya organên partiyê re bête girtin, partî ne partî ye û otorîteya neteweyî hîç jî nîn e. Li derên wilo jî partî nabe otorîte. Gel li dorê nacive û hi-yerarıya kevn jî çu carî naşike û ranabe. Heta îradeya gel û partiyekê welatgir û serdemî nebe, otorîteya yekemîn û heta malbat-parêz û malbatperest bi navê gel qise bikin, welatparêziyeke xwurt nikare pêk bê û îrada neteweyî xwe nikare îspat bike. Welatparêziyeke xwurt partiyekê welat-hembêzker û otorîteyeke serdemî dixwaze. Li Başûra Kurdistanê otorîten navçêger û herêmparêz çêbûn û otrîteyên wilo jî nikarin bibin motora welatparêziyeke hemdem û netewerizgarker.

## Ji awira kesanî pirsa otonomîxwaziyê

Pirsa neteweyî bi awayekî jî pirseke şexsiyetê ye. Pirs, pirsa kesaniya bindest ji bindestiyê rizgar bibe û netewe qedera xwe bi xwe bigre destêن xwe. Ev dil û cewhera pirsê ye. Bindestî û kol-letî kesaniya gerdenazad dikuje. Kesaniya gerdenazad seqet û şeht dike û mîna zirxekî ji pola lê tê hev, nahêle bi pêşkeve. Cenga azadî û serxwebûnê ji awirekê jî cenga nav du şêwê kesaniyan e:

Li aliye kî şexsiyeta dîlgirtî, serîtewêner û canxulam û li ali-

yê din kesaniya nuh, serîhildêr û rizgarîxwaz... Li aliye kî şexsiyeta malbathez, herêmprest û tewkelî û li aliye din kesaniya xort, neteweyî û bi disiplîn... Li aliye kî şexsiyeta tirale, xewar û çavşikenandî û li aliye din kesaniya cansivik, guhmiç û mîrxas.... Şexsiyeta rizgarîxwaz di nav têkoşan û berxwedaneke piralî de kevir bi kevir ava dibe, gav bi gav li welêt digere. Çeberê bindestgirtin û şexsiyetkujujiyê tîne xwarê û di aliye fikrî, ramyarî (sî-yasî), leşkerî û rîkxistinî de serxwebûna xwe berz û bilind dike. Bê bahweriyeke bi serxwebûna temam û herâlî, bi xwe û gelê xwe, şexsiyeta hemdem û xwerizgarker nayê pê. Xwe nagire û rengekî neteweyî nastîne. Di vê eniyê de otonomîzm û bavikperest bê teorî ne û ne xwedî dîti-neke ilmî û rast in. Her jî ber vê yekê jî otonomîxwaz û alahil-girên mîjiyê otonomîzmê nikarin kesaniya mezin û têkuz (kamil) derxin. Kesaniyên otonomîstî şexsiyetên biçük, qels, nîvrê û ne serbixwe ne. Her weha stratejiya otonomizmê û bavmezinahiyê, nikare bibe hoste û çêkroxê (ava-kirê) kesaniyeke nuh û zemanê me. Şexsiyeta otonomîstî dirêjayî û dewama şexsiyetsa kevnar, birîndar û serînizmkir e. Ev şexsiyet sînorêن dijmin dinase. Têkiliya xwe ji dewletê qut nake. Çavek li pêş û yek li paş e. Pirên nav xwe û çînên deshelatdar nayîne xwar û bi serxwebûnê ne bahwer e. Li serxwebûnê mîna xewnekê dinêre û dijminayetiya rîkxirawêن serxwebûnxwaz dike. Di nav sînorêن dewleta dagirkir de li pişk û para xwe digere û cîhê kursiya xwe dixwaze. Entrese û berjewendêن xwe yê lok-al di ser her tiştî û di ser her nîrxê neteweyî û yekîtiya neteweyî re digre. Bi hesanî û bêdudilî dikare şoreşger û xebatkarêن perçen din yê Kurdistanê bifroşe, bikuje û bike diyarî û xelat ji dewletêن Kurdistanparêeker û dagîrker re. Ev şexsiyet lawê kîlîka hazir e. Sibe nafikire, dirû, bêmo-

ral û bê prensib e. Bi gelê xwe ne bahwer e. Çavn li derveye, li gora rewşê, carina ji aliye da-gîrkerê hundir yê parçê xwe û carna jî ji aliye dagîrker û kolonyalistên parçen din tête birêvebirin. Ji derve finanse dibe û bi alîkariya perên kirêt û jehirdar dijî û li ser piyan dimîne.

Xweffinansekirin ji bo ramyariyeke serbixwe û kesaniyeke serbilind û henîvekirî, mercekî bine-retî ye. Gişt siyasetên otonomistî malbatevîndar, ji derekê ji derve xwedî dîbin û ne bi derefetên (îmkanîn) xwe, xwe finanse dikin. Şexsiyeta otonomîstî û otonomîxwazan amadeyê her cûre xwenizimkirin û xweriswakirinê ye. Ji her awe lîsk û pêlîstînê re amade ye û ji himbêzekê dikeve yeka din. Carina bi hev re dikeve çend himbêzan û ji bo parastina berjewendêن xwe yê şexsî, xanedanî û malbatî tiştê ku nikare bike nîne.

## Ji awira şerê çekdarî pirsa otonomîxwaziyê

Welatê me bi darê zorê û devê tifingê hatiye bindestkirin û kole hiştin. Em di nav zor û çavşoriyê de ji diya xwe dîbin, dijîn û diçin gorê. Dagîrker û talankarêن welatê me, ne mîna çu dagîrker û kolonyalistên ku Kurdistanê parce kirine, mercenâs (prensibnenas) û serxweçûyi ne. Em bi zor û zordariyeke organizekirî, çekdar û xwînrej re li hevber hev in. Zor û zordariya li ser me bêyî zor ranabe. Zora li ser me bêyî zor naşikê. Jiyana me, jiyana gelên Rojhilata Navîn û gişt guhertin û bûyerên sala 1991'ê, vê diyar û îspat dikin. Pêzanîn (tecrûbe) û serpêhatiyêni gişt netewêن bindest jî li her aliye cîhanê, vê dibêjin: Teoriya zorê heye. Teoriya li hevberî zorê xebitandina zorê û rahiştina çekê heye. Dijmin bi çek tête ser me. Em'ê jî bi çekê, xwe biparêzin û herine ser dijmin. Ev e rastiya îro heye li cîhana me. Siyasetvan û

siyasetçêkroxên otonomîzmê bê teorî û bê siyaset in. Bê teorîbûn û bêsiyasetbûn ji her aliyê wan dirijê. Weke her alî, di aliyê şerê çekdarî jî de, ne xwedî dîtineke rûniştî û zanistî (ilmî) ne. Ev e bi kêmanî 30 sal in li Başûrê Kurdistanê şerê çekdarî heye. Sal têñ û diherin. Vala û bê ber... Ev 30 sal nebû pêzanîn, formûle nebû û di pirtûkekê (kitabekê) de be jî, nehate civandin. Otonomîzm naxwaze û nikare pêzanîna şerê çekdarî bicivîne, bike zexîre û hêz ji cîl û nifşen dahatî re... Li dijî belgekirin û bi wesîqekirina pêzanîna xwe ye. Ji xwe pişkul e. Bi gelê xwe re nerast e û ji derve komande dibe. Hem şer dike, xwîna pêşmerge û lawêñ me mîna lehiyê dirêjîne û hem jî ev şer bêencam e. Dibêje: Şerê çekdarî me nagihîne derekê. Otonomîzm teqîniye, di nav rewşike bê-hêvî û bêperspektîv de xwe roj bi roj qirêjtir û riswatir dike. Em dê Kurdistan bikin Vietnam di-bêje, belê bi gortina xwe re Kurdistan pêşkêşî Bush û Ozal dike û bi çarlepkan li piyêñ wan diqedime.

Otonomîzm ne mîrxas û şarezayê şerê çekdarî ye. Nikare mîrxas û şareza be. Xwe ji dewletê re amade nake. Bi mebesteke willo derneketiye qada şerê û ji ber vê jî, nirx û qiymetekî nade şerê xwe û xebata xwe. Ne partîk e, xwurt dikare amade bike ku sibehê bibe alternatifâ dewletê û ne jî bibe modern û şervan. Bi dîsîplînî gerillayê avabike, ku sibe roj, paş rizgarkirina welêt û dewletê, van nirxan bi gerdenazadî biparêze. Li gor otonomîzmê; çawa be zû yan jî dereng rûniştin û lihevhatina bi dewleta serdest re heye û dewleta serdest jî ji xwe xwedî artêş û dewlet e. dudewletî û duarteşî jî ne ji tiştêñ maqlû e! Otonomîzm nikare û nake armanc ji xwe re general û serbazan perwerde bike. Generalêñ dewleta kolonyalîst hene! Generalî ji bo tirk, fars û ereban e. Bi tenê li wan diçe. Ev e mîjî û hizra (fikra) otonomîzmê.

Pêzanîna wela-têñ bindest bervajê vê ye. Şerê çakdarî dibe dibistan û xwendengeha artêşa pêşerojê û komûtanêñ gerilla jî generalêñ dewleta sibehê... Siyasetêñ otonomîstî ne ji bo siberojeke wilo şer dikin.

### Ji awira piratîka 30 salêñ derbasbûyî siyaseta otonomîzmê

Tête gotin ku awêne û mirêka mirov piratîk û karê mirov e. Em ji vî alî û ji vê awirê jî hinekî li kar û kirêñ otonomîzmê binêrin. Siyaseta otonomîstî bi salan û dehsalan li Kurdistanê û nemaze li Başûrê Kurdistanê siyaseta rasler û xwedî gotin bû. Di piratikê de ji sala 1963'ye û vir de otonomîzm heta sala 1975'ê ji aliyê serokatiyeke bi tenê û partiyeke bi tenê hate niwandin (temsîlkirin). Paş sala 1976'ê derz û terk li otonomîzma yekpartayetî û yekserokayetî dikeve û otonomîzmên bîçuktir, çendserokayetî û çend partayetî têne pê. Di zemanê yekserokayetî û yekpartiyê de jî û di dewra çendserokayetî û çendpartiyetiyê de jî, siyasetêñ otonomîstî bê alternatifêñ dijber bûn û otonomîzm xeta bi tenê û bi şerê xwe bû. Baş e, di van çend salan de ji sala 1960 û heta bi sala 1991'ê, anku 30 salêñ temam, serokatiyeñ otonomîstî çi kirin, çi dan gel û em ji ku gihadîn ku? Çi li me zêde kirin û em bi çend gavan bi pêş xistin?

Rewşa me li Başûrê Kurdistanê berî bi 30 salî di zemanê A. Kerîm Qasim û berî wî di zemanê Nûrî Seîd de ji ya ûro ne xerabitir û bê keystir bû. Di salêñ dawî de heger em dev ji yên kevntir berdin, siyaset û stratejiyêñ otonomîstî tiştekî baş nedane, nekirine û nanîne pê. Belê bi sedan zerar dane gelê kurd û laşê gelê me tev kirine birîn û nexweşî. Birîn û nexweşiyêñ willo ku dê bi dehsalan neyêne ra-pêçan û dermankirin. otonomîzm û piratîka malbatparêziyê, li dij-

warî û serêşanê me ku ber û encama parçebûyina welatê me ne, hejimarek dijwariyê din jî zêdekirin û heta ûro otonomîzm ne ji bo netewa me, belê ji bo dagirkeñ welatê me bûye alîkar! Li çar dijmin û bavkuştiyêñ me yekî din zêde bû. Ew jî mantalîte û mîjîyê qirêj yê otonomîzmê û navçeprestiyê ye. Otonomîzm û navçegêrî malkambax û malwêran e. Mîjîtevlîhevker, armancwindaker, xapînok, derewîn û enerjixwur e. Tişte malbatperest û bavikparêzan hanînê serê kurdan, Enwer Paşayê osmanî ne hanî serê Ermenan. Gelek ji welatparêz û niştimanperweren welatê me bi vê rastiyê nizanîn, yan jî di nav zulm û zordariya dewletêñ dagîrker de hê wext nedîtine li ser vê rastiyê bi awayê pêwîst bihizirin. Siyaseta otonomîzwaziyê û xanedanîpere-stiyê ji şikestinê, penabertiyê û derbederiye, trajedî û felaketan pê ve tiştek nehanî û ji ûro û pê de jî nikare bîne.

Nav gelê me û serokatiyeñ otonomîstî û herêmperestî vebûye, xelk mane li aliye kî û ew li aliye kî din... Nav wan û gelê me vebûye û gel naxwaze wan bibîne. Otonomîzm û parçeparêzî baş hatiye naskirin. Kî ne û ci ne baş tête dîtin. Gel li alternatifâ xwe, ji bo xwe û kesaniya xwe digere. Alternatif û bedêla otonomîzmê heye. Ew jî serxwebûnxwazî û azadîxwaziya tevayıya neteweyî û civakî ye. Her kurdê hez ji welatê xwe dike, li ber xwîn û xwêdana xwe dikeve, bi tirajedî û boblatêñ welatê xwe dêşê û naxwaze carêke din qirkirin û derbederiya gelê xwe bibîne divêt li hevberî otonomîzmê û parçeparêziyê bi xurtî raweste û bibe şervanekî riya azadî û serxwebûnê. Serxwebûnxwaziyê li Kurdistanê serî hildaye û li Bakur bûye hêrs, nifrîn, fûrîn, lehî û aşîta li dijî zilm û zordariya sed salan.

Otonomîzm bêcarietî û binke-tin e, serxwebûnxwazî, çarebînî, rizgarî û serketin e.

# Çend gotin li ser navan û navlêkirinê

Mahmut Önder

**D**i rêzmanê de nav; bêjeyên ku ji bo naskirin û bangkirina tiştan û cisman têne lêkîrin dibine nav. Navlêkirin jî, danîna bêjeyên nav ji bo tiştan û cisman bixwe ye. Yanî livbaziya nav bi xwe ye. Dîroka nav gelekkîn e, hindek pispor û zimanzan li ser dîroka nav weha dibêjin: Nav, bi kîmasî qasî dîroka, hebûna mirov kevin. Dema ku mirovên kevin dest bi axafînê kirine, wê demê nav jî derketiye holê. mirovên berê nav bêwate(mane) bi kar tanîn, lê demeka pêşve, yanî demek derbas dibe êdî mirovên berê li gorî eşîr, qebîle, çiya, newal û hwd. navan li xwe dañin. Bi derketina navên hindek eşîr û êlan re, paşnav jî derdikeve. Paşnav êdî dibe sedemek ji bo naskirina mirovên, ku ji çi eşîr û êlê ne. Wek em dizanin li Kurdistanê û li hindek weletân cîhanê, paşnavên mirovan li gorî eşîren kevn û li gorî bapîr an jî dapîren xwe têne naskirin. Di navbera mirovên berê de, ji bo nav tu carî nexweşî an jî şer derneketiye. Lê mixabin! Pişti derketina dagîrkeriyê û olan, ji bo guhartina nav û paşnavan gelek şer û kirinê hov

pêk hatine û hîna jî pêktîn. Berî derketina olan mirovên berê, nav li gorî eşîr, qebîle, bapîr û herêmê ku lê dijiyan li xwe dikirin. Her weha mirovek ger biçûna herêm û navçeyeke biyanî bi nav û paşnavên xwe dihate naskirin, ku ji çi eşîr û ji kîjan herêmê ye. Di vê demê de, di nav mirovên berê de hindek mirovên bi kîrafa, zana, bi hêz û gihîstî jî derdikevin holê. Ev mirov bi kirinên xwe yên qehremanî, kifşa hindek tiştan, hindek kar û perwerdetî yên xwe, dibin sembola çeyîti û xêrê. Û pişti mirina wan jî, ji bo navên wan neyête ji bîrkirin zarokên nû, ku ji dayîka xwe dibûn navên mirovên çê li wan dikirin. Û her weha navên wan mirovên baş û qehreman dibin navên taybetî û weke sembolekê di nav gelê xwe û hindek herêmê cîhanê de.

Pişti derketina olan, paşverûtî û kevneperestî jî hêdî hêdî diyar dibe, berpirsiyare her olê di dema xwe de dixwaze navan li gorî olan û mirovan cuda bike û mirovan li gorî olan bide naskirin. Weke em dizanin bingeha olan bi tevayî li Rojhilata navîn an jî li Hindistanê û

Çînê hatiye avêtin. Li Rojhilata dûr ola pûtperesî, Bûdîzm pêşve diçe û di nav gelê Rojhilata dûr de xurt dibe, di dil û mejiyên mirovên wê herêmê de cihekî girîng digre. Lê guhertinek pir hindik li ser navên Hind û Çînî çêdiye. Bi derketina ola Mûsa, ku niha Yahudî (Cuhû) lê xwedî derdikevin, paşverûtî û hovîti jî xwe nîşan dide. Benî Israîl (zaroyên Israîlê) ji bo xurtkirina ola Hz. Mûsa gelekkî li ser navan mijûl dibin û dibêje her kesê bibe Cuhû pêwîst e, navên xwe jî li gora zaroyên Israîlê biguherîne. Berî Hz. Mûsa, Hz. Dawûd jiyaye, lê zaroyên Israîlê navên dema Hz. Dawûd hêdî, hêdî jî holê radikin û naxwazin navên mirovên, ku di dema ola Hz. Davûd de berpirsiyare kirine, bi kar bînin. Lê bi tevayî jî, nikaribûne ji holê rakin. Lewma di pirtûka Hz. Mûsa Tewrat, ku dibêjin Xwedê ji Hz. Mûsa re şandiye, navên dema Hz. Davûd jî hene, û nikaribûne ku berî Hz. Mûsa navên ku li hindek navce û herêman hatine lêkîrin ji holê rakin.

Ev rastiyeketiyare, ku navên eşîr, qebîle û gelên Rojhilata navîn, ne weke hevûdu bin jî, ji hevûdu ne pir dûrîn jî, ev guhertin û cudabuyîna pir kêm jî, ji rûçikê olan de bûye.

Pişti zayîna Hz. İsa ji dayîka xwe û di şanzdeh saliya xwe de dest bi rêxistina olekî herî fireh û mezin dike, berpirsiyare xwe dişîne her der û dorê cîhanê, ku bizanibe, di wê demê de piraniya mirovan li kuderê hene. Hz. İsa li ser navên mirovan pirsan dermaxe û tinaziyan na-ke. Lewma di Încîlê de, ku ev kitêb jî, li ser gotine ji hêla Xwedê de ji Hz. İsa re hatiye şiyandin nivîsandiye, ku ji “çî eşîr, êl, reng, ol û bi çi navî dibî bibe” bi tenê bi min û bi yezdanê min ê dilovan (Xwedê) bawer bike, bese. Bi rastû jî, ola Hz. İsa di demekî kurt de, di nav gelên cîhanê de belav dibe û ji hêla piraniya gelên cîhanê de tête pejirandin. Berî olên Hz. Dawûd, Hz. Mûsa û Hz. İsa gelekkî olên hûr û cuda hebûne, lê van olên mezin ne hîştine, ku ev olên hûr û cuda weke pûtperestiyê, bawerkirina bi daran, çiyayan, çeman, agir, roj, hîv û dewaran pêşve biçe. Hz. İsa navê mirovên, her olî û mileti di dema pêş de pejirandin, di dû re hêdî hêdî gelên ku bi Xristiyanîye (filehiye) bawer kirine navên xwe li gorî ola Hz. İsa guhertine.

Lê ev guhertin, ji binî ve û di demeke kurt de nebûye. Her çî gelên ku xiristyanî pejirandine, li gorî zar û zimanê xwe nav bi rêt kirine. Hikariya cùdabûyîna zimanen ristikî mezin li ser ne-wekheviya navan çêbûye.

Berî zayîna Îsa bi çar hezar salan, ku di wê demê de Hz. Davûd û Hz. Mûsa jiyan, ew dem bi xwe destpêka civaka koletiyê ye, rist û hîkariya olan li ser koleyan jî pir çêbûye. Ew dema koletiyê heta sedsala dehan piştî zayîna Îsa dom dike. Di dema koletiyê de xwediyê koleyan navê koleyan jî diguhertin. Ev mîrên wê demê ji hêlekê ve xwediyê koleyan bûn, û ji hêla din ve, berpirsiyaren olan bûn, ji ber ku bê destûra mîr an jî serokê herêmêkî, olperest û nûnerên pêxemberan nikaribûn derbasî wê herêmê bibin. Lewma pêxemberen wê demê û nûnerên wan, berpirsiyariya olan didan seresîr û xwedikoleyan, ku karibin li wê navce û herêmê xebata xwe ya olî bimeşînin. Di dema civaka koletiyê de, xwedikole, çawa bi nanûzikê kole dixebitandin, wusa jî, hemû mafêن koleyan di desten xwe de digirtin. Xwedikoleyan li gorî dilên xwe navê koleyan du-guherandin. Carna jî, nav li wan nedikirin û bi dengên, nizimkirinê, piçûkxistinê wek How! Herow! bang li wan dikirin. Her çende, ev bêje yêne baş di zimanê Kurdi de heye, zêdetir di zimanen din de jî hene.

Di dema civaka koletiyê de gel, qebîle û êlên xîzan, jiyanekê pir dijwar, bi keser û bi jan wergirtine. Dema civaka koletiyê bi xwe, dema feodalîyê avakiriye, û di wê demê de hinek eşîrên Ewrûpî û yên herêmên din, bûne xwedî mal û erden fireh û mezin, wek lorden Brîtanî û axa û mîrên herêmên din. Divê demê de gelên Îranî, ku ew (ecem û fars, efganî, kurd, asûrî, pencabî û ermêni) têne naskirin, bi tevayî, ji olên cuda cuda bûn, gelên ereb û afrikî jî weke milleten din baweriya wan guhertî bû. Baweriya ereban bi pûtan, ku bi desten xwe çedikirin hebû, yên Afriqiyen bi daran û çeman, bi çiyan û heywanen dijwar weke (Şer, Piling) bawerî dikirin. Gelê Hindistanê bawerî bi çeman û masiyen mezin weke (Balîna) û bi heywanen kedikirî weke (Çelek û Nogin) dihanîn. Ji rojhilatê Hindistanê heta Erebistanê, ku di ve navberê de hindek qebile û eşîr di-

jiyan wan jî bawerî bi pûtan û çeman dihanîn. Gel û qebileyen Îranî û Mezra Botan (Mêzopotamiya) jî baweriya xwe bi rojê, agir û ciyayan dihanîn. Her qebile, eşîr, êl û gel bi olekî bawer diki-rin, û navê olan jî ne weke hevûdu bûn. Navê ola Kurdish Zerdeş-Zerdoşt bû û bawerî bi agir û rojê dihanîn. Navê pirtûka wan jî Aveste bûye.

Di dema civaka koletiyê de ola Hz. Îsa bi taybetî li Ewrûpa û li hindek der û dorêن Rojhilata dûr û di nav eşîra û qebileyen Rusiya kevin de xurt bûye. Posideyên ola Hz. Îsa di nav eşîr û qebileyen Rojhilata navîn de kêm bû, derî çend gel û qebileyen weke ermeniyen û çend qebileyen ereban û asûriyan, tu gel û qebileyen ola Hz. Îsa nepejirandin, lê di nav zaroyen Israîlî de ola Hz. Mûsa herî xurt û bi hêzbû û baweriye girêdayî û fanatîk hebû, ew bewerî û girêda-na bi ola Hz. Mûsa ve, di demekî şunda bû siyonîzm. (Zaroyen Israîlî ger li ku, û li kijan herêmê jiyan bibin, ew der axa wan û welatê wan e.) Hîkariya ola Hz. Mûsa li ser navan gelek çêbû, her ci qebile û eşîr, ku ola Cuhûyan bi pejiranda-na, pêwîst bû navê xwe jî biguherin. Ev qanûnen di ola Cuhûtiyê de di ola Hz. Îsa de tune bûn, an jî hesanî bûye, lê di wê demê de ew lorden ku li Birîtaniya û Ewrûpa derdiketin nêcîra koleyan, bi taybetî diçûn Afrîka û bi qesleyan miro-vân xîzan û bê parastin, bi darê kotekê werdigirtin, ew dikirin kole û navê wan jî li gorî dilên xwe lê dikirin. Ew nav guhertin di nava gel, qebile û eşîrên Rojhilata navîn de ne pir bi zorê bûye, piçek ji herêmên din bi hesanît bûye. Navê mirovân Rojhilata navîn li gorî eşîr, gel û qebileyen cure cure rêt bûye. Li gorî mîtolojîyê nav û paşnaven ereban berî zayîna Hz. Îsa bi hezar salî vir de hebûye. mirovân ji qebile û êlên ereban, paşnaven xwe bi navê bav, bavpîr û kAlîkîn xwe bi kar anîne. Di dema berê de mirovân ereb paşnaven xwe tu carî bi navê dayîk, dapîr an jî bi navê jinek ji eşîren xwe bi kar ne anîne. Ji ber ku berî ola Hz. Mihemed, di nav ereban de bi çavekî pir piçûk û nizim li keç û jinan dihate nêrîn, lewra li ba hindek qebileyen ereban zarokek, ku nû ji dayîka xwe dibû, eger keçik bûna, him dayîk û him jî zarokê nûh bûyî bi saxî dikirine gorê. Ev kevneşop (adet) di nav

qebileyen Kurdish de tune bûye. Li hemberî navê dayîk, dapîr an jî navê jinekî, ku di eşîrê de jiya be weke paşnav bi kar dihanîn. Lê piştî ku Kurd ola Hz. Mihemed pejirandin, navê herdu cinsan, mîrên kal û jinêن pîr, weke paşnav li xwe dikirin. Em dikarin çend nimûneyan li ser nav û paşnaven ereban diyar bikin, wek (Ibnil Qasim, Ibnil Ehmed-kurê Qasim û kurê Ehmed) lê di nav hindek qebileyen ereban de bav, ku lawikek wî bi tenê buyîna ew bav, bi navê lawen xwe jî dihate bangkirin û naskirin, weke (Ebu Mihemed û Ebu Cemal - bavê Mihemed û bavê Cemal). Berî ola Hz. Mihemed navê ereban bi piranî weke (Ehmed, Mistefa, Ebdullah, Qasim û hwd.) bûye. Piştî ku piraniya qebileyen ereban ola Hz. Mihemed İslamiyetê pejirandin, ku mirov dikare bêje İslamiyet bi xwe ola Erebane: Navê xwe neguhertine. Qebî-la Hz. Mihemed, ku bi navê Qureyşîyan dihate naskirin, berî qebileyen din yên ereban İslamiyet pejirandine û ji bo rêxistina wê gelekî xebîfîne, û bi ser jî ketine. Di demeke kurt de ola Hz. Mihemed di qebileyen ereban de bi gelem-perî tête pejirandin û her weha navên ereban dibin navê misilmaniyê. Bi rasûne wusaye navê wek (Ehmed, Ebdullah, Qasim) erebîne, ne yên misilmaniyê ne. Ji ber ku çend kêmnetew û netew li Rojhilata navîn hene, ku navê wan erebîne, lê ne ji ola Hz. Mihemed in, weke (Lubnan).

Di sedsala şesan, piştî zayînê de, ku Hz. Mihemed dest bi karûbarêن ola İslâmî dike, navê Kurdish bi tevayî, ji navê erebî cudane, û ji dûr û nêzik tu dirûvê navê Kurdish bi navê ereban nakeve. Pêşnaven Kurdish jî ne wek yên erebane. Berî ku qebileyen Kurd bi darê zorê ola Hz. Mihemed bi pejirînin, navê wan weke Cemşîd, Kawa, Nemird, Xûsrew, Goman, Xerzo, Talo, Terho yên mîranin, Mencê, Kejê, Berze, Desra, Dewrê û hwd. navê jinan bûne. Û paşnaven Kurdish jî ne weke yên ereban bûn, paşnaven Kurdish ji wek Talo yê Besê, Ferho yê Xanê, Cemşîde Beza, Soroyê Egît yên mîran, Sinem a Kewê, Gewra Dirêj, Menca Qolo û hwd. yên jinan bûne. Di nav eşîr û qebileyen Kurdish de paşnav, ji bo naskirina mirovan ku ji ci eşîre û ji kijan herêmî

dihate bikaranîn. Ji hêlekî din ve paşnavên Kurdan bi tenê ne bi navê dayîk, dapîran jî bav û bapîran bûne, paşnavên Kurdan bi taybetî, bi navê dapîr û bi kîrhatiyêن xwe nav werdigirtin. Huner-mend û hostayek Kurd eger mîr û jin be, bi hostayetî û bi hunermendîtiya xwe paşnavêن xwe kifş dikir. Berî pejirandina Kurdan bi ola Hz. Mihemed, paşnavêن xwe bi piranî bi navê makî-dayîkî dihat danîn, lê pişî ku İslamiyetî weke olekî ji xwe re pejirandin, navêن wan jî weke epaşnavêن wan hatin guhertin.

Gelê kurd ji bo guhertina navêن xwe pir lêdan, îşkence û qirkirin derbas kiriye. Hêrişen ola Hz. Mihemed yêن pêşî li ser Kurdan bûne. Ji firehkirina ola Hz. Mihemed, xelîfeyên İslâmî gelek hêrişen dijwar birine ser gelê faris û Kurdan. Bê hejmar mirovên jin, mîr, zarok, kal û ciwan kuştine. Ev ecêb û sosreta herî bi keser li serê faris, belûc, afganî û pencabiyâن jî hatiye, lê qirkirin û talankirina herî mezin bi serê gelên Kurdan û farisan hatiye. Di dema xelîfetiya Hz. Emer de hêrişen herî dijwar û hov pêk hatine. Hz. Emer wek serfermandarê leşkerên İslâmî heta navçeya Hezo (Qozlix) hatiye û bîryar û emrê wî yêن yekemîn jî; ser kîjan dar û kevirî navê Zerdûst û Zerdûstî hebe, wî darî ji kokê jêkin û wî kevirî bişkînin.

Derî evan kirinan, ji hêlekî din, bi sedan jinêن Kurd dîl digirtin û dibirin bajarê Bexdayê û li Bexdayê, mîrên ereban û jinêن Kurdan di paşila hevûdu de, didane razandin, ku njada Kurdan jî bike esmer weke ereban. Nijad û dirûvên Kurdan di kokên xwe de zerêso-rikin. Gelê Kurd li hember dagîrkerên İslâmî qederê çarsed sal bê rawestan li ber xwe daye, lê gelên Iranê, ku di dema xelîfetiya Hz. Elî de ber bi pejirandina ola Hz. Mihemed kirine. Li navbera Mezra Botan qebileyên Kurd bi tenê mane. Di sala 830'î de, bi serfermandariya leşkerên İslâmî bi navê Silêmanê Bin tewaf, ku niha gora wî weke zi-yaretekê li Diyarbekrê ye, hêrişek pir mezin û dijwar li ser Kurdan tête ajotin û bi hezaran mirov têne kuştin û birîndarkirin. Serfermandarê İslâmî bi navê Slêman bi xwe jî, ji hêla Kurdê Zerdûstî ve tête kuştin, lê hêzên İslâmî di van hêrişen xwe de Amedê zeft dîkin û êdî jê der-nayêن. Ji sala 830'î vir de, qebile û

eşîrên Kurdan êdî curbecur ola Hz. Mihemed dipejîrî-nin û wî ji xwe re dîkin weke olekî nûh. Pişî pejirandina ola İslâmî, êdî navêن Kurdan jî hêdî hêdî dîbin weke navêن erekî û paşnavêن wan ji li gorî paşnavêن erekban têne guheritin.

Em dîkarin bi hesanî bêjin; ku her çar olêن mezin, ola Hz. Davud, Hz. Mûsa, Hz. İsa û Hz. Mihemed ji Rojhilata na-vîn derketine. Ev tiştekî gelekî xuyaye. Lî eme li ser derketina ola wan neskenîn, Ji ber ku mebesta me li ser nav û navlêkirinê ye.

Ev tiş jî bala me pir dikişîne ser xwe, ku navêن mirovên ji van her çar olêن mezin pir nêzîkê hevûdu bûne, lê me gotibû, ku li gorî zimanên xwe her gel û netew navan diguherîne, lewra tip û dengêن her zimanî li gorî xwe rîzbûye û di axaftinê de bi cih bûye. Lî em dîkarin bêjin; berî kapîtalîzmê, ku di vê demê de netew û netewekarî ava bûye navêن mirovên ji her çar olêن mezin pir nêzîkê hevûdu bûne. Em dîkarin çend mînakên navan li vir diyar bikin: **Adem: Adam, İsa: Jesus - Krîstus, Dawud: Davîd, Hawa: Eva, Mûsa: Moses.** Ev mînakên me ji bo navêن mirovan dibêt, ne ji bo navêن tiştan.

Di dema feodalîzmê de; qebîle, eşîr û êlîn ku ji njadekî ne, hêdî hêdî ber bi hevûdu ve têن û di dema kapîtalîzmê de dîbin netew. Em li ser avabûyîna netewan û rewşa wan nikarin di vê nivîsê de tiştekî bêjin, ji ber ku ew, derî mebesta me ye. Lî em dîkarin bêjin, ku gelê Kurd ji dema buhûrî ya dirêj heta niha, navêن xwe yêن netewî parastine. Di bin ewqas zilm û qirkirinê de, çawan çanda xwe parastiye, wusa li navêن xwe jî xwedî derketiye û gihadine vê demê.

Pişî derketina netewan, hîkarî û posî-deyên netewekariyê jî gelek li ser nav û navlêkirinê çêbûye. Her neteweyekî dest bi navdanêن xwe yêن netewî kirine û gelek netew di şerîn xwe yêن rizgariyê de navêن qehreman û şehîdên xwe ji xwe re kirine sembla navêن netewî. Weke gel ekî bindest gelê Kurd li dijî xerakirin û hindakirina navêن xwe ji zorîyen herî mezin re derbas bûye, ku pişî pejirandina ola İslâmî navêن bi Kurdî bûbûn navêن şermiyê û di dûre tirkêن ku ji hêla Mogol hatin bûne misliman, bi taybetî pişî impiratoriya Osmanî, ku şopa xelî-

fetiya ola İslâmî didomandin û xwe kirin berpirsiyarêن ola İslâmî, gelek listokan li ser nav û navdanên Kurdan çêkirin. Ji bo xerakirin û windakirina navên Kurdan fermanên taybetî derxistin, ji hêlek dinê jî, navên Kurdî li keran, kûçikan, li hespan û li heywanêن kedîkirî û hwd. di-kirin.

Belê, Çawa ku gelê Kurd, çand, pişê û hebûna xwe heta îroj domandiye û para-stiye, wê ji îro pêve jî, bê westan biparêze. Ev parastin û têkoşîna rizgariya netewî bûye kul û êsek mezin di dilê di-jinîn Kurdistanê de. Lî nabe, ku mirov bêje bi lêkirina navên Kurdî, wê gelê Kurd bîghêje armanca xwe û nav wê şoreşê çêke û gelê Kurdistanê, bi lêkirina navêن netewî wê serbixwe û azad bibe. Ev maf bi tenê mafekî morovaû û azadiyê ye. Eger ku mirov karibe her navî bi hesanî lêke jî, ku ew nav bi xwe bîranînekî û rîçekî nayne bîra me, bi karanîna wan navan em nagîhîn armanca xwe ya serxwebûnê. Navên welat, serxwebûn, azadî, rizgarî her çûqasî şêrin bin ji, grîng e ku gel-ekî bindest weke gelê Kurd van bêjeyen xweş û şêrin bi tenê li nav û navlêkirinê nehêlin. Gelek qehremanê me hene, ku ji bo gîhiştina aramanca van bêjeyen bi navî, canên xwe yêن ciwan û şêrin bê tirs û bê hempa fida kirine. Û di ser navêن wan jî, ne ji van navêن Kurdî ne. Ji hêlekî din ve, wusa xayîn û sîxur jî hene, ku navêن wan bi Kurdî ne û şal û şapik jî li wan in, her wusa jî fedî nakin û li hemberê gelê Kurdistanê şer dîkin û xwîna Kur-dan dirêjînin.

Em dîkarin bi kurtî bêjin, nav û navdanêن perçeyekî ji mafêن mirovî û azadiyê ye. Nav û navlêkirin her kesê, ku bixwaze li gorî dilên xwe û li gorî rewşa netewa xwe bi kar bîne, xwestineke me ya ji dil û can e.

Lê ji bo gel-ekî bindest weke gelê Kurdistanê, pir nav hene, ku em wan ji bîr nekin û wan ji xwe re bikine sembla zanebûnê û serxwebûnê. Weke navêن Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Ezdin Şêr, Seîd Riza, Hakkî Karer, Mazlum Doxan, Ferhat, Hayrî, Kemal û Egît.

Girîng e, ku em navêن şehîdên Kurdistanê ji bîr nekin. Weha ji girîngtir e, ku em şop û rîçea wan hîn bikin, biparêzin û bişopînin.

# Mîr Celadet Bedirxan û hînbûn

Mîr Celadet Emîn Ali Bedirxan têkoşerekî bê westan bû, hem jî rewşenbirekî Kurdê, yê jêhatî bû. Vi rewşenbîrê hêja piştî tevgera rizgarixwaz û rewşenbîriya Kurdî di 15'ê Gulana sala 1932'an de bingêhê Elfabêya bi Kurdî latînî berhevkir û di nav rûpelên kovara xwe "HAWAR" de belavkir, pêre jî xwest ku kal û pîr, keç û xorhînî xwendin û nîvisandina zimanê Kurdî bibin.

Zimanzanê bilind di omid û ramanên xwe de, pir dûrditî bû, ew yê pêşîn bû di nav Kurdish de ku li ser warê hînbûna gelê Kurd rawestiya bû û mijûl bibû. Piştî nemirê çak Ehmedê Xanî, Çîko wî ramanên xwe tevde dixebeitandin û digivaştin di wê dema tarî û reş de ku Kurdistan têre dibuhîrî, di sala 1932'an de.

Ta roja iro em kesekî berbiçav nabinin ku daye ser şopa wî, pêde dimeşe û rahiştiye wî barê giran ku wî bi tena xwe rahiştibûyê. Zendî jiyana xwe bi tîrş û talî diyarî gelê xwe kir, jêre kir pirek da ku di ser de bibûre, bîghê peravê avê û li ser raweste, ji bona karibe di pêşerojê de jiyana xwe bi serbilindi û serfirazî berdewam bike, di nav xelkên cihanê de.

Wusa her dem û gav di jîn û rewşa gelê xwe da, bi pojîn û ramân bû Xwe didit berpirsyarê miletê Kurd û zimanê Kurdi. Hînbûna zanîna wî, ji xwe di xwest. Ji ber wî, ji hemû kesan bêtir bîr dibir. Vêca dikir hawar di "HAWAR" a xwe de û digot: "HAWAR dengê zanînê ye, zanîn xwe nasîne, xwenasîn ji me re riya felat û xweşiyê vedike, herkesê xwe nasdiķe, dikare xwe bide na-sîn..." (1)

Zendî di xwest ku gelê Kurd

xwe bi xwe hev nasbike, da ku karibe xwe ji biyanîyan re bide naskîrin û bi serbilindi xwe şanî gelên cihanê bide. Nemîr, heyîn û naskîrina gelê Kurd bi gelên cihanê re didit ku naçe seri eger ne di riya xwendina zimanê Kurdî de be. Ji ber ew serwext bû, bi jiyana gelê xwe, dizani ku piraniya wî nexwende û nezan e... û tu tiştî li ser xwe nasnake...!? Berê çawan bû, iro di çî hali de maye...!? Çawan wê Kurd karîbin xwe bidin naskîrin ji gelên cihanê re...??

Ji ber van bîrweran zendî hînbûna gel weke nîrekî giran li

ser milên xwe didit, û tu rîber û serwer jê re nediditîn ji xwe pê ve, ji ber pispor û zimanzanê bilind, xweşik xweserîya zimanê Kurdi naskîribû, û bi çend zimanê dî re berhev kiribû, vêca bi dilşewat bang li Kurdish dikir û digot:

"Her ci em Kurd, me zimaneki delal heye û em pê diaxîvin û piraniya me ji vi zimanî pêve bi tu zimanî nizanîn, bi tenê divê em hînî xwendin û nîvisandina zimanê xwe bibin..." (2)

Û xweşik li ser hînbûna gelê xwe diseokinî, nemaze piştî ku elfabêya xwe berhev kir û gelê wî



bû xwedi elfabêyeke xweser, weke gelên cihanê. Vêca wî xwendin û nivîsandin jêre geleki hêsan didit, ji ber dizanî ku piraniya Kurdan, bi zimanê xwe dizanin û pê diaxîvin di malên xwe de. Wiha bi destpêkirnê re wî nav di Kurdan de dida, ew sor dikirin, ew gurr dikirin, da ku xwe bi xwe hev hîni xwendina zimanê bav û kalên xwe bikin.

Ji van çend rêzên jêrî xuyaye ku zendî bê hedan, bi hawar û gazi bû ji bo vê yekê:

*"Qenc bixwîne, rind bala xwe bide birêñ wî, bîrbike, Paş ku te ev xwend û sehkir, nas û hevalên xwe re bide xwendin û ji nexwendan re bi xwe bixwîne û bide zanîn..."*


*Heke te holê kir, bi gotin û pendêñ min ve çûyi, tu xortê min i, xortê gelê xweyî, hêjayî şabaş û pesnî, an na... ji xwe destêñ min ji te dibin..."* (3)

Belê herî daxwaz û armancêñ wî hinbûn bû, hinbûna gelê Kurd bû, ew dijwariyêñ ku didit, ta ku kovara xwe "HAWAR" derdixist, ne ji bo nav û dengê wî bû, an nav û dengê Botan bû. Belê ji bo xatirê deng û gaziya Kurdan bû ku, navê wan ji di nav navê gelan de belav bibe, ji bo ku zanibin gel-ek heye navê wî Kurd e, welatê wî Kurdistan e, zimanê wî Kurdi ye... Bi dirok e û zimanekî wî yê xweser heye, ji heyaman de.

Gava kovara HAWARê hate belavkirin di nav Kurd û biyaniyan de, hingê deng û gaziya Kurdan bû. HAWAR di hawara Kurdan de hatibû...

Lê tiştîki giring ji wê hawarê kêm bû...!? Gerek Kurd bîhatiana hawara "HAWAR"ê, lê sed mi-xabin, Kurd di wê hawarê de ne-hatin û ne li gor dilê xwediyê "HAWAR"ê derketin. Xwediyê "HAWAR"ê bi tena xwe, ma li rastê, tiştê jê di hat dikir û zêde, ji lew ra gazi û hawar dikir û digot:

*"Malxerabno...! ma we ew çend wext nîne, hûn ji bo hinbûna zimanê biyaniyan bi salan ve xebîtine û iro ji di xebitîn... Koro...! Eybe, şerme, fehîte, an hîni zimanê xwe bibin an mebêjin em Kurdin, bê ziman Kurditî ji we re ne ti rûmete, ji mere rûreşike gi-*



rîng e... Heyf û xebînet û hezar mixabin, nemaze ji wan re ku bi zimanên din dizanin bixwînin û binivîsinin û elfabêya zimanê xwe hej nasnakin." (4)

Xem-xwarê gelê Kurd didit ku xwendevanêñ Kovarê kêmîn û yêñ ku hene ji naxebitin, heval û nasêñ li dor xwe hîni xwendin û zanînê nakin. Li gor dilê wî, tevî bêtîri carekê ji wan re digot û di biland, û her û her şanî wan di-da, ku heyîna miletê Kurd di zimanê wî de ye û serxwebûn bi hinbûn û zanê tê amadekirin û tu kesî mafê xwe nestandiye bê zanîn. Sehkin bê Mîrê Zirav çi dibêje:

*"Bavo! Li cihanê ji me kêmîr kes nemaye, heçî gel tevde bûne dewlet û hikûmet, xwedan kitêb*

û dibistan, bi tenê gelê Kurd bi şûnde mane, reben, feqîr, nezan, belengaz, di destê xelkê de lihis-tok... Ji lewre divêt em ji bixebitin. Gelê xwe hîni xwendin û nivîsandinê bikin, wî miletê be-lengaz ji tariyê xelas bikin. Berê wî bidin tav û ronahiyê" (5)

Nemir, tekûzkirina zimanê Kurdi, ne tenê bi riya kovarêñ xwe didit dirist, belê wî çend riyêñ xebatê yêñ dî ji şanî gelê xwe di-da, hem ji bo hinbûna zimanê Kurdi, hemjî ji bo zargotina bav û kalan bidin hev, û bê dijwari bi ser hinbûna zimanê xwe ve ve-bin, ew zargotina weke: Stran, çî-rok, serpêhatî, hwd. Bê ku bêñ guhertin di guhestina rûpelan de...

## Emîre Rewşen Bedirxan kiye?

Emîre Rewşen Bedirxan jina "Kebaniya" Mîr Celadet Bedirxan e. Ji rexê bav ve ew: Rewşen a Salhê Mehmûdê Salihê (birayê Bedirxan Paşa) yê, bi nav û deng. Ji rexê dê ve ew dibe: Rewşena Samya Bediriyê Mîr Bedirxan Paşa.

Di roja yazdehê Tirmehê de, sala 1909'an de li bajarê Qeyserê hatiye ser riwê jînê. Tenê çar sal ji biçûkanîya xwe li Stanbolê bû-randine. Peyre malbatâ Bedirxanîyan bi tevayı ji Tirkîyê hatine sûrgûnkirin (Mîşxetkirin) di salan 1913'an de.

Hingê gelek ji Bedirxanîyan daketin Sûrî-Mîsr û Libnanê. Ba-vê Rewşen li Şamê bi cî û mal bû, di taxa Salihiyê de. Hingê

Emîre Rewşen dest bi xwendinê kir, di dibistana Elteraqî de. Peyre sê salan li mamoştexanê xwend. Di sala 1925'an de bû mamoşte di qûnaxa seretayê de, ya erebî û pêre du salan tirkî xwend û hinbûn, sala sisîyan îngilîzî xwend, sala çaran û pêncan firansî ta ku xwendina zimanân kutakir û bû mamoşteyê ziman li Jordon. Sê sal li Jordon qedandin. Piştre vege riya Sûrî bajarê Şamê, di sala 1928'e de û karê xwe yê mamoşteyê berdewamkir ta sala 1935'e û pêve ta sala 1964'an bû berpirsyara (Mûdire) dibistanê. Lê sala 1964'ê ew ve-gerandin mamoşteyê, hingê ew ji bi temenê xwe mezin bibû rabû (teqahîd) stand û li mala xwe

rûnişt.

Di vê navberê de du caran dizewice, cara pêşin sala 1929'ê ta 1931'ê, lê vê zewacê berdawam nekir, tenê keçek jê ma navê wê Useymaye, niha jina Zihêrê Eli-axa Zilfo ye li Qehîre rûdinê.

Cara didiwan di sala 1935'ê de zewcî û bi kefxweş û serfiraz pê, çîko rastî kurapê diya xwe bibû. Diyar e ku ew Mîr Celadet Bedirxan bû, hingê nû Mîr Celadet ji Elmania û şoreşa Agîrî hatibû Şamê, lê bi cî û mal bibû. Dû zarok ji wan re çêbûne, ya pêşin keç e, navê wê Sînem Xan e, ji endezyarekî xelkê Zaxo zewiciye (niha li Baxdadê dimîne). Yê di diwan kur e, navê wi Cemşîd e, didawiya sala 1969'an de çêbû. Niha li Elmania, doktore, yeke elmanî ji xwe re aniye, kur û keçek wî hene, navê kurê wî Kurdo ye, navê keça wî Evin e.

Berdevama jiyana Emire Rewşen û Mîr Celadet di gelek çetinî û dijwariyan re hatiye buhirtin. Xaniyê wan bi kirê bû ta roja iro. Tiştê ku ji kovara HAWAR û Ronahî dihate destên wan, jiyana xwe ya abûri pê diqedandin, teví ku dewletên weke: Fransa, Íran, Jordon û Tirkan dixwestin alikariyê bi wan bikin, lê wan alikariya wan qebûl nekir...

Bi büyera ku Mirê Miran, Rewşenbir û rojnamevanê hêja pê çû ber dilovanya xwedê di roja 15'ê Tirmehê de sala 1951'an, Emîre Rewşen ma dil bi êş û xemgîn, vêca di sala 1972'ê de mala xwe barkir bajarê Banyas, li ser derya sipî... Pişti ku Sînemxan zewicand û Cemşîd şand Elemania xwendinê li ser hesabê xwe, û ta roja iro li Banyas dimîne bi tena xwe tenê. Pire-jinek pêre ye alikariya wê dike di mal de.

Jî karê ku emîre rewşen pêk anîne, û pê mijûl bûne:

1- ji sala 1925-1926'an dij Fransa sekintîye û ji bo doza Erebi xebitiye, bi taybetî ji bo Sûri.

2- Di kovara Minêrva ya Li binanî dê gotar dinivîsandin bi berdewamî.

3- Ji sala 1927-1973'an gotar dinivîsandin ji kovara Elhûriye re ya Yûsif Melek.

4- Di navbera salên 1958-1959'an de çîrokê zarakan di radiyo ya Sûri de di gotin.



5- Çar pirtûk wergerandine ji tirkî bo erebî, sisê ji wan çapbûne û yek destnîvis e.

6- Ji Nîvîsarêne wê sala 1954'ê pirtûkek çapkîr bi navê "Cend rûpel ji wêjeya Kurdi" bi taybetî ji bo biranîna Mîr Celadet Bedirxan bû.

7- Sala 1990'i pirtûkek Mîr Celadet wergerand zimanê erebî bi navê "Namek ji Mostefa Kemal Paşa re" Li Beyrûtê çap kir.

8- Sala 1990'i careke di pirtûkek Mîr Celadet Bedirxan çapkîr bi Alikariya Dilawer Zengî.

9- Sala 1990'i pirtûkek giranbiha ya Mîr Celadet çapkîr ew ji bi Alikariya Dilawer Zengî di bin navê "Girametika Zimanê Kurdi".

10- Sala 1957'an niwênera gelê Kurd bû di kongreya Anti-kolonializim de. Jê pêve tu kesê Kurd tinebûn li Yunan ê. Wê bi tena xwe her şes kursiyên ku navê Kurdistanê li ser danibûn bi saw û heybeta xwe dagirtin û doza gelê Kurd di wê kongera ku li Yunanê hatibû damezirandin kir teví ku gelekan çav reşî avetiñê û henekê xwe pêkirin ji dijmînên gelê Kurd lê wê li berxweda û doza gelê xwe eşkere kir bê ku guh li wan kesan bike...

Her weki hatiye zanîn ku Be-

dirxanî di diroka tevgera Kurdi de cîhekî pir bilind û buha girtinne. Çî di warê xebat û bizava netewî de be û ci di warê wêje û rewşenbîriya Kurdi de be.

Rewşen Bedirxan tê naskirin bi navê Yadê, ji ber ku xwedan hesteke Kurdiyyê û pir dilovan û dilsoz e. Di rengê xwe de weke dirivên rengê jinêne Ewrûpiye, nêrîna çavên wê weke nêrîna Piling tûj û dijwarin. Dema ku mirov cara yekemin pêre rûdine hestek e bi tirs dikeve nava çergê wi de. Mezinahî di riwê Yadê de geleki diyar e, lê dema ku di peyive mirov dixwaze her dem û gav pêre rûne û guhdariya diroka Bedirxanîyan bibihize, hem ji serpêhatiyêni jiyana Kurdistanê û welatparêzen Kurd bibhîze...

22. 08. 1991

Banyas

1- Celadet Bedirxan, HAWAR- jîmar: 1, rûp:1, sal 1932 Şam.

2- Celadet Bedirxan, HAWAR- jîmar:40, sal: 1942 Şam.


3- Celadet Bedirxan, HAWAR- jîmar: 18, rûp: 1, sal: 1933 Şam.

4- Celadet Bedirxan, HAWAR- jîmar: 27, sal: 1941 Şam.

5- Celadet Bedirxan, Roja Nû- jîmar: 1, sal: 1943 Beyrût-Libnan.

# Xebati PeKeKe

Ehmed Dilzar



Dujmin eger faşist bû  
Xwênrêj û terorist bû  
  
Qet be nerm û niyanî  
Be kirdewey însanî  
  
Hezar car killî bada  
Mafî reway gel nada  
  
Çakey lê helnawerê  
Peyman nabate serê  
  
Debê be zebri xebat  
Be xwêni xortêñ welat  
  
Derî bikey le xakit  
Le kuştin nebê bakit  
  
Inca niha PeKeKe  
Çek be dest e û xoy çek e!  
  
Boye karî dirust e  
Dij teror-terorist e  
  
Ger wa neka bê guman  
Dujminî tuxmî însan  
  
Çon der dece le meydan?  
Be cê dêle Kurdistan?  
  
Ca debêjim: PeKeKe  
Toley sedan sal veke  
  
Ser kewê xebati to  
Her payedar bê APO!

01.08.1991  
Stockholm

## Simfoniyek ji awazê floklorî

Mohamed Çelki

1

Lolo..lolo  
Lo, lawiko  
Çi payîz e  
Li xopana deşta Dibâne  
baran e û  
Li serkêñ jorî befrê girtin  
Çiya û kîze.  
Teyr û tilûr çûne lîse  
ma nizanî?  
Der û cîran dilxirab in  
Dê tu were  
Hêj bi devê wan  
Ne bûm pîse.  
Sing û berê min kiçkokê...  
Baxekê nûgehiştî ye  
Tu biramûse  
Evê çendê  
Li benda te me  
Bes hinda be  
Li min bêkes e

2

Kiçkê dînê  
Bejina te ji takê Rîhan û  
Nêrgizê  
Cwan û rind û dilmezê  
Ser xatira te  
Ez ê bûme "Emê Gozê"  
Bisteh binve  
Hindi bimînim li serê çîya  
kes ne şêtin  
Destî bînit gerdena te û  
li hinarakên rûyê te  
Bigrit gazê.

3

Lolo..lolo  
Lo lawiko  
Şev dirêj in  
Min xew nayê  
Hindi xuhdan  
Postal û şefqa bibînim  
Sergiran dibim  
Dikevime  
herama vê germetayê  
ma nizanî?  
Çend xilîzin  
Her bîstanê sera biçin  
Jin kerba da  
Li Biharê gîya nayê.

4

Kiçkê dînê  
Tu çend bêjî wevetir e  
Lê her gelîyê vêhelbiçin  
"Bazyan"<sup>(1)</sup> û "Hirora"<sup>(2)</sup> a  
kûr e

Yan ji wan ve  
ber girelkirina "Bêxêre"<sup>(3)</sup>  
Sîavka Rûviya dibînîn  
Ji ber dihelên  
Ya ji wan ve...  
Ka ci şêr e.

5

Lolo.. Lolo  
Lo..Lawiko  
hindî dibînim  
Li ser çeqen  
her darekê  
bi dengê melûl  
yê di xwînit teyrê konde.  
Kolkê me kengê lawiko...  
dê bit xanî?  
li me ava bit kavlegund e.  
Tu bî zava û  
li bîstanê jêriya gundi  
Zerî û esmer  
bikin govend e  
zêmar û behîyên warî  
bine şahî û zemawend e.

6

Kiçkê dînê ..  
destê min dê  
li ser gefta "Birrno" wê bit  
şikefto rizde  
mala min bit  
ta kolkê me  
dibite xanî!  
bêne govenda min û te  
tev xwîyanî  
tu baş bizane  
Zêmar û behîyên warî  
Li şûne bi gîrin  
Şahî û kenî  
Tu baş bizane  
Rûbar hemî  
berf lêjin  
hemî jêhelî binişîvin  
çîroka vîna min û te  
nûdastana vê çerxê ye û  
hogirên me dê pê bêjin.  
dê pê bêjin.

### Tebîni:

1. Bazyan: Ew derbend e ya "Şex Mahmode Berzençî" şer li hemberi dagirkeren Ingiliz kîrtî.

2. Hiror: Navê gundekî ye dikevîte herêma Berwari Bala pêşmergeyên Kurdistanê li sala 1976'ê sereke giran le kiribû, zîyaneka mezin gi-hande dagirkeran.

3. Bexer: Ciyaye bexere ye. Kurdan şere mîran e li dijî hêzîn "Gezenfor" li kirtb û ber ji şere ciyayı bi ser leşkeri da, ger dikkîr.

## Hevpeyvînek bi Serokê ERNK Abdullah ÖCALAN re

**"Ger em bixwazin zimanê Kurdi pêşve bibin, pêwîst e em azadiya siyasî ya Kurdan pêşve bibin."**

### Xwendevanên hêja


Ev hevpeyvîn di rojnameya "Serxwebûn"ê hejmara 115'an, Tîrmeh 1991'ê de bi zimanê Tirkî hatiye weşandin.

Ev hevpeyvîn, gelek aliyên çand û hunerê zelal dike. Rola ziman û çandê di Tevgera Rizgariya Netewa Kurdistanê de, dide nîşandan. Lewma jî me pêwîst dît ku, vê hevpeyvînê bi zimanê Kurdi bîghînin hemû xwendevanên xwe yên dilsoz.

Rewşen

**Pirs:** Bi pirsa ziman dixwazim dest pê bikim. Kurdi, nêzî 70'ê sal e, ku li Tirkîye qedexe ye. Tesîrên vê qedexekirinê li ser gelê Kurd heye. Ji bilî vê jî, ev tesîr li ser zimanê Kurdi bi xwe heye. Yanî mîna dewlêmendbûna, geşbûna, şûnmayîna, ger mumkun nebe paşketina zimanekî... Mîna hundabûna ûşeyan, bi dijwarî rewş, hêdî hêdî derxistina rîzîkên gelempîrî yên ziman... Vêga ji wan her du aliyan; yekemîn tesîrên li ser gelê Kurd, duwemîn tesîrên li ser ziman bi xwe, hûn ci difikirin?

**A. ÖCALAN:** Gotina, serbestî yan jî azadî ji bo ziman di nav xwe de hinek bêmaneyî û sefseteyî jî di-hewîne. Dêvla azadî bo ziman, rastiya azadî ji bo gel-ekî vê pirsê hê bêtir zelal dike. Azadiya ziman, ji gel cuda! Gel bindest, zimanê wî azad! Ev paradoksek e. Li ser gel her zordestiyên kolekirî bimeşîne, lê bêje zimanê te azad e. Hê di ser vê de jî pergalbûna ziman ji bo xwandin û nivîsandin, perwerdegînî qedexe, lê axaftin serbest be. Ev sefseteyeke hê



mezintir e. Çawa zarok bi diya xwe re, şivanê serê çiyan bi pezên xwe re, li ser bingeha derxistina hin dengan hevdu fam dikan, Kurdi jî wisa dikare bê axiftin, lê di pêşaniyan de nikare bê axiftin. Ev sefseteyek hê jî mezintir e. Tirkîye, bi van dubeşîyan, çawa pirsa azadî li dev û rûyê xwe diherimîne û bi gotina azadî ya bilind çawa dilîze, datîne holê. Ji vê

yekê jî em wê "serbestî" yê cidî nagirin. Berf her tişî, eger zimanê gel-ekî hebe, bi wî re jî çand û dîrokeke, ku tê lêvkirin, heye. Ziman bi ekonomî û jiyana civakî ve girêdayî ye. Ekonomî û jiyana civakî hebe, jiyana rîzanî jî dikeve bernameyê. Ev hemû dikevin nav averûya azadî ji bo gel. Ji ber vê yekê jî divê mirov xwe rast nêzîkî averûyan bike û bûyerên mîna

hestî û goşt bi hev girêdayî wisa bin-kêr neke û navêje. Ev weke vê ye: Milekî xwe jêke, bavêje vê pêşiyê û bêje, ev mil gihşîtiye azadiya xwe. Lê ger mil li ser endam be, mana wî heye; wî ji endam jêkirin û azad hîştin, qetilkirin e. Qetandina zimanê Kurdî ji gelê Kurd û serbest hîştina wî ji, qetilkirina gelê Kurd e. Ji ber vê ji, divê pirs bi şiklê azadî ji bo zimanê Kurdî neyê demogojikirin; bi şiklê pirsa azadiya eslî ya gelê Kurd bê girtin û azadiya wî bi her awayî bê perepêskirin. Ziman perga-lekî basît yê bihevaniya wî ye, lê ekonomiya wî, çanda wî, sazendeyên pêşketina civakiyên wî hene. Bê siyaset mana tu azadî nîne. Gotina azadî bi temamî meydana siyasî dihewîne. Berî her tişti azadiya siyasî; mana vê ji, serbestiya bîr û raya siyasî, damezrandin û xebata sazendeyên siyasî bi serbestî di jiyanê de û azadiya têkoşîna siyasî ye. Eger ji gel-ekî ra azadî hebe, bi taybetî wê zimanê wî ji serbest bê hîştin. Bi vî awayî wê çand û zimanê wî bikaribe pêşve biçe. Gotin wilo hêsan bêne danîn, têgîhîstin zor nîne. Divê serê me ji qedexeyên zehar tewrî yên ku Tirkîye bi gelempêrî datîne, tevlîhev nebe. Min ziman serbest hîşt, lê ne ji bo xwendin û nivîsandinê, ne di civînan de, ne ji bo dayreyên dewletê... lê li kûderê? Ev mîna bi peritandina per û bask, korçikî hîştina laş û binêre tu çawa bûyî mirov gotin ê... Ez ber li tiştên têngotin, vedikim.

**Pirs:** *Hûn duwemîn aliyê pirsê çawa zelal dîkin?*

**A. ÖCALAN:** Em bixwazin çand û dîroka gel-ekî bi tevayî bidin ber çavan, berî her tişti divê mirov binêre ew gel bi xwe çiqas nêzîkî azadiya siyasî ye, rola wî ya siyasî ci ye. Li ser vê bingehê, jîndarî û karînêne Kurdî bi jîndarî û karînêne gelê Kurd ve girêdayî ye. Negeşbûna zimanê Kurdî, bi negeşbûna civakî û siyasî ya gelê Kurd ve pir nêz girêdayî ye. Ji ber vê yekê em nikarin tenê bi ziman derkevin rê û tesfîreke mezin li jiyana civakî, siyasî û netewî li gelê Kurd bikin. Rastî ev tê mana awejûgirtina pirsê. Ji bo ku em azadiya siyasî pêkbinin hemû orga-

nê civakî ziman jî têde, wê wezîfêne xwe bibînin. Lêkolînê rastî yên dîrok, yên bêje, yên ziman wê mane biperînin. Lê em pirsê awejû (ber-vajî) bigrin, erebê li pêş hespê girêdin, nikarin xwe ji bin pirsan berjor rakin. Di raberdû (dema derbasbûyî) de, tiştên wilo di tevgerên Kurdî de peyda bûn. Bi şiklê em ziman pêşve dibin, bêjeya Kurdî pêşve dibin, mi-jûliya erebe pêş hespê girêdan pir caran hate dîtin. Em ji pêşveçûnên îroj têdighêjin ku mirov bi vî awayî nikare bigihêje tu armancekê.

Em bi pêwîstiya pêşvebirina ziman û bêje gelekî bawer in. Divê li gor hewcedarî li ser were sekinandin. Lê ev ne herî tiştê pêşîn e. Mirov dora pêsemîn nade vî; azadiya gi-ringîtîn kar e. Li ser vê bingehê PKK azadiya siyasî esas girtiye û azadiya siyasî bi metodê herî balkêşî di jiyanê de bi serketinî pêkaniye. Riya pêşveçûna bêjeya Kurdî firehtir bûye, riya lêkolîn û pêkhatina zimanê Kurdî heta dawiyê vebûye. Wekî din “serbestiya ziman” ji, ji vê xebatê ye. Hê ji vêga ve gelek berhemên bêjeyî derdikevin, ku ev, berhemên vê xebatê ne. Ev hemû ji didin ber çav ku metodê xwe nêzî pirsan kirin ê PKK metodê herî rast dîtinî ye. Heta dema dawî em dibhîsin ku li ser zimanê Kurdî, dîroka Kurdî lêkolîn têngotin. Hemû ev ji teniştberhemên têkoşînen me yên siyasî ne. Mirov rabe û van teniştberheman deyne şûna hedefîn siyasî, ev şâşerêkîn e. Ez pêwîst dibînim van tiştan vekim, ku mirov xwe di rewşa pêş çav de, rast nêzî pirsan bike.

Ez dibêjim, di nav xwe de paşve-mayîn û iflahnebûna gelê Kurd ve girêdayî ye. Gelê Kurd, çiqas paş ketiye û iflah nebûye û paşve hatîye hîştin, rewşa Kurdî ji wisa ye. Divê pirs wilo were danîn û ger em bi rastî bixwazin Kurdî pêşve bibin divê em azadiya siyasî ya Kurdan pêş ve bibin. Em ê vê bidin pêş, zimanê Kurdî bi vê bingehê dikare xwe iflah bike, hemû paşketinîye li paş bihêle, xwe nûh bike, hilberîne, pêşve bikeve. Ez bi vê zor bawer im û yêmîn im, ku riya vî ev e.

**Pirs:** *Serok, vêga, di vê rewşê*

*de, li Amedê ya jî Hekarî enstîtuyeke Kurdî yan jî Sazûmanê Zimanê Kur-dî bê sazkirin ku rast têdighêjim li gor dîtina we Kurdî yan jî çanda Kurdî ne pêş lê paş dixîne, heta...*

**A. ÖCALAN:** Naxêr! Ez pirsê wisa dananim. Em lê neheyirin, ger ev weke teniştberhem peyda bibin. Evna teniştberhemên pêşvetetina şoreşgerî ne. Divê mirov berjewendiy-an jê bigre.

**Pirs:** *Ango mîna çandî...*

**A. ÖCALAN:** Ne tenê li Hekarî û li Amedê. Divê li Stembol û Enquerê ji çêbin. Gelek normal e, şirişti ye. Mîna dibêjim, ev encamên têkoşîna me ya şoreşgerî, siyasî ne, teniştberhemên wê ne, divê ta ji me bê em berjewendiyê jê bigrin.

**Pirs:** *Di rûniştina serê sibê de, we gotibû, ev pêşveçûnan, bi taybetî ji aliyê oportunistan -ez gotina we bi kar tînim- têngotin piştgirîkirin, yan ji, ji aliyê Serok komarê Özal hatîye pêşberîkirin, ku rê li tevgera we ya şoreşgerî bigre yan jî bitixûbîne.*

**A. ÖCALAN:** Bê şik.

**Pirs:** *Vêga gotina otonomiya çandî li holê dizîvîre diçe. Gotina otonomiya çandî we heldiciniqîne, gelo...*

**A. ÖCALAN:** Naxêr, na! Hûn ji me şâş têgîhiştine. Em xwe bi vî şiklî nêzî van gotinan dîkin; eger ev weke reformekê ji bê ramandin, divê mirov nexe ciyê karê bingehîn. Pêşveçûna çand û ziman berhemeye têkoşîna me ye. Îroj mûzîka Kurd, folklo-ra Kurd pêşve diçe û ev bi temamî bi destê têkoşîna me ye. Oportunîstî û rîşaşî li vê derê ye: Ger tu têkoşînê bi “min serbestiya ziman da”, “otonomiya çandî didim” xwe rawestînî, ev rîşaşîn e, û ji xwe ev rîşaşîne e, ku em li dij in. Ev e, ku jêre oportunîstî tê gotin, şewşandin tê gotin, wekî din PKK ne li dijî pêşveçûna çanda azad e. Ev ne xetere ji. Me tu gavî pirs wilo dananiye. PKK ne li dij e, ku Kurdî serbest bê hîştin, em ne li dijî vê ne ji. Ewê em li dij in, ev e: Pirsa Kurdan a bingehê pirsa azadiya siyasî ye. Ev çiqas pêş bikeve, wê Kurdî ji serbest be, çanda wî ji


serbest be. Tevî vî jî “min serbestî da Kurdî, ciyê PKK teng dikim”, “min serbestî da çand, divê PKK jî dev ji pirsên azadiya siyâsî berde” bê gotin, em jî qiyametê radikin. Pirs gelekk zelal e.

**Pirs:** *Tiştê min dixwast fam bikim ev bû.*

**A. ÖCALAN:** Baş li ser were rewestin, tê dîtin, di vê demê de me tiştekî cuda negotiye. Bawer im, tê şewşandin. Bûyerê, ku em dibêjin şewşandî ev e. Bi heter û girîngî tînim ziman, ku ev rast were têgihîştin.

**Pirs:** *Serok, gelê Kurd li nav sînorêñ çar heta pênc dewletan de dijî, yanî Suriye, Ìran, Iraq, Tirkîye û Yekîtiya Sovyet, heta hin welatêñ din jî dikarin lê bêne zêdekîrin. Vêga ya rastî, di nav erdê çar ewletan de yek gel dijî û ev her çar dewletan serdest bi rawêjêñ cuda li hember vî gelî ne. Gelo ev şertêñ cuda di çanda Kurdi de newekheviyêñ girîng derxistiye? Weke Kurden li Suriyê ya li Tirkîye dijîn?*

**A. ÖCALAN:** Bê sik; avahiya dewletan, resmiya bingehîn; civakî, siyâsî heta çandî tesîr li cuda şekilgirtina Kurdan kiriye. Mesala rewşa vê gavê, ku Ìran tê de ye, ifada vê ya ideolojî-siyasî, tesîreke rîkûpêkî li ser Kurdan dike. Lê dîrok û rewşa berçav a Kurden wê derê, têkoşîna wan li ser rewşa wan tesîra rîkûpêk dike. Ev na hemberamberî ne. Çi dewleta, ku girêdayîne û dîrok û çi jî rewşa dîrok û têkoşîna wan bi xwe cuda tewrî rî didin vî tiştî. Ev ji bo her dewletî jî derbas dibe. Mirov dikare rewşa gesbûna her welaşî ya girîng bîne berçav û rewşa Kurdan li her parçê analîz bike û bersiva pîrsa çi ji bo Kurdan pêwîst e, heta programa polîtîk çawa dikare bê guherandin, bide. Em esasî li ser perçeyê Kurdistan ê mezin lêkolîn û lênenînên xwe û wekî din programa polîtîk û metodên xwe yên têkoşerî rîkûpêk dîkin. Ev tesîra xwe bi tund ji kolonyalîzma Tirkîye girtiye. Me got, zilm û zordariya Tirkîye ya sedsalan û dîsa, çand, bêje jiyanâ Tirk ta demokrasiya wî, her tişt xwe li Kurdistan dibirqîne û heta maketê xwe diafiri-



ne. Ev jî kûr û dûr lê hatiye kolîn. Ji ber vê yekê li Kurdistanâ, ku, di bin destê Tirkîye de ye, wê şekilgirtina gelê Kurd bi şekilgirtina Tirk teng girêdayî û di nav hev de be; têkoşîna wî jî, wê ji vê yekê tesîrê bigire. Wê karakterê artêşa Tirk ê sert tesîrê li gerilla bike. Cenga taybetî, ku tê ajo-tin wê tesîra xwe li ser pêşveçûna cenga şoreşgerî şanî bide û ev hemû wê me bidin ser çareserkirneke taybetî ji bo Tirkîye. Pirsên perçeyêñ din jî divê bi awayekî wisa bêne pêşçavkirin.

Kurdîn li wê derê bê guman piçek cihê bûne. Ji bilî ferqêñ nav xwe, bi ser de jî ferqêñ dewletêñ kolonyalîst xistine nav, hene. Ferq ên ziman, devok û heta li hin ciyan ferqêñ çandî xwe pêş kirine. Rastiya, ku Kurdistan li ser keleporeke dewle-mend bîlind bûye, hêjî van ferqan zêde dike. Lê em van hemû, ji bo mafê siyâsî yê gel, li ser bingeha yekîtiya siyâsî pêş ve bibin; ev ferqîyêñ devok, çand û ziman, ferqîyêñ cidarengîn ji bo netewa Kurd, ji xeterê derbas, wê rola xurtbûnê bilîzin. Ji ber vê yekê jî ne tirs, mirov ji bo xurtbûnê bal-

kêşî şanî bide; di vî warî de îmkana demokratîk ji bo xwe ifadekirinê pêk bîne; gesbûna netewbûneke dewle-mend, nav tixûbêñ ziwa nexeniqîne; nebe riya şaş ji bo sedemê zordarî li ser netewe, nekeve nav zordariya herêmî û bi zorê nehelîne; bi taybetî jî mirov tecrubeyêñ welatêñ sosyalîst bi haydarî bigre ber çav û balkêşî bide ser, ku taybetiyêñ netewî pir vebin, ev ferqîyêñ çandî nabin xete-rê, lê dikarin bibin kardestiya dewle-mendî û riya pêşveçûnê. Bi kurtebê-jî, nêzîkbûna siyâsî ya PKK li ser pirperçabûnî û pêşveçûna cudayî ya Kurdistan, li ser vê bingehê, çareserkirina wê jî ta fro aliyê jîr jiyanê ve hatiye rast dîtin û em dikarin vê wisa ifade bikin.

**Pirs:** *Du xal (nuqte) hene, ku ez li ser disekekinim. Ger mirov bi taybetî li çespandina dageriya Osmanî, pişt re jî dageriya Komarê (Tirkîye) binê-re, du bareyêñ girîng têñ xuyakinin. Yek dibistana eşîrî ye. Ya din, ji ali-yekî derwêşxane û qîraq têñ girtin, ji ali-yekî jî dibistanêñ-razangeh ên he-rêmî têñ vekirin. Bawer im, divê mi-*

*rov li girtina qîraq û derwêşxane yan bi çavekî din mîzeke. Gelo em dikarin berê li ser dibistanêñ eşîrî û dibistanêñ razangeh ên herêmî gotû-bêj bikin, ci tîna wan li ser Kurdêñ nav sînorêñ Komara Tirkîyê bûye?*

**A. ÖCALAN:** Ji van dezgehan, a yekemîn di dawîdemêñ împaratoriya Osmanî de bi taybetî ji bo ber li netewşanistiya Kurdan bê girtin û girûpeke bijarte ya Kurd girêdayê Sulatañan were derxistin; ji aliyê Ev-dilhemîd bi kedrijî hatiye pêşberkirin. Dibistanêñ eşîrî yên mîna Hêzên Hemîdiye jî, ji bo zarokêñ serokêñ van eşîran bi împaratorî ve girêde, hatiye pêkanîn. Wan, ji bo hemberî ihtimala pêşvehatina şiyarbûna netewî ya Kurd weke asteng pêkanîn; rewşenbîrekî daqurtandî bi her awayî girêdayê ideolojiya sultaniya Sultan û wisa jî, ji bo hin kesêñ, ku bikarbin li dijî Kurdayatî bêne derxistin, hatiye fikirîn. Bi temamî li dijî netewhilbûna Kurdan asteng bûn û dîsa jî di wê demê de derxistina bijartegrûpek ji Kurd dijî Ermeniyan, armancêñ wan hebûn.

Hin cudabûn têde hebin jî, çawa di dibistanêñ kevin ên Yeniçeri, zarokêñ xiristiyanan di bin perwerdeya Tirk-misilman de dihatin gihîstandin, ji bo bi artêşa navendî dabin yek, berçav e, wisa jî dixwastin zarokêñ Kurdan di van dibistanêñ-razangeh de bibin Tirk û malê netewa Tirk. Ev zarok, ji kaniyêñ xwe yên çandî, ji hawîrdora xwe, ji tifika dê û bavê xwe têne qut kirin; ji dîrok û civakê girêdana wan bi tevayî tê qetandin û ji heft salî pêve bin zalbûna şovenîst a Kemalîzmê têne girtin. Û ji wan mirovan, biyaniyêñ welatê xwe, dîroka xwe, gelê xwe, newseke biyaniyêñ her tişîfî derxistin holê û bêbexitiya Kurdistan a mezin îroj pêşpiyasekirina vê newşê bi navê rewşenbîrî ye. Ya rastî, zêdekirina asîmîlasyonâ ji salêñ '50'ê vir ve, "terora sipî" yan jî ji "mirovkujiya sipî", ji texmînan pir zêde, heta ji mirovkujiyêñ serîhildanan jî zêdetir rastiya Kurd qir kiriye. Evna gelek xeter in. Ya rastî kolonyalîzm piçek jî pal dide van û tê birêvebirin. Qetandina van ji dîrok, bihayêñ netewî, civak û malba-

tîn wan jî, ji bo komara Tirkîyê (T.C) bûye pergalekî herî baş ê gedî kirin û ev tiş şansê xwebirêvebirinê daye wan. Bi mehmangiyek girêdaye, bi jiyanekê sünî girtiye. Gelek hatine girêdan, li ser vê bingehê, goya weke rewşenbîrê gelê xwe jî bêne şanîdan, li gora min tam vajî, ew mîna terora "mirovkujiyêñ sipî" yên komara Tirkîyê derdi Kevin hemberî me û ew kesen herî xeter digrûbînin an jî wilo hatine pêkanîn. Em vê ne tenê ji bo dibistanêñ-razangeh, lê hê jî bi firehî bibin ser hemû sîstema dibistanî. Zarokêñ Kurd ên ku ji sîstema dibistanê derbas dabin, a rastî nîvenîv îxaneta wan bi xwe pê dane kirin, ji rastiya xwe paşpê hatiye xistin, ji gelê xwe, welatê xwe re biyanî û ev grûp dûrîfrast di ajotina zordarî weke pergalekî pêk tê. Li her welatekî heye, lê ev grûp li Kurdistanê gelekî zêde hatiye turewandin. Rola vê grûpê, di pêşveneçûna xarovajîbûna bihayêñ netewî û civakî ji texmînan hê zêdetir e. Bi wan re şerîkî me yê bi tundî bûye. PKK ji aliyekî berhemê têkoşîna van şexsiyeta ye. Em çiqas bikarbin, tehrîbatêñ li ser vê bingehê têñ asîrandin, berkendal bikin, welatparêziyê jî ewqas pêş ve dabin, yekbûn bi gel re, girêdana ji dil bi rûmetên gel re pêktînin. Bi kurtî di derheqê bûyera asîmîle kîrinê de jî dikarim vana diyar bikim.

**Pirs:** *Gava me cara dawiyê bi Yalçın Küçük re hevdu dît, têzeke wî hebû. Digot, Mustafa Kemal gotiye "qîraq û derwêşxanan bigirin" û ew sazendeyêñ hatine girtin parêzciyêñ netewîbûna Kurd bûne, dibêje. Ez dixwazim ev were diyar kirin.*

**A. ÖCALAN:** Ev dikare were gotin: Çawa di dêra Ermeniyan de netewexwaziya Ermeniyan pêş ve çûbe, wê mîna tifika roleke lîstibe, li hemû Balkanê netewxwazî berê li dêrê bingeh girtibe, dibe ku, li Kurdistanê ne tenê di qîraq û derwêşxanan, di medresan de ji derketibe holê. Hin medresen klasikî hene. Di wan medresan de bêjeya Kurd dihat xwandin, berî her tişîfî klasikîn Kurd mîna Mem û Zîn dihat xwandin û Kurdî dihat xwandin û nivîsandin.

Ev jî ci ye? Weke ciyê ronîbûna Kurd e. Evna gelek zû wê bikaribûna netewî-bûna Kurd û demçûyî pêşveçûna diltepîna netewî rê vekin. Çaka ku yekî mîna Señdî Nûrsî jî dikaribû di van medresan de bigije û ta despêka 1900'î netewxwaziya Kurdî bike. Dîsa hemû ewen di sala 1925'ê de têñ bi darvekirin, dikarin di van dibistanan de bigijin. Evna pratîkîn netewexwaziyêñ kevnare ne, yan jî pratîkîn netewexwazî ne, ev sazendeyan. Bê şik, dagîrkeriya Kemalîst rola van di pêşveçûna netewexwaziya Kurd de ferq dike. Bi taybetî di wanêñ, ku sala 1925'ê de têñ darazdan, her hal vê rastiyê doz dike. Wê gavê jî dûrîfrast qedexe dike. Ne ji bo, ku ew sazendeyêñ dînî-paşverûne, ji bo, ku para wan di pêşveçûna netewa Kurd de dibîne, wisa dike. Bê şik, li ser vê bingehê bihabîrîn rastir e. Ma, ku ji sêx Señdî re tê gotin, bi navê dîn, bi navê paşverûti derketiye holê, lê di bin daraza darvekirina wî de pir vekirî "we Kurdistanek dixwast" nebêjin jî bi biryareke wilo bi darve dikan. Bi fena van qedexan, ên xuya "evna sazendeyêñ dîn ên qimenañ paşverûne, em digrin" dibêjin, dixapînîn, lê ya rasîtin ew zanîn, ku ciyê wan di netewhilbûna Kurdan de ci ye, esas ji vê tîrsî jî digrin. Ev temayekî girîng e. Pêwîst e, bi balkêşî lê bê kolîn, ramaneke weha girîng, divê neyê dera-vêtin. Vêga jî gelek mele di van medresan de gihîştine û zanebûna welatparêziyeke zor jîndar girtine ser milêñ xwe. Girêdana xwe bi têkoşîna PKK, di berxwedana Cizîra Botan de gelek baş danîne holê. Meleyêñ ji wan medresan derdi Kevin di pêşveçûna serhildana Cizîra Botan de motorhêz in. Ger ev medresan ta vêga rola xwe geş lîstibana, wê li hemû bajarêñ Kurdistanê mîna Cizîra Botan modelê zor xurt pêş derketiba. Ceribandina Cizîra Botan jî dikare vê têzê bi hêz bike.

**Pirs:** *Di dîroka bêjeyî de românî herî xurt, di nav cengê de yan jî hemâ pişî wê derdi Kevin; di demêñ berxwedanê de, hê ku girêdanêñ mirov bi hev re germ e û dift têne jiyan kîrin... Ji bo huner, bi raveyekî gelek hêsan, ji nûh ve hilberandina*


*jiyana mirov ser warê estetik e, tê gotin. Hûn wek partî demeke dûr û dirêj e, têkoşînekê didin; têkoşna gerîlla, li ser çiya. Ev formeke jiyanê ye. Gelo wê Kurd bikaribin hilberandina vê di warê estetik de, ji nûh ve bi cî bînin? Hûn di vî karî de li kudere ne?*

**A. ÖCALAN:** Na. Hunerê şo-reshgerî li ba me hê dûr e, lê belê di vê bareyê de ev averû dikarin bêne pêş ve birin. Di bingeha hunerê şore-

futûhatên îslamê ve girêdayî ye. Li ser van danûstandin pêwîst nake. Rast e, ku ceng, ji bo derketina berhemên mezin erkeke şitilok dilîze. Ev nayê wê manê, ku hemû berhemên çandî û bêjeyî kedên cengê ne, lê tesfrêن wê yên girîg hene. Eger şer di pêşveçûna gel-ekî de roleke dîrokî, rêkûpêk bilfze, bê guman wê bêjeya wî jî, ne tenê bêjeya şoreshgerî, bi gelempêrî bêjeya wî jî wê bi tesîra vê pişkê derkeve ronahiye.

jeyên mezin ên gel dernayê holê, bêjevaniyê hene jî, zêdetir loriyên, ku jiyana gel a bi êş û pehnbûn tînin ziman. Bi taybetî di mûzîka wî de ev gelek berçav e.

Di nava Kurdan de huner heye, mirov nikare di civakeke bê huner de bifikire. Bê şik huner yek ji kategoriyên bingehîn e, ku jiyanê dixemîline. Civakeke bê huner mîna axekê zûr e, li wê derê qet tişek hêşin nabe, jiyan jî nayê kirin. Paşvemayîna erk,



şgerî de ceng heye. Pêşiyê ceng heye, paşiyê ceng heye, bi hev re girêdayî ne. Gelên cengên bi hêz bijîn, bêjevaniya wan jî bi hêz dibe. Weke, bêjevaniya Fransiz teng bi şoresha Fransiz ve girêdayî ye. Dîsa bêjevaniya mezin a Rûs, bi cengên Çariya Rûsyâ ve girêdayî ye. Bêjevaniya şoresher a Rûs, bi şoresha Cotmehê ve girêdayî ye. Heta bêjevaniya Ereb bi

Cengeke şoresher, netewbûna gel-ekî û azadiya wî ya siyasi pêk bîne, xurû bike, sedised wê bêjeya wî jî xurû bike. Gava em vî tiştî daxînin nav civaka Kurd em vê dibînin: Negeşbûna torevaniya me ya cidî bi nedayîna cengeke gel ve zor nêz girêdayî ye. Di berhemên bêjeyî yên heyî de, em dibînin, piranî, jiyana axa, şêx û serekeşîran têne ziman, bihayên bê-

bi cî ne anîna huner li ba Kurdan, bi paşvemayîn û erk normal ne anîna civaka Kurdan ve girêdayî ye. Zalbûna awayê pir kevnare, encama jiyana gelê Kurd e, ku têde bi firawanî dijî. Ji ber vê jî pirsa bêje û toreyê li ba Kurdan, pirsa cenga şoresherî ye. Şerî şoresherî yê Kurdan çiqas ges bibe, wê bêjeyê wan jî ewqas dest bi gesbûnê bike. Ev tenê derxis-

tina hêjeyiyênuh nîne, wê wan bibe çareserkirina dîrokê ji. Îroj bi xwe ji ferisandin a rastdîtina dîrokê tenê bi ajotina şerê şoreşgerî ve girêdayî bi dest tê girtin. Qet demekê de, bi dest-girtina dîrok û bêjeya Kurdî wek îroj pêwîstî nehatibû berçavkirin. Çima? ji ber ku PKK her roj bi deh hezaran kes gav bi gav nêzî cenga şoreşgerî dike. Piranî gel çiqas nêzî cenga şoreşgerî dîbin, pirsa, "ev kî ne", tê bîr; gelo "dixwazin çawa bijîn", tê bîr. Ev prisna ji re li ber derketina tenışt-pirsên xwe dirêjî dîrok û bêjeyê vedikin. Di dawî encam de mijûliya bêjeyeke şoreşgerî tê meydanê. Lê ev hê pîrsrûkarî hatine holê. Berhemên bêjeya şoreşger ên cidî hê xwe der-nexistine holê. Min di axistinê cûrbecûr de, vîna, weke erkekî girîng ji bo pêşerojê danî holê. Huneriya şoreşger divê bê geşkirin. Pêwîst e, eniya huneriya şoreşger bê afîrandin û bi biryarî ji, ev ne bîriqandineke xurû ya parolên me yên siyasi be. Taybetiya wê heye. Weke li dagêrandina welatên sosyalîst, an ji weke dagêrandina sosyalîzmê ji têgihaya qaliphunerî rûmet neyê dan. Divê weha li taybetiya huner û bi serazadî girtina dest bê birîn. Ez bi heter li ser radiwestim, ku ev bare tewan dixwaze; bi kêmâyî weke cenga leşkerî di wê meşî de ji ceng û xebatê dixwaze. Bi diltepîneke hêz, min xwast li ser bîrawestim, ku mîna encama çalakî ya leşkerî, pêwîstî bi tewan têghiştina encama bêjeyî û heta pêwîstiya çalakî heye. Gelek kes vêga bi vî tiştî radibin. Lî li gor min, piranî dev û çavên xwe dilewitînin. Ji xebata komikeke gerîlla bêtir disiplîn, bêtir xebata peljenî û ked divê. Ev xebateke ne gelek bi vî awayî hatiye bi rî ve birin. Pirsa, bêjeya şoreşgerî wê çawa ges bibe, roj bi roj girîngiya xwe hê zêde daşne holê û li hêviya çareserkirinê disekine. Berhemên dertîn holê, divê mirov bi bihabirîna amatorî bigre, mîna hewes bihesibîne. Mesela komdilopêş şoreşgerî yên PKK hê nav bêjeyî nehatiye bîriqandin. Ez nabêjim çend roman, gelek hejmar roman, bîranîn, civandina çîrok, bîriqandina di mûzîkê de, gav bi gav bi klasîkbêjeyê gel, mûzîk û folklorâ wî ve coşandin, dîtina awa-

yên nuh, bi taybetî di mûzîk û bêjeyê de derxistina awayênuh û ev hemû bi paldayîna komdilopêş bihayêniş mirovatî li Kurdistanê, bi rastiya Rojhilata Navîn û heta bi pîvoka reberdû dayîna berhevî, ger mumkun be, bi vê bingehê û pir orjînal jiyana gelê Kurd, beriqandina pêgirtinêniş jiyaniş bi estetîkî di nav xwe de bihe-wîne û şergerên vî bareyî divê derkevin holê. Lî berhemên di bin navê hunerî de li holê, em nikarin bêjin ew karîkatûr in ji, weke lîs-tik bi hunerî ne; ez dikarim bêjim, ew bi xwe ji lodêniş riziyayî ne. Hunermend zanamîrov e, xwedî zewqê nařîn e, nîrînê wî tûj in, divê bikaribe bi çekê hunera jiyanê rast bike, pêşve bibe. Lî ez bawer im, ewen bi hune-re re mijûl dîbin, mirovîn herî berbeder, rûçikta in, ew kes in, ku gotinêwan nayê famkirin. Ew kes in, ku bi jiyanê tinazê xwe dikin û heta jiyanê ji tinaz derbasbûnê pêkhatî dibînîn; û mixabin ez dibînim bi vî ji weke, ku huner e, bawer in; bi xem-gînî didim berçav, divê bi rexneyeke xurt evna bêne derbas kirin û ji bo bîcîbûna awayê hunerekî milî-tanî, kedrijî bê kirin. Weke min got, bi rastî vêre ji cengeke enî, mîna cenga eniya şoreşger divê. Ka, ku pîrs Kurdistan be, taybetî dixwaze, nařînyê dixwaze, şexsiyetê dixwaze, bexşîna jiyanekî dixwaze. Belê, em dikarim pîrsî tenê di vê çarcivê de deynin.

Carcaran ez vî tiştî ji, ji xwe dipirsim: Fîrsend hebe, ez bikaribim, cenga me ya şoreşger bi kerehî û xwesikî, şaşî û rastiyen wê bîberiqşînîm hunerê. Mesela rewşike dil heye, rewşike jiyanî heye, pir dilkêş, pir tra-jîk û heta pir komîk. Ger em bikaribin ewna bîberiqşînîm cûrbecûr berhemên bêjeyî. Em pêwendiyêniş mirovîtî, yên nuh diafîrînîn, pêşajitiya vî dikim, xwe bi xwe ji bikin, bitorevanînim, dibêjim.

Mesela em kurtî bi orjînalîta Yilmaz Güney re têkiliyê danin; wî xwastiye, vî bîberiqşîne herêma hunerî ya bengîne. Ew wî hînek sehkiriye, bi grîngiya wî têgîhiştîye. Lî dîsa ji gelek amator. Hûn, Yaşar Kemal, dibêjîn; xebitiye, ku Kurdistanê piçekê bitorevîne, bike roman, lî bi gelek

portunîstî. Hêjahatiyêniş Kurd tirkandiye, kiriye malêñ Tîrk, bi vî awayî piçek ji di tevkujî de rol lîstiye; ya rastî goya xwastiye rola nîvîskarekî Kurd bilîze. Dîsa di bûyera mûzîkê de stranbêjîn bi kok ji "Rojhilat", bi tevkujîya lorînê Kurd, xwastine hunerî bikin. Li gora min, ev hemû di bin parêzbaskêniş MIT û de ne. Di eniya huner de wezîfîn kontra bi rî ve dîbin. Hebûna tewanêwan yên hunerî, vê rastiyê naguhîrîne, ji ber ku ya tê qir kirin dawî awayîyen çand û hunera Kurdi ne, ku li piya mane.

Di vê bingehê de ji divê rexne bê ges kirin. Bi grîngî li ser radiwestim, ku em di bin parola "divê em di warê hunerê de dest ji kirinê kontrayî berdin û girêdayê hunera xwe ya şoreşger û welatparêz bîmînîn", xwe bi erkîn xwe ve bipêçînîn. Wilo nêzbûnê van pîrsan girîng e. Kesêni, ku bîxwazin bi van pîrsen bingehîn xwe bêşînîn, divê lêkolîn û lêhûrîn bikin, mumkun be ji bo gihiştina hin berheman, germxwazî pêşçav bikin. Em mîna Partî, di vî warî de, pêwîst e du tiştan pêk bînîn: Berî her tiştî em, ji bo geşbûna bingeha şer, a ku wê huner pal bidiyê beşdariyeke mezin dikin; duwemîn, divê em ew diltapîn, dilxwazî, tevlaiya nuh, ku bi rastî, ji vê gavê aj dide hêdî hêdî derxînîn ro-nahiyê. Lî hunermendêniş afrander nikarin xwe bi vê tenê têr bîbînîn. Ew dikarin van daneyan bingeh bigrin, li gor zagonêniş hunerê yên taybetîk, navce, form û tevlaiyî bi rastiya me biçespînîn û berhemên girîng ên hunerî derxînîn holê. Di vî bareyî de bi piştpalandina pratîkî me gelek kar hene, ku bîn çekirin. Ü bi baweriya min dibêjim, bi vî alî tevlalîyî heta alîkariya partî bi hunerê divê hebe. Girêdanî heye, alîkariji divê gav bi gav bê bi hev anîn. Bi pêwîstî ducar dikim, ku çêbûna eniya hunera şoreşgerî ne paroleyeyeke siyasi ye, bi vê manê ji divê rizgarîxwaz bê tîrs derkevin ronahiyê.

**Pîrs:** Daxwaza min hebû, ku bi taybetî li ser Ahmed Arif û Yilmaz Güney bisekinim. Lî belê we di navbare de hin gotin li ser Yilmaz Güney kir. Jo bo Ahmed Arif...

Dûmahiîk di hejmara 9'an de.

# “Sîstema Cîhanê ya Nuh” û Şoreşa Kurdistanê

Wekî tê zanîn di 05.80.1991'ê de artêşa Tirkâ dagîrker êrîşek bi hemû çekêن xwe yên giran ku ji tank, top... û balafiran saz dibû, bire ser başûrê Kurdistanê. Li gora daxuyaniyê rîjîma Tirk mebesta êrîşê wêrankirina kampêن Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan-ARGK bû, ku guman dikirin bîryargeha ARGK li wan deveran e (li ser sînorê di navbera başûr û bakurê Kurdistanê de). Giranî û hêrsa vê êrîşê xuya dike ku çendî dewleta Tirk li hemberî tevgera rizgariya Kurdistan ke- tiye asteng û aloziyeye bê çare. Edî nema dikare ji pirsgirêkên xwe yên hundîrî û derveyî re çareserkirinê bibîne. Ji lewre mîna gurekî har, bi hemû şeweyê di- ride, heyâ bi çekêن kimî ji ku di gelek êrîşen xwe de bikartîne, bi armanca vemirandina agirê serxwebûn û azadiyê ku li bakurê Kurdistanê mîna pêleke xurt bli- lind dibe, êrîşê dike.

Belê, ordiya (artêşa) Tirk ji bo ku ar- mancêن xwe yên dîrokî pêkbîne, “bakurê Iraqê érdimeke Tirkiyê ye” bi vê diru- meyê başûrê Kurdistanê dagir kir. Gelo, encama wê êrîşâ wan a hovane ci bû? Ne girînge em bersiva vê pirsê bi derfirehî şîrovekin, ji ber ku ji her kesekî re eşkere bû ku, di nava kendalêن wan çiyan de dewleta Tirk çîqas leşker û serleskerên xwe gorî pêşkêş kirin, her weha çend bal- afir ji hatin lêxistin û birîndar ketin. Kind were gotin, ziyanekê diravî û giyanî ya ku nayê ziman dît. Di nava artêşa wan de ji şerekî pîsokoloji peyda bû. Bi dehheza- ran êrîşkirin ku 7 dîlî yên xwe yên ku ARGK di encama êrîşkeke xwe de dîl git- tibûn, rizgar bikin, nekarîn. Pişti êrîşê bi çend rojan seroketiya ARGK destûrê û rî dide rojnamevanan ku hevdîtinan bi leşkerên Tirk ên dîl re çêbikin. Bi vî awahî morala serkevtinê ya leşkerên Tirk şikî û edî hew dikarin xwe li hember gerillayan bilivînin û gava xwe bavêjin.

Êrîşê ziyanekê mezîn gihande gelê me yê li başûrê Kurdistanê. Gund, zevî hatin wêran kirin. Bêhtir ji sed kesî hatine kuştin û bi sedan dev ji gund û malên xwe berdan û bi wan çiyayêن ku gulleba- ran dibûn ketin. Ev livbaziya wêrankirin û qirkirina Kurdên başûrê Kurdistanê li

pêşîya çavêن “Hêzên çalak” ên ku li Sil- opî bi cih bûne, çêbû. Li berçavêن wan hawar û hahoya başûrê Kurdistanê dihat. Li vir pirsek xwe dihavêje holê, gelo ma mayîna van hêzan, ne ji bo parastina Kurdên başûr e? Heke ji bo parastinê ne, çîma bêdeng man?! Ne tenê bêdengî, alikariya artêşa Tirk ji kîrin. Leşkerên ku di encama wê êrîşê de birindar bûbûn, di nexweşxane-yên wan ên leşkerîde hatîbûne derman kîrin... ji gelek aliyan ve alîkariyîn din ên piştigirîye bi wan re kîrin. Wekî ku tê zanîn ji ev hêz bi rengeki fermî ji hêla “Yekîtiya Netewan-UNO” ve ji bo parastina Kurdên başûr hatine bi cîhkîrin. Dilê cîhanê bi Kurdan şewîti, dixwaze wan ji qirkirinan biparêze!

Amerîka vê bêdengiya xwe weha ve- dirêse: “Ev grûpêن Kurdi yên çekdar ku li dijî dewleta Tirk rabûne, terorîstin. Êrîşâ ku artêşa Tirk ji dibe ser wan ji bo para- stina rîjîmê ye. Masê dewleta Tirk heye ku xwe biparêze, ev pirseke hundîrî ye, girêdayî rîjîmê ye, em tevlî nabim...” Di derbarê êrîşâ li ser başûrê Kurdistanê ji, weha dibêje: “Em ne ji bo parastina ter- orîstan in. Ger ku ev êrîş xwe parastin be, dewleta Tirk mafdar e, dikare di her kîliyê de êrîş bike. Em bawer nakin ku dewleta Trik dixwaze bi vê êrîşê qira Kurdan bîne...” USA van ji xwe re dike bahane, çavêن xwe qurç dike û riya hilanîna Kurdan ji dijmin re vedike. Gelo, em ê Kurdan ji êrîşen Saddam biparêzen, lê hema rîjîma Tirk bila şîş bike, ew xwe diparêze... tê ci wateyê? Ci rîjîma Tirk dibe û ci ji rîjîma Iraqê dibe, her du ji dijmin in, her du ji jiyanê ji bo Kurdan nexazin û damezirandina Kurdistanê serbixwe û azad ji bo her duyan ji ziyanekê mezîn e. Heke bi rastî mayîna wan ji bo parastina Kurdan e, divê ji kîjan aliyî ve êrîş hate ser Kurdan, li dijî derkevin. Heke ne weha be ji, naxwe mayîna wan ne parastina gelê me ye, lê parastina dijminen gelê me ye. Di karvaniyê de ev rastî derkete holê.

Dewleta Tirk a faşîst bi van êrîşen xwe dixwaze tola 7 salên raberdû ji ARGK hilîne. Wekî tê zanîn di 15. Te- bâxa 1984'ê de Hêzên Rizgariya Netewa Kurdistan li başûr ji xurt û bîlind dibe.

tan (HRK) ku bûn toven avakirina ARGK, dest bi şerf çekdarî kir û lêdanê geleki xuri û mezîn gihande hêzên artêşa Tirk ên dagîrker. Ji bo ku kîna 7 salan ji nava hinavêن xwe biderîne bi tundeyî êrîş dike. Bê gumane di van êrîşan de tiliya USA ji heye, ku li Rojhilata Navin heval- bendên hev ên herî nêziktir in. Bêdengiya USA ji tê vê wateyê (maneyê) bi xwe.

Vê êrîşâ leşkerî ya li ser başûrê Kurdistanê û bêdengiya împiryalîzma Amerîka, careke din şanî û xuya kir ku herdu bi hemû hêzên xwe yên leşkerî û kone- vanî li dijî damezirandina dewleteke Kur- dî ne. Herdu di gel hevûdin bi vemirandina agirê şoreşa serxwebûn û azadiyê re ne. Her weha îspat dibe ji ku USA çav ji artêşa Tirk re niqand ku êrîşê bibe ser başûr û bomba bike. Destûr da rîjîma Tirk û di pişt ve ji dibêje “ez tevlî pîrsa Tirkiyê ya hundîrî nabim...” Ev ci pir- seke hundîrî ye?! Destûr dide rîjîma Tirk ku gundîn Kurdan bomba bike û li dawiyê dibêje “ev pirseke hundîriye...”

Van pêşveçûnan ber çav kir ku rola Tirkiyê di “Sîstema cîhanê ya nuh” de çîye, ku USA dixwaze wê sîstemê pişti şerê Xelîcê li Rojhilata Navîn bi rî ve bibe. Her weha rîjîma Tirk ji amade ye ku ji vê sîstemê re bibe bingehêka xurt, amade ye ku bi hemû karin û derfetênen xwe vê sîstem stratejîk biparêze û pêşve bibe. USA ji dewletêni Erebî yên mîna Misir, S. Arabistan... pal dide ser rîjîma Tirkiyê. Ji ber gelek sedem û egeran Amerîka vê polîtîka xwe ya stratejîk dimeşîne. Pêsemîn rîjîma Tirkiyê érdi- meke gelekî stratejîk dagîr kiriye. Jo bo Amerîka ew érdim gelekî pêwîst e, lew- ma amade ye ku bi her awahî xwe bi Tir- kiyê ve girîde. Tirkiyê ji ji bo ku rîjîma xwe biparêze, bi her hawî xwe dihavêje hembêza dostê xwe yê stratejîk Amerîka. Ji ber vê yekê ji Misirê bêhtir pêwîstiyê dide Tirkiyê. Berê, dibe ku Misrê ji Amerîka re roleke stratejîki bilîsta, ji ber ku di pîrsa Ereban û Israîlê de germî hebû. Di nava dewletêni Ereb de hinde rîjîmîn radikal hebûn, mahîna wan ji bo Amerîka bîvîtiyek bû. Lî hema niha, mîna berê pîrsa Ereban û Israîlê li ser Amerîka ne bîvîtiyek e, ji bona vê yekê em dikarin bibêjin di Rojhilata Navîn de pîrsa herî girîng û pêwîst pîrsa Kurdan e. Ev pîrs, ji bo Amerîka û ji bo tevâyî cîhanê pîrsa baldanê ye.

Qada herî germ li Rojhilata Navîn ku heya dawiyê nakokî û dubendi têde xurt in, niştimanê Kurdan Kurdistan e. Kur- distan ji di nava sînorêن çar dewletan de ye, ev dewlet ji bo USA pirseke sernivîse ne. Ji lewre bi her awahî dilive ku vê érdimê ji destê xwe bernede. Li aliyekî din Amerîka baş têgihiştiye ku ev şerî li bakurê Kurdistanê li dijî rîjîma Tirk tê meşandin, lêdanekî ji berjewendiyê Amerîka re. Ne tenê li bakurê Kurdistanê, li başûrê Kurdistanê ji lêdanê dix- we. Ji ber ku Tevgera Rizgariya Netewa Kurdistan li başûr ji xurt û bîlind dibe.

Lewma dema ku rêjîma Tirk êrîşê dibe ser Tevgera Rizgariya Netewa Kurdistan, "sistema cîhanê ya nuh" diparêze. Bi vê parastinê jî berjewendiyê Amerika li Rojhilata Navîn diparêze. Ji bo ku vê sistêmê biparêzin jî Amerika amade ye ku çiyayê Kurdistanê gav bi gav bomba bike. Serkevtina şoreşa serxwebûn û azadiya Kurdistanê mirina Amerika ye. Ev pêşveçün diyar dîkin ku di pêşerojê de wê Tirkîye rola natirvanê "Sistema Cîhanê ya Nuh" bilîze. USA rêjîma Tirk ji bo vê armancê hilbijartîye.

Weke ku me li jor dayî xuyakirin, ji ber gelek sedemên sernivîsi û di pêşiyê de Şoreşa di bin seroketiya PKK de, cihê erdîgarî, dewlemendiya binerd û sererd... USA Kurdistan ji xwe re xaka birêvebirina sistêma xwe bilbijartîye. Her weha dema ku Amerika lingê xwe li ser vê qadê bi cih dike, dikare bi hêsanî bîzav û livênu ku li Rojhilata Navîn û derdora wê dîbin têxe bin çavdêri û kontrola xwe.

Hinde armancê Tirkîye yên dîrokî hene, bi vê piştgiriya amerîka dixwaze wan di nava van pêşveçunan de pêkbîne. Rojekê rêjîma Sûriyê bi qutkirina ava Ferêt tehdîd dike, rojekê êrîşê dibe ser başûrê Kurdistanê û rojekê bi şerê sar û germ êrîşî rêjîma Îranê dike. Ev livbaziya rêjîma Tirk xuya dike ku çendî ji bo pêkanîna armancê xwe yên dagîrkeriyê amade ye. Dema ku G. Bush vê dema dawiyê serdanek li Tirkîye da, T. Ozal bi 625 milyon Dolar çekên Amerîki jê xwest, Bush ew daxwaz pêjirand. Kin were gotin, ji bo birêvebirina "Sistema Cîhanê ya Nuh" ku Amerika dixwaze bi sistemeke nuh cîhanê li gora armancê xwe bigerîne, dewleta herî nêzîk û amade rêjîma Tirk e.

### "Sistema Cîhanê ya Nuh" tê ci wateyê ?

Ji her demê bêhtir cîhan, ji her çar aliyan ve ber bi guharitneke bingehîn ve diçê. Ëdî rojhilat û rojava bi maneya xwe ya klasîkî roj bi roj jar dîbin û ji holê radibin. Û Nato û Warshawa mîna termekî mirî li erdê dikevin. Sovyet; ku di demekê de li hemberê împiryalîzmê kendalek bû, ji ber wê sosyalîzma bûrokratik, ku bi hemû taybetiyê xwe dûrî sosyalîzma zanistî ya marksist-lenînist e, têkçû. Ëdî mirov dikare bibêje rêjîma li Sovyetê li pêşîya daîrkeriya cîhanî destîrîdayî û serçe-mandî maye. Pirsgirêk û problemên Sovyetê yên hundîr jî piş li yekîtiya wê ya berê şikand û hîn jî wê bişkîne.

Belê, gelên Yekîtiya Sovyetê mafdar e ku bi hemû hêz û derfetên xwe li dijî sosyalîzma reel ya ku li sovyetê dihate meşandin, derkeve û nepejirine. Ji ber ku sosyalîzma gel dinasî û di ber de xwîna xwe dirjand ne ev sosyalîzma reel e. Ne tenê li Sovyetê, lê li gelek dewletên ku di demekê de "sosyalîst" bûn. Wekî ku tê dîtin gel li hember wê sosyalîzma derket

û derdikeve jî. Gel bilind bang dike û sosyalîzma xwe dixwaze, sosyalîzma gelêri ya demokratik dixwaze.

Rêjîma Sovyetê gel û neteweyênu ku di bin ala yekîtiya Sovyetê de dijiyan, bi navê komünîzm û sosyalîzmê birçi û tî dihiştin. Tu nema bû ku mirov ji birçîna goşte hev bixwin, ji ber vê egerê û hinde egerên din, dizîn, destavêtina rûmetê, berşîl,... û bûrokratik xurt û bilin bûn. Tu caran gel vê sosyalîzma û komünîzm ê naxwaze. Sosyalîzm jiyanekî pir şerîn e, wekheviye, demokratikî û berî her tişî mirovahîya herî bilind e. Lî, bervajî vê yekê bû sosyalîzma ku li sovyetê bi rê ve dihate birin. Ew sosyalîzma birçîbûn û tengezaryê bû. Bê guman gel vê yekê layiqê sosyalîzmê nabîne, ji lew re li dijî wê radibe.

Kin were gotin, Yekîtiya Sovyetê di rewseke tengav de dijî, di aloziyeke aborî û polîsikî de ye, roj bi roj nakokî û dubendiyê hundîr yên di nava neteweyan de xuri dîbin. Ëdî tevgerên gelên bindest tu hêviyê ji wê nakin. Ew jî ne amade ye ku alîkariya şoreşen netewî bike.

Vê rewşa ku Yekîtiya Sovyetê têde dijî valahî û delîveyek peyda kir ku împiryalîzma cîhanî ya ku USA seroketiya wê dike, awirênu xwe yên tûj li mirovahîya bikşîne. Vê valahiyê hişt ku Amerîka pilana raberdû biguhêrîne û cîhanê li gora sistemeke nuh bigerîne. Ev "Sistema Cîhanê ya Nuh" pişî şerî Xelîcê bi awahêkî eşkere derkete meydânê.

Ji bo ku împiryalîzmu berjewendiyê xwe biparêze û tevgerên şoreşerî yên gelên bindest bitemisine, li gora xwe sistemeke diafirîne. Ev a dawiyê jî ji bo mayîna wê ye.

Armanca "Sistema Cîhanê ya Nuh" xurtkirina doliweriya împiryalîzmê ya leşkerî, konevanî û aborî li cîhanê û bi taybetî Rojhilata Navîn e. Kurtkirin û tundekirina vê sistêmê jî bilindkirina, dagîrkerî û terorê ye. Yênu vê sistêmê diparêzin jî terorîzmê diparêzin û dagîrkeriya welat û neteweyan dîkin. Ji lew re şerê li dijî vê sistêmê parastina mirovahîye ye, parastina şoreşen netewî ne û hilanîna teror û dagîrkeriyê ye.

Tu caran ne ji berjewendîya împiryalîzmê ye ku gelên bindest bi serkevin. Ev e em gihiştine dawîya sedsala bîstan, nehate dîtin û nehate bihîstîn jî ku împiryalîzmê bê zora şoreşerî hêza xwe ji welaîten dagîrgeh kişandiye. Taybetiya împiryalîzmê ya herî bingehîn û pêşemîn pa-rastina berjewendiyê ye, ji bo vê parastînê jî amade ye ku dînyayê ser-binî hev bike û çem û cobaran ji xwînê biherikîne. Di karvaniyê de ev rastiya derkete holê.

Kin were gotin împiryalîzma Amerîki bi avakirina "Sistema Cîhanê ya Nuh" bi şeweyekî nuh cîhanê dagîr dike, bi şer dibe, bi aşî dibe, wê Amerîka ji bo pêkanîna vê armancê hemû hêza xwe derîne holê û wê bi her awahî alîkariya dewlet û rîjîmên ku politik û berjewendiyê wê diparêzin, bike. Di vê derbarê de împir-

yalîzma cîhanî ya di bin seroketiya Amerîka de şoreşa Kurdistanê ku agirê wê li bakur gurr bûye, mafdar nabîne. Dibêje: ev kesên ku bi şerê çekdarî rabûne terorîst in û mafê dewleta Tirk heye ku wan terorîstan ji holê hilîne. Belê, Amerîka terora dewleta Tirk ku zîndan ji girtiyên Kurd dagitîne û her şeweyen şerê taybetî yê qirkirinê li dijî Kurdan dimeşîne nayê ziman. Şerê hovane yê nemafdar ku dewleta faşîst li dijî me birêve dibe, bingehî hîma wê Amerîka bi xwe ye. Ji lew re dewleta Tirk mîna dewleteke mirovparêz tîne ziman û şoreşa me jî bi terorîzmê lekedar dike. Ev ci rastiyê derîne hole?

Bi milyonan ji 7 salî heya 70 salî bi hîrseke bilind rabûne ser piyan û Kurdistanê serbixwe û azad daxwaz dîkin. Bi keviran, bi daran, bi dil, bi xwîn, bi can ji bo pêkanîna vê armancê her roj di serîhîdanê de ne. Her roj li hemberê dijmin di şer de ne. Ëdî nema tank, top, balafer û "Sistema Cîhanê ya Nuh" diakre vî kerwanê me yê azadiyê bisekinîne, nema dikare bitîrsîne. Ji ber ku ev kerwanê gel bi rîketiye, bê guman e wê împiryalîzmu û dûvelankê wê dîsa bi dirindeyî li hemberê derkevin, wê bixwazin tune bikin. Wê her navê xerab û ne baş li şoreşa me bikin, tenê mebesta wan ew e ku şorşesê birawestînin, an jî li gora sistêma xwe ya nuh bi rê ve bibin.

Di têkçûna şoreşa Kurdistanê de împiryalîzmu gelek berheman bi dest xwe ve tîne, ji gelek aliyan ve bi serdikeve. Mirov dikare bibêje hingê dikare bi hêsanî êrdîma Rojhilata Navîn li ser tiliya xwe bigerîne, kelem û tûka herî mezîn a ku niha li pêşîya wê bûye dîwar şoreşa di bin seroketiya PKK de ye. Ev şoreş ne tenê împiryalîzmu li Rojhilata Navîn vedibire, lê belê li cîhanê jî dibe tûkek û di nava çavên vê de dadiçike.

Serketina şoreşa Kurdistanê serkevtina sosyalîzma zanistîye, her weha serkevtina tevayî gelên bindeste, yên li herêmê û yên li cîhanê. Ji ber vê egerê împiryalîzma cîhanê ji bilî PKK û şoreşa ku dimeşîne, her kesî dipejirîne. Gelo, ma "erê ji Kurdan re, na ji PKK re" tê ci watayê?

Madem gelê Kurd bi can û bênu xwe ji bo vê dozê pêşkêş kiriye, bê guman wê li dawiyê bi serkeve. Wê hemû planêr împiryalîzmu têkbiçin, çendî hêza wê xurt be jî, dîsa nikare li hember lehî û lêmîsta gel bisekine. Gel amade ye bi nîlyonan şe-hîdan ji bo armanca xwe pêşkêş bike, tu caran çikûsi di pêşkêşkirina xwînê de ne kiriye û nake jî.

Ü li dawiyê serkevtin a şoreşa serxwebûn û azadiya Kurdistanê ye û têkçûn û mirin ji bo "Sistema Cîhan ê ya Nuh" e...

**Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan - YRWK  
Komîteya Kargêr**

# Ax... Ax Birazî!

**Kamuran Simo**

**D**i beyana zû de, hewayeke hênik lêdixist. Rojê, hîn nuh bi nuh tîrêjên xwe diavêtin nava gundê Hedilê... Rojeka nuh, di vî gundi de destpêkiribû. Weke ku mirov here bi hewara tiştekî, gundi hemû dicûn ser kar û barêñ xwe. Gundê Hedilê gundekî biçûk e, lê weke bêşekî bihuştê ye. Derdorêñ gund çiya ne, çiyayêñ di nava çiyan de, deştekî mezin heye, ku tev bi zêviyan kemiliye... Hedil bi xwe jî li ser vê deşte avabûye. Li rojava, tev rezên tirî ne.. Di nav rezan de, darêñ hêjîran, darêñ behîvan û darêñ fisteqan hene. Derdorêñ rezan jî, bi darêñ guwîjan, tehuwan û hurmiyan hatîne zivirandin. Mirov dikare bêje, ku hemû darêñ fêkiyan li vê derê hene; Xox, sêv, hulik (erîk, incas), mişmiş, hinar, bîhok, kar-çik, şakok... Li derdorêñ dehl û zêviyan darêñ spîndaran hene, ku ber bi asmanan ve bilind û dirêj dibin. Di bostanan de, bacanêñ reş (balîcan), bacanêñ sor (firingî, misrî), îsot, fasulî,bamî, kuncî, xiyan, qitî, tirozî, zebeş, û gundor, kulind, şîmamok û gelek hişinayıyên din digihin. Li basûrê zêviyan dexl û zad dirêj dibin... Genim, ceh, nîsk, nohk, garis, gulgîl, tê çinan-din. Li bakur jî titin, pembû, silk, kelem, şêlim, kartol, gêzer, her weha têñ çinan-din.

Di nava gund de kehniyek derdibe. Ava kehniyê mîna şîrê sipî û sarincê ye. Li dora kehniyê darêñ tuwan hene. Li jorî kehniyê du darêñ gûzan jî hene, ku nayêñ bîra keskî, ev dar kengê hatine çandin. Pez û dewarêñ gund, di bin siha van daran de mexel dibin. serê beyanê, keç û bûkêñ gundê Hedilê, cerêñ wan û sarbikêñ(şerbik) wan li ser milêñ wan, ji wê kehniya avsar, avê ji xwe re dikîşinîñ malan. Carman, li ser kehniyê keç û bûk xwe réz dîkin û bi dengêkî zelal, di ber xwe de, helbestêñ evîniyê, welatparêziyê û lehengiyê duxwînîn.

Tev pêncî-şest mal di gund de hene. Xaniyêñ gund du-tebeqe(qat)ne. Qata binî ji bo kayê, pez û dewaner tê bi-

karanîn. Jorê xaniyâñ jî, bo rûniştina gundiyan in. Xaniyêñ gundiyan hemû weke hev in; bi kevirêñ sipî, kils û gêçê çêbûne, tev bi neqşeke endizyarî avabûne.

Serê beyanan ji ber aliye gund deng bilind dibin. Li ser sinc û baniyan dengê dîkan, li bênderan dengê seg û keran, di kolanan de dengê nîrê cotkaran, nîr li ser milêñ wan li dûv gayêñ xwe "ho-ho" ya wan e, li ber devê xaniyâñ û ji şebakan dengê kilî-kila meşkîn dew, di ser sekî û hêwangehan de zarokêñ ku ji xew çavêñ xwe vedikin, dest bi qîre-qîra giriyêñ xwe dikin... Hinek zarok jî, nanê wan di destê wan de, li ber sêpeka meşkan li hêviya rûn û nivşka xwe radiwestin.... Hema her beyana nuh, jiyan bi vê nolê di vî gundi de dest pê dike.

Dayîka Rizo, ji ber meşkê bi lez bi rê ket. Di rê de, destêñ xwe bi pêşmala xwe paqîj dikir. Li ber sekiye (erzêlê, cihê razanê) rawestiya û deng li Rizo kir.

- Kurê min Rizo rabe! Tu dereng dimînî, min ji bîr kîribû, ez te hişyar bikim. Rojê tîrêjên xwe avêtiye ser gund, divê tu pir dereng nemînî.

Rizo, bi lez rabû ser xwe û xwe şidand.



- Dayê hinekî nan bide min ez buxum, ez dereng nemînim.

- Nanê te hazire kurê min.

Rizo, li ser piyêñ xwe, nan u mastê xwe xwar û berê xwe da kadînê. Wî tûrê, ku veşartibû, derxist. Avê ser milê xwe. Xatira xwe ji dayika xwe xwest û bi rê ket.

Piştî çendekê, ku ji gund dûr ketibû, dît ku pîremêrek li ser devê çemekî, di nav nefel, tewrî û giya de paldaye. Li derdorêñ çemî, darêñ gûzan, çinar û bîhî hebûn û daran fêkiyêñ xwe girtibûn. Ava çem mîna marekî, hêdi-hêdi û bêdeng diherikî. Bêhna pirpîzêkan, sosin, nêrgiz û binefşan li ruyê mirovî diketin. Li keviya çemî, cihekî mîna zêviyeka kulîkân hebû. Derdor kesk, sor û zer bû. Kulîkân sor, zer, sipî û xemerî (lacîwert); giyayê kesk

derdor rengîn kiribûn. Li ser dar û zinaran , dengê şalûl û bililan bilind dibû. çik-çika civîkan di newal û gelian de.. Qeb-qeba kewan.. ji dûr ve jî, dengê billûrê sivanan bi dilovanî belav dibû. Mamê kamo jî, di nava wê rewşê de vehesî bû, mest bibû..

Mamê Kamo ketibû nav hîzr û bîran. Welatê biyanî û welatê xwe tanî ber çavêن xwe.. Zordarîya li ser gelê Kurd, welatfiroşıya axa û began, talankirina Kurdistan.. Şêrînbûn û xweşîya niştimanê Kurdan.. Tev nola xelekan, ji ber çavêن wî derbas dibûn. Haya wî ji tiştekî nebû, ji nişkan ve dengek hate guhêن wî.

- Silav li te mamo!
- Ax.. ax birazî ! ser çavêن min...
- Mamo ma xêre, tiştek heye?
- Na... na, ci nîne birazî. Tu bi ku derê ve diçî ?
- Ezê biçime bajêr. Çend karên min hene. Lewma ez bi lez im.

- Ez jî diçim bajêr. Em bi hev re herin. Emê rêka xwe kin bikin. An tu naxwazî em bi hev re herin ?

- Ma çima min navê mamo? Tu bi lingêن min nayê, ez jî hevalekî dixwazim, de rabe nexwe!

Mamê Kamo û Rizo, bi hev re bi rê ketin. Heya demeka dirêj kes nepeyivî. Rizo ji xwere got, "Ev pîremêr na-peyive, ka ez pirsekê ji wî bikim. Wî gotibû, em bi hev re herin, emê bi hev re biaxifin, da ku rêka me kin bibe..."

- Ma tu napeyivî, ka hinde tiştan ji me re bêje. Axiftinê kalêن mîna te gelek buha ne, gelek serpêhatinê we hene.

- Ez nizanim, çawa destpêbikim... Hewqas kulêن dilê min pir in. Kîjanê ji te re bêjim!

- Tu kîjanê dibêjî bêje, tu azadî mamo.
- De başe!.. Ezê serpihatinekê bêjim.

#### Dibêjî:

"Dema xwedê dinya avakir, xwest gazî mirovan û çend heywanan bike. Pêşî gazî mirovan kir û got:

- Ey mirovno min dinya bo xatirê we avakiriye, kêt û xweşî tev bo we ne. Heywan gişt di bin ferma we de ne. Jiyana we sih(30) sal e.

Mirov girî, xwedê ji wî pirsî.

- Çima tu digirî?

- Li hemberê hewqas kêt û xweşîyê, jiyana min pir hindike.

- Başe li wê derê raweste!

Xwedê bangî kerê kir û got:

- Min te anî dinê, bo tu zêrevaniyê di malên mirovan de bikî. Nehêlê diz û gur werin malên mirovan. Ew wê xwarina te bidine te. Jiyana te sih sal e.

Ker girî. Xwedê ji kerî pirsî:

- Tu çima digirî?
- Jiyana min pir dirêje.

- Başe... Bila jiyana te panzdeh sal be. Bila panzdeh salêن din jî, ji mirovan re be.

Xwedê gazî segî kir û gote...

- Min te anî dinê, bo tu zêrevaniyê di malên mirovan de bikî. Nehêlê diz û gur werin malên mirovan. Ew wê xwarina te bidine te. Jiyana te sih sal e.

Seg girî. Xwedê jê pirsî...

- Çima tu digirî?

- Jiyana min pire.

- Başe bila panzdeh sal be. Panzdeh salêن din, bila ji mirovan re be.

Di dawîyê de xwedê gazî meymûnê kir. Gote:

- Meymûn min te anî dinê, bo mirov bi te dilxwes û şâ bibin. Henek û tinazêن xwe bi te bikin. Jiyana te jî sîh

sal e.

Meymûn girî. Xwedê jê pirsî:

- Çima tu digirî meymûn?
- Jiyana min pire.
- Başe, bila panzdeh sal be. Panzdeh salê din, ji mirovan re be.

Heryek belavbûn , çûn ser jiyana xwe.

Rizo ma di nava meraqê de. dawîyê pirsî:

- Başe mamo! Ev ci bû, ez tênegihiştîm. Çiroka te li ser ci bû, çima te ev çîrok ji min re got ?
- Lezê neke birazî! Ezê dûmahîkê jî bêjim.

"Vêca mirov heya sih salan weke mirovan dijîn, ji sihan heya cil û pêncan weke kerê dixebeitin, ji cil û pêncan heya şêstan weke segan zêrevaniyê dîkin, malê ku berhevkirine diparêzin. Ji şêstî pêve, mirov mîna meymûnan dîbin, henek û tinazî bi wan tê kirin.

Niha tu têgihîştiyê birazî ?

Rizo şerm kir. Ji xwe re got;" Min ci tişt nekir, ku ev pîremêrd pê aciz bibe. Çima ev çîrok got ?" Û dîsa ji wî pirsî...

- Mamo li min bibuhure, heke min kêmasyiyek kîribe. Lî ez dibêjim, min ci şaşî nekiriye. Ez bawerim, ez bi te nekenî me.

- Na birazî ! Ci kêmasyîen te li hemberê min nîne. Tu nikarî bi min bikenî. Ji ber ku min, weke mirovan sih salan jiyan nekiriye. ez pir xebitîm, lê min ci mal berhev nekir. Ji ber ku min mal berhev nekiriye, zêrevanî ji hewce nekiriye. Ez ci caran nebûm seg. Gava mirov nebê seg, nabe meymûn jî. Vêca niha tu dizanî, jiyana min çima wusa derbas bû?

- Na mamo, ez nizanim.

- Başe, ezê ji tere bêjim. Ji ber ku welatê me bindest e, di bin zordariya mîtingeran de ye, hemû dewlemendiyê me jî talan dîbin. Tu jî dizanî, ka welatê me çuqas xweşê, çuqas dewlemende. Lî mixabin! Em ji dewlemendîya welatê xwe, tiştekî nabînin. Nahêlin, ku em xweşîya welatê xwe bibînin. Welat li me dîkin mîna dojehekê. Gel, belengaz û xîzan dimîne. Kêmasya we xoran ewe, ku hun bêhtir xebatê nakin. Te tûr avêtiye milê xwe! Ji berdêla tûran, divîbû çek û rest li ser bejna te hebana. Divîbû tu niha, li hemberê dijmin, di şerekî giran de bana. Belê kêmasyîen te ev in. Bila hezar kêmasyîen te li hemberê min hebana û li hemberê welat ne yek.. Niha tu têgihîşti birazî, çima min ev çîrok got? Rizo, bi gotinê mamê Kamo pir dilxwes bû û fêmkir, ku ew jî welatparêze û têkiliyên wî bi Partiyê re hene. Xwe bi wî da naskirin.

- Ez spasiya te dikim. Hevalê min ê hêja û berketî, j bo wan axiftinê te. Lî divê tu bizanibî, ez ne ji ber xwe diçim bajêr. Di tûrê min de jî, nanê min nîne. Ez bi xeba-ta pêşmergeyan diçim bajêr.

Mamê Kamo, di cih de lerizî û ji kêfan, qermîşükên eniya wî dikenîn. Destê xwe li pişta Rizo xist. Agahdar bû, ku di tûre wî de nan nîne. Tiştên giran têde hebûn.

- Li min bibûhûre hevalê delal, me hev nuh naskir. Em herdû jî, bi xebata pêşmergeyan diçin bajêr. Emê biserkevin, serkeftin bo gelê me û Partiya me ye, hevalê min î ciwan.

Gihştin bajêr. Di kolanekê de xatir ji hevdû xwestin û her yek çû ser karguzariya xwe. Nîvê şevê bi dengê peqînekê, mamê Kamo ji nav livînê xwe hişyar bû û di ber xwe de bi delalî kenî...

# Çawan Xelîl bû "soregger"?

Dr. Kurdo Husên

Xelîl bi du sê hevalan re, li ser kêleka cadeya herî mezin ya di ba-jêr de, ji xwe re digeriya, dema ew dengê han, ew dengê wek gurre gurra ewran xwe li bajêr girt. Di destpêkê de, deng bi xwe pir pir qels bû û Xelîl guh lê nekir. Buhar nû gihaştibû baxçeyê "Gulîstana Canan" li ser milê çepê yê cadeyê û wê xwe di nav rengên curbecur de vezilandibû. Di nava şîşen hesinî re surrên bê hênikayiya gihayê nû avdayî û bêhna gul û külîkan li ser baskên xwe dikirin û wan ew bêhna xweş li hemû bajêr belav dikirin. Hechecikêñ dûv meqesî ne ji mêt ve ji welatêñ germ hatibûn û wan li ser rûyê asmanê bê hawê şîn xêzikin reş û li hevhatî bi lawendî çê dikirin. Xelîl ji, ne ji mêt ve ji Ewrûpayê, wek hechecîkekê vegeriya bû, û wî dixwest, bi malbata xwe re, çend rojêñ xweş derbasbikira. Ew li paytextekî Ewrûpayî bi jin û zarok bû û ziviribû welêt û dûrî tevliheviya cîhana bi xirecir wî dixwest çend rojan li bajarê zarokîtiya xwe, di nava bîranînan de derbasbikira.

Xelîl, wê rojê, bi hevalan re derketibû seyranê û nêrinêñ wî, di nava şîşen hesinî re dibuhurîn nava baxçe. Serokê bajêr, ji mêt ve dergehêñ "Gulîstana Canan" girtibû û ji



ber vî tiştî ji, Xelîl û ew çend runiştovanêñ bajêr dikarîbûn dilê xwe bi hatina buharê tenê ji dûr ve şad bikin. Qesira (koşka) serok ji baxçe ne pir dûr bû û di nav daran de dihat xuya kirin. Di nîvî riya ku diçû ber bi qesrê ve, polîs û leşkerêñ pir, bi rext û tufengêñ xwekar (otomatikî) herdem şîpya bûn û lûlêñ çekên xwe ber bi bajêr vedikirin.

Deng hema xurt dibû û Xelîl dît ku wî nema dikarîbû bi xweşî nêriñêñ xwe li ser baxçeyê rengareng bigeranda. Wî xwest bizanîbe ew deng dengê çi bû, ji ku derê derdihat, û dema wî kir çend pirsyanan ji hevalêñ bi xwe re bikira, ew mat ma ji ber ku ew heval ji wê derê çûbûn. Xelîl ji kir ber bi malê biçûya dema, ji nişkê ve, ew riya han, ew riya pir fireh û miştirov bi qêrîn bû. Raperîna gel xwe li qesrê girtibû.

Di wê gavê de, Xelîl xwest bi bayê hechecîkekê bi asmanan biketa yan ji bibe reşkekî şevê û di nava zemînê de windabiba, lê ew ne bû ne hechecîk, ne reşkê şevê û wilo ji, di wê navbirê de, ew bê çare ma. Ew têgihişt ji ku eger ew di rûyê lehiyê de rawestiya ba, ew dê li ber lingêñ mirovan av û av biçûya û ji ber vê yekê, dema pêlîn mirovan gihaştin wî, wî xwe

avêt nav wan û ew ber bi avahiya bilind ve çû.

Raperînê Xelîl daqurtand, da ber xwe wek ku lafaw(lehî) qırşikekî, kevirekî biçuk bide ber xwe. Gurre gura raperînê xwe li qesra serok girtibû, wê riya xwe xweş naskiribû û ew di ser gewdêñ leşkerêñ mayî re derbasî meydanê bû.

Di nav pêlîn raperînê de, li ber bayê serîhîdanê, tişt pir tev li hev bûn û pêleke din rabû, lê hişê Xelîl li serê wî bû û di wê firtonê de, wî tişt bi dûrbînî û bi bîrbînî diditîn û ew li çareyekê geriya ta xwe ji wê derê bikişanda. Di nava meydanê de, li hember qesra serok, Xelîl pir matmayî bû. Di hundirê meydana pir fireh de, bi sedan darêñ xurman hatibûn çandin û pelêñ wan yên pir dirêj û pahn bi hêrs li bin guhêñ hev diketin. Xelîl dev ji hev ma gün ku(ji ber ku) darêñ xurman hîç li wê navçeyê şîn nedihatîn. Wî ji xwe re got ku, bêguman, serok û kesen xwe ew bi xwe re, ji dûr ve anîbûn û wan li ser wê axê çandibûn. Serok bi darêñ xurman re qûm ji ji welatê xwe anîbû û ew di wê meydanê de, di bin darêñ xurman de raxistibû û peyderê (heykelê) xwe di navenda meydanê de çikandibû. Piraniya rûniştovanêñ bajêr û gundiyan tucarî darêñ xurman bi çavêñ serê xwe nedîtibûn û

ew cara yekemîn bû ku ew derketin nava meydana dor girtî.

Di nava seîrhildana gel de, mirovîn dest vala tunebûn û her yekî tiştek bi destê xwe wergirti bû. Zarokan rahiştibûn keviran û nizanibûn wan li wê derê çi dikirin yan çi du-xwestin, lê ew li wê derê bûn û wan dabûn dû mezinan û bi dê û bavên xwe ve ji her cihî hatibûn. Zarokên çend mehî li ser pişt û sîngîn diyêن xwe bûn û kesekî guh nedida girî û care cara wan. Xelîl hema çavêن xwe digerand û divat kesekî ji wan kesan nasbikira, lê ji ber ku ew pir li derveyî welêt mabû û di bajêr de dan û standinê wî pir teng bûn, wî tu kes nas nekir. Wî tenê peykerê serok nasdikir. Di navenda meydanê de, li ser payekî ji cimentoya têr hesin, peykerê serok wek ciyayekî bilind bû û serê wî bi ser serê darêن xurman diket. Bi cil û bergêن leşkeran, wî ber bi jêr ve dinêrî û destê xwe yê rastê ber bi cadeya mezin ya bajêr vedikir.

Dema Xelîl zaro bû û ew diçû dibistanê, riya wî di baxçeyê "Gülistan Canan" re dibuhurî. Di navbera her çend daran de, peykerek, biçuktir ji wî peykerê meydanê, li ber wî rep dibû. Her deh duwanzdeh gavan, çend darêن biyoka yan gwîzan ji qurm ve hatibûn rakirin û di şûna wan de, berdestêن Serok peykerekî wî çandibûn. Xelîl, ji mêj ve çav li heykelekî serok neketibû. Pişti ku leşkeran dîtin ku herdem hin mirov dibuhurîn baxçe û bi renge xwînê dest û lêvîn peyker sor dikin, wan baxçe girtin û bi sedan ji kesen belengaz û bê guneh bi dar vekirin. Ji wê rojê û pê ve, lingêن rûniştvanêن bajêr neketin hundirê baxçe û kesen ku derdiketin seyranê, wek Xelîl û wê roja han, tenê di nava şîşen hesinî re dikaribûn ji xwe re li şadiya baxçe temaşe bikin.

Peykerê serok hişt ku pêlêن biranî-yan li hev bikevin û lêvîn birînêن kûr û dijwar ji nû ve vebûn û xwîn di damaran de keliya. Bi qirînek mezin, çend koman êrîşî yê peykerê ji cimentoya têr hesin kirin

û wan xwestin peyker bixînin. Xelîl pewist dît ku ew dûrî wan bimaya, paşê, wî ji xwe re got ku karê wan karê dînan bû ji ber ku wî nikarî bû bawer bikira ku tu hêz dê bikaribin wî peykerî ji cih bilvînin. Lê, ji nişkê ve, peyker ji ciyê xwe liviya, bû qırce qırça hesin û qelşek mezin û dirêj di stûnê ji cimentoyê de vebû. Rikê û bêhntengiyê hêz deh qat, sed qat dikirin û her ku kesin din diketin nav wan kesan, qelş fi-rehtir dibû.

Bûyeran bang Xelîl dikirin û rê hîna li ber wî vekiribû. Wî dikaribû bi gel re bîba yek can û yek beden. Wî dikaribû destêن xwe dirêj bikira destêن dirêjkirî, lê wî xwe da aliyekî û xwe ji nava lehiya xwîn û xwêdanê kişand. Ew çav li komek kesen biyanî ket. Ji kinc û rî û porêن wan û ji kamîreyên mezin wî naskir ku ew rojnamevan bûn, nûner û şandeyêن welatêن dûr bûn û ew ket nav wan, Wî tevlîheviya bûyeran bi awayekî din dît û nêrînê wî jî bi nêrîn ên wan kesan re bi dergehêن qesra mezin ve man û wilô jî, wî bi çavêن serê xwe dît çawan ew dergeh vebûn û çawan leşker wek tuxmê kullî ji wan der-tén. Leşkeren serok rêzên xwe rast kirin, berê top û tankêن xwe ber bi runiştvanêن bajêr û gundên hawîrdorê vekirin û mirin ji wan pijiqî, bariya û bi hezaran kes li ser qûmê dirêj bûn. Serîhildanê berê xwe da dergehêن qesrê, êrîşî leşkeran kir. Qûma nerm bi lingan ve radibû û dibû wek ewrekî reş û xwe li her tişti dipêçand. Şev ji nişkê ve ket û asmanê bê hawe şin yê wê roja buharê nema dihat xuya kirin û rojê ji ciyê xwe barkir.

Xelîl nexwest ji wê derê biliviya û dizanibû ku di nav wan biyaniyan de tiştek pê nedihat. Ew wilô ma ta ku leşkeren serok dora wan girtin. Dengê serbazekî gihaşt guhê wî.

- Geli camêran, hûn li ser çavên me hatine. Hûn nikarin bêtir li vê derê bimîni. Gerek e em we biparêzin. Werin, serok li hêvîya we ye!

Xelîl ew dengê han xweş nasdirik û wî, bê hemdê xwe lêva xwe gez kir û cardî, di nava diranê

xwe de tif bextê xwe yê reş kir. Wî ji xwe re got ku wî şâştiyek mezin kiribû vegeryabû bajêr. Li Ewrûpa-yê, wî dikaribû li gelek deveran ro-jen bê xirecir derbasbikira. Kemo nêzîk bû û nêrînê wî li ser rûyê biyaniyan geriyan û dema çavêن wî li çavêن Xelîl ketin, wî bi kêfek diyar bi zimanê Kurdi got:

- Xelo, tu û van deran, Min bihîstibû ku tu vegeryayı û min dixwest te bibînim. Kî bîr dibe ku em di fertonê de hevudû bibînin! Û hat bîra wî ku ne bi tenha xwe bûn û bi zimanê Ingilîsî wî berdomand:

- Geli camêran, ji kerema xwe re bidin dû me. Serok li hêvîya we ye. Ew ê bi dîtina we pir kêfxweş bibe!

Xelîl û Kemo, li wî bajarî, li taxekê, di cadeyekê de mezin bûbûn. Ew bi hevudû re diçûn malê û salêñ xwendinê bi hev re derbaskiribûn. Di dibistanêkê de, xwendevan bûn sê beş. Beşek bû peyê Serok û Kemo yek ji wan bû, beşek ji dibistanê dûr ket û ya ket zindanan de, yan li nava ciyayêñ bilind dijitiya serok kir û bê guman, gelek ji wî, wê rojê di nava serîhildanê de bûn. Xelîl beşê sisyan bû, ew beşê ku dijî kesekî nebû û hevaltiya tu kesî ji nedikir. Wilo jî, eger Kemo zû xwe gihad dostên serok û zû di nava wan de, wek roviyekî qula xwe kola, Xelîl dûrî tevgeren hemwelatiyêñ xwe dixwest bimaya û bi awayekî diaxift ku kesek di daxwaziyêñ wî nedigîhişt.

Xelîl û Kemo bi biyaniyan re nêzîkî dergehen qesrê û dema dergevanekî kir li bêrîk û pêxîlêñ Xelîl bigeriya, Kemo nêzîkî wî bû bi zimanê nokerê Serok got:

- Ev nasê min e, ne pewist e ku tu lê bigerrî! Tiştek pê re tune Fermo Xelîl, iro tu mîhvanê min î!

Xelîl buhurî eywaneke bê hawe fireh, li hev hatî û xweş raxistî. Masseyên xwarin û vexwarinê hatibûn rêzkirin û hemû mîweyêñ xweş li ser wan hatibûn danîn. Li paş masseyekê di zikê eywanê de, mirovekî kin û dagirî bi dengekî bilind diaxift û kar û pêkanînê Serok, di nava wan salan de, ji mîhvanan re di-

hejmart û pesnê wan dida. Xelîl hînekî guhdarî kir û paşê wî çavêن xwe li dora xwe gerandin û li mirovan temaşa kir. Gişa serên xwe xistibûn ber xwe, û wek dewarêن ku êmê xwe bixwin, kayîna xwe bikin, wan hema gepêن xwe dicütin û li sêni û ferfûriyêن miştxurek dinêrîn. Wan ji binî ve guhyadarî pêkanînê Serok nedikirin ji ber ku, bê guman, wan bi hezarêن caran ew bîhistibûn. Xelîl li hawîr dora xwe dinêrî û li çareyekê digeriya ta ji wê derê dûr biketa. car caran, deriyêن qesrê vedibûn û care car û nale nala mirovan û qîrinêن jinan derbasî hundir dibûn. Ji nişkê ve, destek dirêjî milê wî bû. Kemo bi ken jê re got:

- Ew heye çend deqe ez li te dinêrim. Tu çiqasî li dora xwe di-nihêrî! Eger min xweş te nasnekiriba min ê bawer bikira ku tu casûs î, ji bo neyaran kar dikî. Xelo, eger tu ji nêrînê têr bûyi, were em gepekk nan bi hev re bixwin! Kemo ber bi maseyekê çû û destê xwe dirêjî parçeyek goşt kir û diranêن xwe tê de çikandin. Avek nîv sor ji goşt pijiqî û dora devê wî şil kir. Wî gepa xwe cût û paşê li Xelîl nihêrî û got:

- Xelo, bi rastî ez nizanim çîma em ji hev dûr in. Gerek e em pir caran li hev bipirsin û hevûdû bibînîn, ma tu çi dibêjî? Xelîl devê xwe vekir û got:

- Tiştek me nêzîkî hev nakê. Ez û te em pir ji hev dûr in Kemo li dora xwe nêrî û xwest bi wî bikeniya lê ew ne bi tenha xwe bûn. Bi bêhtengiyek diyar wî pirsî:

- Tu dibêjî em ji hev dûr in? Ma çi me ji hev dûr dixê? Xelîl duxwest bi çi awayî bûya ji wê deverê derketa. Jina wî û herdû zarokêن wî li hêviya wî bûn û niha, bê guman, hezar pirs ji xwe dikirin. Kemo bi hemû wê bêhtengiya xwe berdomand:

- Eger tu bawer dikî ku tu ji min paqijitî, tu pir şâsi. Bawer bik pir kîfa min tê ku di rojek weke vê rojê de deng ji te nehat. Tu naxwazî bi me re bî, tu naxwazî bi tu kesî re bî, em ji te pir kîfxweş in.

Bi van peyvan, dilê Kemo hênik bû. Wî hêviya tu bersivê ji hem-welatiyê xwe nedikir lê Xelîl nedixwest bê deng bima û wî wilô ji digot:

- Ez neketim nava raperînê ji ber ku ez dizanim ku sed di sedî de baweriyêن wan kesan ji baweriyêن min pir cihê nin. Serokên wan helbet xwe firotine û ew dozek pir teng û paşverû bang dikin.

Ev gotin ji devê wî derketin û Xelîl bi xwe jî ecêp mayî ma û nikarîbû bigota çawan ew gotin di devê wî de, wê rojê, wek libêن tizbi-hê, dan dûv hev. Deng ji Kemo derneket. Bêhna wî nema teng bû tevlî ku, li derive xwîn ji her derê dipijiqî, dirijya. Xelîl di hundirê qesra serok de gotinêن xwe berdewam kirin:

- Bawerîya min bi tiştekî din tê, bi şoreşike din tê. Kemo nepirsî ew şoreşa han çi bû, çawan bû. Bala wî li derek din bû lê wî cardî ji guhdariya Xelîl dikir. Wî got:

- Li hêviya şoreşê bimîn! Em kîfxweş in, Eger di rojek wek vê rojê de deng ji te derneket, bila tu cîhanê wêran bikî dema şoreşa te bê. Em ne li dijî bîr û baweriyêن te ne.

Û ew cardî keniya. Wî diranêن xwe cardî di goşt de çikandin û dora devê wî bû hemû dohn. Leşkerek nêzîkî wî bû û çend gotin di guhê wî de gotin û bi wan gotinan rûyê Kemo zer bû, bû quşûf. Wî serê xwe hejand û dema leşkerê wî dûr ket, ew li Xelîl zîviri. Wî got:

- Xelo tu ji mirinê direvî, lê tu j hemû miriyêن di gorêن xwe de mirîtir î. Ax! Xwezî hemû rûnişttevanêن bajêr wek te bûna! Pişti van peyvan, wek ku wî tiştek ji bîr kiri-bû û ku ew tiş di wê kîlîkê de hat bîra wî, wî berdomand:

- Xelo, iro karê min pir e. Eger tu bixwazî derkevî, tu dikarî di wî deriyê han re derkevî. Kesî bi destê te negirtiye. Wî derî nişanî wî kir û berî ku ew di nav leşkeran de winda bibe, wî xwest Xelîl bêtir biperçiganda, û wî bi devekî bi ken got:

- Ez ê te bibînim ! Ez hêvidar im kevaniya te wê xwarineke xweş ji bo hatina min hazir bike.

Mirovê ku pesnê karîn û pêkanînê Serok dida hêna lista xwe dixwend û yê ku jê bawer bikira, wê bigota hew rakirina miriyan ji gorêن wan ji Serok kêm ma bû. Bê ku bela xwe bidaya rûniştian, Xelîl pişta xwe xûz kir, xwe xwar kir û bi dizî, li ser serê tiliyêن xwe derket. Li ber derî, ji alîyê derve, çend leşker hebûn û yek ji wan di nav diranêن xwe de keniya.

Nale nal û care car ji her derê derdiketin lê Xelîl xwe kerr kir û bi lez, wî berê xwe da malê. Jina wî û herdû zarokêن wî li hêviya wî bûn û dil bi tirs bûn. Pişti çend rojan û hêna agirê serîhildanê gurr bû, Xelîl karê xwe kir û zîvîr Ewrû-payê, dûrî xire cirê û serêşan dinê. Wî dilê xwe bi buhara baxçeyê "Gulîstana Canan" şad nekir, lê wî di dilê xwe de, ji xwe re got "Ma çi ji baxçeyan bêtir, li welatêن ewrû-payî!"

Dema Xelîl zîvîr mala xwe, karê xwe, li paytextekî ji paytextêن Ewrûpa rojava, wî dûvek dirêj bi serîhildanê ve kir û got ku ew bi çend hêzîn paşvemayî û kevine perest ve girêdayî bû. Ta ku nas û nenasen wî gazinan ji wî nekin û rexnan li wî negirin, wî got ku nêrînêن wî ji nêrînêن kesen ku dabûn nav raperînê pir cihê bûn. Wî çend hevalên wek xwe li dora xwe civan-din û bi hev re, wan belavok belavkirin, gazî çend hêzîn siyâsî kirin, lê kêm kesan ew belavok dîtin. Li Ewrûpayê, Xelîl bû "şoreşger"ekî navnetewî, û carna hat xuya kirin wek mirovîkî bi rastî pir zane, jîr û pêşverû. Di xewnen şevan de, gelekk caran Kemo diket nava xew-nen wî, paniya xwe li sêniyêن xwarinê dida û bi ser serê wî diqîriya û xwarinek din dixwest. Xelîl dilerziya û nizanîbû çawan xwe kîfxweş bikira. Her ku rûyê Kemo dihat ber çavêن wî, Xelîl bi awayekî xurttir li ser "şoreş"a xwe dipeyivî û dixwest ku kesen dora wî ji wî bawer bikin, bi wî bawer bikin.


# Niştimana xwe binase

# COLEMËRG

Piştîwan B.

Colemêrg (Hekarî) kewtûwete nizîk nawerastî Kurdistan, berî rojhelaşî şaxêberze-kanî rojhelat û şarî Wan e. Şarî Colemêrg le padge û ser-bazxaney turk toq dirawe (abluqê dirawe). Şax û deşt û gund û awayî Colemêrg xistûte jér pê. Lew sinûr e împre-yalistiyyey ke heye Colemêrg le başûrî Kurdistan û başûrî rojhelat da debirin. Seretayî beharî salî 1984, be dîlî û dest-beserî berew şarî Colemêrg debirdirayin. Şarî Colemêrg le new amêzî lütkey şaxî berzî sipî bergizincî xorî berbeyanî dekewt, be dolî kipî şaxaber-zezan da tûl tûl befî behar de-tawayewe, wek bilê Colemêrg bûkêke le tûli sipî da xoş-wîstana le bawesi şaxekan da serî nawetewe.

Sereta ke degeyta şarî Colemêrg serbazxaneya paşan benzînxaneyekî biçûk, paşan hotêlekî çendinîhomî ke kew-tûwete nêwerast bazarî Colemêrg. Le berî duwawe da Quatabxaneye ku bazarekî biçûk heye. Le berî pêş ewe da daî-rey polîs û emniyet e. Duway ewey dû şew û dû roj le ser-bazxanekanî derewey şar be bê nan û bê aw destbeserbûyîn dirayna emniyet, bo pişkinînî taze. Tewanî gewreman ewe bû ke pêman nabûwa nêw ba-kûrî Kurdistan ke besêkî gew-re ye le wilatekeman Kurdistan. Duway pişkinîn, dirayna Hotêle berzeke. Roji duwayî da bezîn û be şer da xulayne-we...! Jiyanî rojane kip û pir le tirs bû. Be ser adgarî rûyî her yekêk le xelkî şar sedan hîma



û pirsiyar hebû. Xelkî zorbey-an rengzerd bûn le baranî hîsî reşî gogird be ser asoy şarî Colemêrg da. Kesek ne bû bi-tuwanêt be bergî kurdî millî bixûlêtewê yarî çayexanekan her dem pir bûn le xelkî bêkarkiraw, be dem domîne û qaxezî qumar, yaxud be dem seyrirkirdinî flîma Turkiya romansiyekanî vídeyoy çayexa-ne. Bew cor e wek hemû şare-kanî faris û turk û erreb. Cejnî Newroz nizîk bû berew dengî dehol û zurne royiştîn û ge-yîştîne qutapxaney şar. Le wê da bezmî şahî û helperkêy kurdî le bergî rengâurengî kurdî da bo yekem car debîndira. Belam şax û rîga û banî şarî Colemêrg ew roj e le ser-baz û polîsî sivîl destêutifeng dewre dirabû ke cêgay sersur-man bû. Ëme dilman surpey girt le bezmî qesengî şêwey şarî Colemêrg be yekyêk le-hewrêkanim gût: "Cejnît pîroz bêt, em ro Newroz e!" Hinde nexayand kurdekkî hawwilat le

diyaweda be diyalîktikî Kur-dî petî (Badînî) cipandiye ber gujêmgûtî: "Em helperkê ye be boney jibilyonî damezran-dinî supay turk e ke 23'yi he-mû azarêk yadî deken! We lêre da Newroz qedexe ye!" Çend hengawêk geramewe duwawe seyî kabray hawwil-atim kird kabrayêkî çwar-şaneyî be hêz û baz û le ber-gêkî şir da şêwey le kirêkarêk deçû, dest be cê lêm pîrsî.

Edî ew hemû serbaz û polîs e çî ye? Dewî şariyan dawe?

Kabray kirêkar zanî nabe-led û naşarezam. Boye bize-yekî talî da hat. Seyrêkî ew lawim lay xoy kird û be pele gûtî:

Ber le çend rojêk, Pêşmer-ge Kirêkarekan le şarî Wan da, çend polîsêkyan kuşt.

Ew gotiney gût û tozî kird û boy derçû, royişt. Diyar bû bêşik, ke ew gûtin e rastî du-warojî jiyan le şarî Colemêrg û hemû şarekanî Kurdistan diyarı dekat.

## FER HENGOK

- Padgah:** Wargeha leşgerî
- Toqdirawe:** Dor lê girtiye
- Berew:** Berbi, berv
- Amêz:** Himbez
- Lütke:** Kop, Gazan
- Gizing:** Tirêj
- Kip:** dengekî nîzm
- Tûltûl:** Şiverê şiverê
- Xoşewîst:** Xweştîvî
- Bawes:** Hembêz
- Çendnihomî:** Çend tabiq
- Pişkinîn:** Pirsîyar, tehqîq
- Xulanewe:** Ger, gerîn
- Hîs:** Tenî, dû, karbon
- Bedem:** Dema
- Cor:** Texlit, Newî
- Pêçewan:** Bilakis, vêca
- Bezm:** Bez, rev
- Helperkê:** Govend
- Berg:** Cil, kinc
- Sersurman:** Şaş mayin
- Xurpe:** Gurmîn
- Hawrê:** Hevrê
- Hawwilat:** Hevwelat
- Nexayand:** dirêj nebû
- Çirpandin:** Pise-pis kîrin
- Supa:** Artêş
- Yadîkirdin:** Bîranîn
- Hêngaw:** Pêlik
- Kabra:** Kes
- Şir:** Dirandî, qetandî
- Şêwe:** Adgar, Dirûb, reng
- Nabeled:** Ne binecîh
- Bize:** Bîşirîn
- Em la:** Vî alî
- Bepele:** Bi lez

# Alik



# Fatika

## Usxan

Rozê welatê de Alike beno. Fatike beno. Nêway û bray benê. Na Alik û Fatika muara sey benê, dêmara xo bena. Yê dêmar ki di domonê xo benê. Yê dêmar domonunê xo yemeg dana ci. Alik û Fatika ki wela adir dana ci. Niyadana ke domonê xo benê zerd, Alik û Fatika ki be ne hewli.

Dêmar bena nêwes kuna cile. Sonde piye Alik û Fatika yeno ke cini ya xo biya nêwes.

Merde vano :

- Cinêk, çike to esto?

Cinikê vana :

- Ez nêwes ne, to re niyaz pozen, su zare ala zare sa vana?

Niyaz pozena dana mérde xo, rusnena ziyare.

Mérdek sono... Cinêke urzena ra, a raya qole ra sona. Rew sona, kuna peye zare de xo dana we.

Mordemek ki niyaz vere ziyarde vila keno.

Vano :

- Ziyare, cinya mi nêwesa se bikerine?

Cinike peye ziyare de vana :

- Alik û Fatika, ju ki nala bora çarebese sare bibirne, cinya to bena wes.

Mordemek cereno ra yeno.

Cinike peye ziyare ra vejina, merde xo ra rew yena çe, kuna cile.

Cinike pers kena, vana :

- Ziyare tura se va ke?

Mordemek vano :

- Va ke, Alik û Fatika, ju ki nala bore sare bibirne, cinya to bena wese. Ma çutir sara bibirnime?

Cinêke vana :

- Ez tene ronen pozen, ben dan Alik û Fatika, ame sare birneme.

Ronen pozena, bena vere Alik û Fatika de nana ru.

Alik û Fatik yene ke ronen burê, mirçike yena nisena ver pencere ra.

Vana :

- Mirçe mirçe mirçeleke, bidê mi puselegê to ra vano qesewo xevereke.

Alik û Fatika vanê :

- No çiko, na mirçike niya vana?

Mirçike onca vana :

- Mirçe mirçe mirçeleke, bide mi puseleke, to ra vano qesewo xevereke.

Nê tene ronen erzene vere mirçike.

Mirçike vana :

- Alik, urze biverove kila Fatike ro, bireme, meste sima benê sare birnenê.

Alik beneno kila Fatike ro, ceno remeno. Fatike verdana ve Alik dime. Zafke sone raste heniye yene. Alik yeno ke uwe bisimo Fatike vana, "mesime, no heniye male peskun o. Alik uwe si-meno beno malo pesk. Fatike ki xeyle raye sona, raste heniye yena. No henî ki heniye xatunan o. A ki uza uwe simena, bena xanime. Sere heniyra qawaxe bena. Vejinave qavaxe ser, sona gile qavaxe.

Sare a suke goliku ane uwe sewle daye dana-ra ve hevze. Golik peyser sone, uwe nêsi-mene. Miler xo ser o niyadano çeneke vinanê, kene zelemele.

Sone pasaye xo ra vanê:

- Pasa, ala bêniyade, juye vejiyaro qavaxe ser, je asme roze tede vêseña.

Pasa milet keno top, ano ke qavaxe waredero, hata su qavaxe birnene. Beno su, hence pa meneno ca verdane sonê.

Vane :

- Meste yeme, dame varo.

Milet oncin, sono suke.

Aliko ke biyo male pesk yeno, iştiriye xi keno qavaxer a, qawaxe keno rast, oncin sono bir.

Roza bine onca miletä suke yeno, qawaxe birnenê. Tede bas nekene.

Uza ju pire bena. Vana :

- Sima çâ honde zor dane xo? Ez sima re aye an war.

Pire sona tencik ana, henî ser o adir kena we ke rovar bikero. Adir kena we, uwe kena tencik. Tencik ana voroçiya adir kena.

E ke di hire reye henkena, çeneke corde sere qawaxera vendana, vana :

- Xanima mi, xatuna mi çâ henkena, adire xo senena we? Adire xo weke kuçikune xo rone, tencike xo pire uwe ke serne, ti çê adire xo sane-na we?

Pire ki vana :

- Qedaye tu cen, ez kor û kokim ne, bese nêken...Xere merdune xo bê mi re wek so!

Çeneke qawaxe ra yena bin ke adir wekero, pire vendana pasay. Yenê pecene bene. Çeneke dane laze pasay. Çewres roze veyve kene.

Rozê laze pasay sono sayd.

Pire ve çeneke sone rovar. Pire çutirke pore çeneke şuna, hot pincrar kena vile çeneke de, çe-

neke bena mirçike perena ra sona.

Pire kincune daye kena pay sone çé pasayde nisena ru. Sonde laze pasay sayd ra yeno, niyadano ke deste çeneke qilaşıyera, çime xo biye girs. Laze pasay pire ra pers keno vano :

- Xanim to re seviyo niya?

Pire vana :

- Mi honde ke ra to ra niyado, çimemi biye girs. Mi hondeke ax wax kerdo, az bine kokim.

Laze pasay ki ima keno, vano :

- Belka rast biya kokim.

Lelede laze pasay beno. Nalele laze pasay re yemeg pozeno, mirçike yena nisena pençere ra, qesey kena vana :

- Lazê pasay amo niyame, dela cenemi gurete negurete?

Lele naye gos dano bine yemeg veseno. Roza bine onca mirçike yena, lele bine yemeg veseno.

Roza hireyine laze pasay pers keno vano:

- Lele bine ne yemeg çá vëseno?

Lele vano:

- Niya, niya... Mirçike yena nisena pençera ra qesey kena, aqile mi aye ser sono, bine yemeg veseno.

Pasa vano:

- Ala meste ke to yemeg poti ez ki yen, xo dan we gosdan.

Roza bine lele once yemeg pozeno, a miçirge onca yena nisena pençere ra nava:

- Laze pasay ame neyame, dela cenemi gurete negurete?

Lele maşa sure nano linga mirçike ra, ano dano laze pasay. Laze pasay dest keno vile mirêkera, niyandanoke, vile mirçike de girey este, goçenu pa vineno. Goçeno oncenô, niyandano ke mirçike biye çenekade ozeve, uza vindena. Tabi raparuta. Wort uwe ra vejiya.

Pire vana:

- Uy uy aye sare birbirne! Ez legane an aye sare birbirne gona daye hard megino!

Legane ana. Mirçike sara birnene, dilape gon ginena naka ristikero. Nake çé laze pasay de ginena waro. Roze pire a suke yene ce lazem pasay zere fine ta, a pire naka riştike vinena, bina erzena pencere xo. Pire onca her roze yena çé pasay re karkena. Sonde sona çé ke, çé fisto ta, yemeg poto, her ci hurenda xodero. Pire sas bina. Roza bine, pire peye çeverde xo dana we. Niyandano ke naka ristikke gine waro ci re çeneke vejiye. Je asme roze tede vesena. Pire xilbena pê çeneke cena.

Pire vana:

- Meke... çá kuna naka ristikke? To re guna niyo? Pire roze sona çé laze pasay.

Yena vana:

- Pasa vano bere mi re peme biruçiknê.

Çeneke vana:

- Daye tu ke siya laze pasay ra vaze çeneka

mina feqire esta a ki be ro. Pire sona vana ... Roza bine çena xo ki tey bena. Piya peme ruçiknene. Laze pasay ve cina xuya ki oda bine de nistero. Horte de ki pençere esto. Para çena pire gosdano, vano:

- Çena pire qese tu hem wuli ye hem kuli ye, qesey bike.

Roze onca sona çé pasay, laze pasay ostorune xo pirude bare keno

Vano:

- Usar ke ostore kam ke çever ra tever niyame, honde barê oster zernu dan dine.

Çena pire vana:

- Kamij ostore to ke naçero ey bide mi, ez ey ben ken weyiye.

Oster cena yena çé... Çena pire sane bina erzena ju oda. Tede vas mizor teda beno. Toqe ki erzena ode bine, teda bina. Bina tede oster giredana. Roze laze pasay osteru keno top. Ostore pire hen ke hewlo şanugera zor yeno tever. Benne dane laze pasay. Laze pasay verva osterde zernu dano ci.

Onca rozê pasa çeno keno top, vano:

- Bere mi re nuku weçine hete ra ki sanuku vaze.

Çena pire ci re sanuku qesey kena, vana :

- Çeneke nisena gile qawaxer a sare suke vinenne, pire çeneke qawaxe ra nanaro. Çeneke dane laze pasay. Veyve kene, rozê pasay sano sayd pire ve çeneka sone rovar....

Pire uza ra xil bina vano:

- Vengê xo birbirne... wesuneke kena!

Laze pasay vano:

- Çena pire qesey bike to hem wuli ye hem kuli ye, qesey bike.

Çena pire vana:

- Pire çitürke sare cina laze pasay suna. Hot pincraru kena vile cina laze pasayde. Ciniya laze pasay bina mirçike perena ra sona. Pireki kinçune ciniya laze pasay kena pay. Sona çé pasayde nisena ru"

Laze pasay onca vano:

- Çena pire qese tu hem wuli ye hem kuli ye. Qesey bike!

Pire onca uza ra perena vano:

- Urze uza ra!

Laze pasay vano:

- Vinde qesey bikero!

Çena pire vana:

- Lele pasay yemeg pozeno. Mirçike yena nisena pençere ra. A miçike azune...

Laze pasay endi pero ci zaneno. Ano ra xo viri.

Roze laze pasay hefteye osteru wesa verdano. Hora sole dano ci.

Hot roz ra tepiya ostoro anu pire pa giredano, ostoru verdano ra oster pire kene letey letey.

Laze pasay onca a cinya xoya virene ceno. Seno reseno mirode xo.

# Binêrin tometêñ olperestan çawa em kirine neyarêñ hev!

Xurşid Mîrzengî.

G elek qinor (kunêr) û bîrov, gelek rîş û nexweşîyêñ Kurdan hene ku mirov li ser binivisîne; lê yek ji wan birînêñ kûr ji olperestî ye. Olperestî tovêñ purnîgan, tovêñ siti-riyan û tovêñ zelû di nava civata Kurdî de dane çandin. Neyar û dij-minêñ nîjada Kurdî bi gelek çekêñ dijwar bi nîjada kurdî re şer kirine û niha jî dikin.

Wek tête zanîn ola ïzîdiyan olek gelek pîr û kevne. Berîa van dînêñ (olêñ) niha li holê, Zend Awesta, ola ïzîdîtiyê damezirandîye û agirperestî li Rojhilata Navîn belav bûye. Ger ê Mehemed çar mele; û ên Îsa dozdeh hewariyêñ wî hebûn e, ê Mîrza Zend Awesta ji Pirê Mix hebûye.

Min bibexşînin; ev nivîsara me, ne li ser lêkolîna olan e. Ji wê ez na-xwazim zêde dakevim kûraniya olan. Ez dixazim bi çirokek kin ji devê Nadir, ji we re binivîsim da hun bi xwe sehbikin û şûşî nava fikaran bibin û bibînin da ku dijmin û neyaran çekêñ çilo û çawan li hember nîjada Kurdî pêkanîne.

Nadir dest pê kir û ewa got:

"Ez piçûkbûm, çend salîbûm nayê bîra min. Lê ev tê bîra min ku ew sal ava kanî û newalan gelek bû; ne titûn û bamiyan tîbûn dîtibûn û ne jî bexçe û darêñ fêkiyan; ew sal ewa av zehf bû ku di meha Gulan û Hezîranê de newala binê gund tîjî av bû. Ji boşî û zehfîya avê, wê salê gundiyan Werz dananîbûn û hew-ceyê ava ser erdan û dorê jî tinebû.

Av zehf û boş bû.

Havîn borî, gundiyan titûn û bamî ji nava erd û zeviyan rakirin û pez û dewar berve nava erd û zeviyan dan. Xeyn ji bexçeyêñ biyokan û sêvîn pahîzê, her der bûbû beranga pez û dewaran û bê tirs zarakan pez û dewar dibirin çêrê û êvarê têr danîn malê.

Wê sala hanê Xwedê biyok nedabûn, bi hawakî mîrî baran dibûn. Ji ber ku serma pehîzê li dar û ber dabû, pelên darêñ guzan, hewaran, încas û müşmişan, sıpîdar û biyan giş zer bûbûn û bayê pahîzê li wan dabû û giş weşandibûn; mirov li kude dinê-rin hebêñ biyokan bidaran ve zer dikirin û dişindilîn xwarê. Hingî wê salê darêñ biyokan biyok girtibûn û têr av vexwaribûn; şax û guliyêñ daran di binê giraniya biyokan de wek sê-wiyan sitûxwar bûbûn û nikaribûn serêñ xwe rakin. Mirov diçûn nava bexçeyêñ biyokan, lê mirov nikânibû bi hêsanî di nava baxçe de ji gulî û şaxêñ sitûxwar û wan dêliyêñ biyokan bigere. Gelek gulî û şaxêñ daran di bin giraiya wan dêliyêñ biyokan de şikyabûn. Ev rewşa hanê ne ê bex-çekî bû; ên ku di gund de bexçeyêñ wanê biyokan hebûn hemî ewabûn. Pêtiya bêhna biyokan di xanzûgê bêvla mirov de difetisîn û mirov se-rxwêş û serimest dikirin.

Di nava biyokan de tewir û babe-tek biyokê heye ku em ji wan re dibêjin: "Biyokêñ sembole". Wan biyokêñ sembole cûdane. Her hebekê

wan qandê petêxên Heçerkone; lê wê salê hingî hatibûn avdanê bûbûn qandê zebeşen Qadyan; tekîl şax û guliyêñ wan darêñ biyokêñ sembole wê salê şikiyan û wan daran du-sê sal xwe bi çetinî civandin serhev û nû da biyok girtin.

Zarokêñ gundiyan diçûn nava bex-çan, bêrîk û paşîlêñ xwe tîjî biyok dikirin û dihatin li mîrga binê meze-lan pê gok diliztin, diweşandin hev û pê lihev dixistin. Kesekî ji ji zarakan re nedigot: "Kuro lawo wan biyokan heyfin, çîma hûn ewha wan edem di-kin."

Elok û mirîşkêñ gund di xwarina biyokan de mîjî reş kiribûn û nikulêñ wan sor bûbûn û qût nedixwarin.

Wê salê hingî biyok baş û zehf-bûn, li Amedê jî pere nedikirin û nedihatin firotinê, ku mirov barekî biyok bibirana bazara Amedê mafê rê û mesrefa xwe dergedixistin û mirov deyndar dizivirîn gund. Ji ber wê ke-sê biyok nedibirin Amedê.

Gundiyan bi ker û qantiran biyok dibirin deşta Amedê û serî bi serî bi genim re dibedîlandin (diguhartin). Gundiyan ku biyokêñ wan tinebûn; ji gundiyan ku biyokêñ wan hebûn nîve-nîv disendin û dibirin difirotin û dihatin.

Wê pahîza hanê te mîrekî an jî xortekî gundi li ser qulatay nedidit. Riya karwan dagirtî bû; hinek diçûn û hinekîn din verdigeriyan gund.

Me jî biyokêñ xwe bi nêvî didan gundiyan, dibirin difirotin û dihatin.

Rojek ji wan rojêñ pahîzê ku kerwan riya dešta Amedê kiribûn riya Kaniyê; ez li mala metika Nazê bûm. Cemîlê kurê metika min got: "Ez sibê biyokan dibim deštê; tu jî bi min re nayê biyokfirotinê Mamo?"

Kurê metika min Cemîl, yekê kin duqat, ji xwe têr û zexim bû. Çaxê dîpeyivî pê li gotin û bêjeyan dikir û di devê xwe de nîvco nedihîştin. Her gotinek bêyî kîmasî ji devê Cemîl derdiket û qandê melekî rast diaxîfî. Xortekî ser û sînce xeşik, bê kîmasî û bê tirs bû. Wî her gav tenê biyok, hemî, pincar û tîrî dibirin dešta Amedê, serî bi serî difirotin û bêyî qeza û bela dizivîrî malê. Ne ji xedarbûna kûçikên deştiyan û ne jî ji tariya şevê û tenêbûnê neditîrsiya. Gelek caran çaxê dîçû deštê û vedigeriya; êvaran behsa xwe û hinek kûçikên xidar dikiri. Xort û zarokan gohdariya Cemîl dikirin û devêñ wan vekirî diman.

Kurê metika min Cemîl, hingî ji min hîzdikir, navê min hil nedidan û ji min re dîgot "Mamo".

Ji wê pirsa Cemîl re hingî kîfa min hatibû, gavekê ez lal mam, ger baskêñ min hebana ez ê ji kîfan bifîriyama. Minê gund û zomêñ dešta Amedê bidîtana, min ê rê û dirb nasbikirana, wê zanabûna min li ser herêmê çêbana û min ê ji zarokêñ hempayêñ xwe re bigotana û minê li ser zarokan fors û qureti bikirana.

Min bi lez gote Cemîl: "Ka ez herim ji diya xwe re bibêjim, ku bêhêle ez ê werim." Û ez bi bazdanê ji mala metika xwe derketim û min berê xwe da malê.

Çaxê ez giham malê; şîrrîna xweydanê bû bi min de dihate xwarê, ji bazdanê ez tirnefesî bûbûm û helke-helka min bû. Diya min rewşa min dît û got: "Çi hewala te ye Berxê min tu ewa fetisokî büyî û xweydana te tê xwarê? Yan te û hinekan we lihev da?"

Min bersîva diya xwe da û got: "Na; min û hinekan me lihev neda ye. Cemîl, Cemîl sibe dere deštê. Biyokan dibe. Tu destûra min didî Dadê, ez jî bi Cemîl re herim biyokfirotinê?"

Diya min, bi min kenî û got: "Kurê

min dixwaze bibe biyokfiros?"

Ez li dora diya xwe geriyam, min lavayî kirin û min got: "Belê, ez dixwazim bibim biyokfiros."

Diya min dest pêkir û got: "Berxê min; tu hêna piçukî, tu nikanî biyokan bibî frotinê. Barkirin û bardanînê, tu nikanî, meşê tu nikanî, kuçikên deştiyan xidar û dijwar in, tu hêna nehatî wî warî, tu piçukî û muhtaciya me jî nîne; hemî tiştê Berxê min heye, yên muhtac biyokên me dibin ji me re bi nîvî difiroşin. Ma çîma tu yê xwebihesinî, Berxê min? Kengê tu mezin bûy bazirganiya mezin bike."

Lê ez li kerê şeytan siwar bûbûm û min gote diya xwe: "Na, divê ez bi Cemîl re herim. Ez dixwazim herim haaa!"

Di dawî de ku diya min mecalâ xwe nedî û ji ber min nekir derve; got: "Başe, em ê barê kerê hindik lêkin, ku tu westiyayî û nikanîbûyî bimeşî, li ser barê kerê siwar be."

Bê şik û bê şibe, heta ku bêjî kîfa min hat; min diya xwe ramûsa û ez bi bayêbezê, bi bazdan çûm mala metika xwe Nazê. Min bikêf û şahî û bi bêhndaneke çikyayı gote Cemîl: "Diya min destûr da ku ez bi te re werim û go: Emê hindik biyokan li kerê kin û tu jî li ser barê biyokan siwar be da ku tu çetinî nekşinî."

Metika min nan ji tenûrê anîbû û buhistek xweydan hêna li eniya metika min zimag çêkîribû; bi keneke şêrîn, bi awirdaneke birûmet kenî û gote min: "Wîî, ez bi qurbana Berxê mala bavê xwe bim. Berxê mala bavê min mezin bû ye û dere biyokfirotinê; wey ez bi goriya wî serî. Xwedêyo tu vî kurmikî bikî hezar ji mala bavê min re." Metika min ez hemêz kirim, ji min hiz kir, ez ramûsam û destê xwe di serê min da û bi qewêtî gote Cemîl: "Cemo li lawê birayê min baş miqate be, wî newestîne û ji kûçikên xidar wî biparêze! Tu dizanî hêviya me gişkan ew e, ew çîra mala me vêxistî dêle..."

Piştî destûrdana Dadê û çündina mala metika xwe, min buhistek qam avêtibû, ez mezin bûbûm û min xwe zexm û xurt û mezin hîs dikir...

Dadê bi alîkariya Cemîl barê kerê min ê Qeyto hazır kir, lê barê kerê

Qeyto wek firqatan hazır kirin ku ez bi hêsanî li ser bar siwar bim.

Ji kîf û evîna çündina deštê, wê şevê ez gelek direng razam; di wê razana wek kiroşkê de, min gelek xewnêñ têvîlêv û tevlîhev dîtin.

Hêna dîkêñ xwedî siêtî (tercûbe) azan nedabûn lê şilûfîn xeşîm li peyhev bi wî dengêñ xwe yên qicik agahdariya hungûriya sibê didan; çaxê Bavê Cemîl hat kerê min bar kir hêna nû dîkêñ ganbore dest bi aza-na bangînê kirin.

Çaxê ez û Bavê Cemîl gihan ber mala metika min, Cemîl kerê xwe barkiribû û hazır kirî li benda me bû.

Çaxa min û Cemîl me ker dan pêsiya xwe û em meşyan: Metika min ji para dîs bi qewêtî gote Cemîl: "Cemo li birayê min baş miqatebe, bi tîn û bal be ha...!"

Li riya karwan, li pêsiya me, li pey me gundiyan biyok barkiribûn û ketibûn ser rî û dibirin. Dengê Emo yê Horikê ji kîlo mîtrokî dihat ku ji her dû kerêñ xweyêñ leker re digot: "Ço, ço mîratana."

Çaxê em gihan Diyarê Kaniya Sipî, binê Kevirê Dizan xewek dijwar miseletê min bû û bi rîçûnê de çavêñ min dihatin girtin; hema min dixwest, ez xwe di binê zinarek, devîkî, an jî kelemekî de bavêjim erdê û razim.

Cemîl ewê rewşa min sehkîr û got: "Mamo ka ez te siwarkim" Bi alîkariya Cemîl ez li nava ferqatan siwar bûm û di saniyekî de ez di xew de çûm.

Bi hewtîna kûçikên İndiyariyan re min çavêñ xwe vekirin. ez lê dîse bi xew de çûme.

Beriya niha ez du caran bi apê Rindo re hatibûm Indarê. Me gîsk bîribûn ji bona qeli.

Indar gundekî di nava sê çiyayêñ bêrz û bilind, di kaniya navenda wan hersê çiyan de, di xalek wek nivişt de ye; ji gundê Indarê xeyn ji hersê tihêlîn çiyan; henê ezman, stêrk û Xweda xuyaye; wekî din tiştek ne xuyaye. Qerac û berojkêñ çiyan ku dadikevin nava gund giş axekî sorik û soring e, lewra xaniyêñ wan û nava gund ji giş soring û sor e.

Di wê herêm û dorhêlê de giş

gund û gomên kurmancan in. Tenê Indar û Gomê-Indarê bi zazakî diaxfîn. Lê herêm û êrdimê, Indar û Gomê-Indarê, bi hovîti û xêtîyiya xwe bi nav û deng û menşûrin. Dibêjin carêk Qemerê Mala Goso dîtîye xoneyê (pisîngê nêr) Mala Telho niyaye pisînga wî û pisinga wî jî ji xoneyê Mala Telho nerevyaye û pêre bâdaye û xone jî gihayê miradê xwe. Qemer hêrs bûye, sûyêñ wî hatine, rahîjiye mawîzera xwe û bi du xone û pisînga xwe ketiye, qederê seatek, wî, pisîngê wî û xoneyê malaTelho hev grandine, lê dawiyê Qemer herdû jî di kadîna xwe de kuştî ne. Çaxê gundiyan ji Qemer re gotiye: "Qemer te çîma wan sewalêñ bê zar û ziman kuştîn?" Qemer bersîv daye û gotiye: "Îro xoneyê xelkê di pisînga min ne, ez dengê xwe nekim, wê sibê hinek dest bavejin jîna min..."!

Li ser hovîtiya Indariyan gelek tişt hene lê ezê yet a din jî bibejim.

Carkê jî Qewmo û Qaso birayên hevin, bavê wan dimre û ji hev cê dibin. Piştre diçin zeviyêñ xwe par ê di-kin, lê çaxê sînor di nava zevî de diçikînin, tiştêk nîne û kusîyekî (kiso) pîr xwe kişandiye qAlîkê xwe, hema radibin û wî kusîyi di nava zeviyê de diçikînin û dibejin: "Sînor ev e. Lê mixabin çend roj di nav de diborin Qewmo tê nava zevî û dibîne ku sînor nîne! Hema bê deng diçê malê tifinga xwe digre û berra birayê xwe Qaso dide û dikuje. Gundî ji Qewmo dipirsin: "Qewmo te çîma Birayê xwe kuşt?" Qewmo dibêje: "Sînorê me di nava zeviye de çîkandibû rakirî ye loma...!"

Ez serê we nehêşînim...

Wexta ez ji xew şîyar bûm, roj sêçar qama bilind bûbû. Di riya karwan de, di nava teht û latan de kerên me şûşî deşte dibûn. Em gihabûn nava rezên Gomê-Indarê.

Cemîl go: "Çawane Mamo! Te di- got: Ez ranazim. Tu çîma razayî."

Bi qedandina nav rezên Gomê-Indariyan re em gihan ser Kaniya Xurxur. Ev kanî di nava Gomê-Indarê û gomê-Dedaşê de dimîne. Ev kanî ji zêrzemîna Çiyayê Hecertûmê xwe di binê çiya de berra şoxê çiya dide û di nava lat û zinarêñ asê

de, di qedandina çiya, despêka deşte de der dibe. Avez zelal, qerisî û boş e; li ber wê avê du-sê aş digerin.

Em li ser kaniya Xurxurî sekînîn, me barê kerên xwe danîn, tûrên keran dan serî; nan û ronê xwe, firinî û tiryê xwe derxistin, em li ser tehtek fire bi civatekê rûniştin û me xurîniya xwe kir.

Em hêna li ser kaniya Xulxulê bûn; ji Gomê-Dedaşê çend keç û bûkên gund, çiwalên hiriyê li keran kiribûn û hatin serkaniyê ji bona hirîşûştinê. Wan keç û bûkên Gomê-Dedaşê hinek hiriya neşûştî dan Cemîl. Cemîl ji dêla hiriyê ve çend heb diyok dan wan; me dîse kerên xwe barkirin û em bi rê ketin.

Hetanî gundê Qasmî em li cîkî nesekînîn. Çaxê em gihan Qasmî nîvro zivirî bû.

Me barêñ biyokêñ xwe li ber dîwarekî mezin, li ser sekûkê fire danîn, me devê barê biyokêñ min vekir; min tûrên keran dan serî, Cemîl ji derket diyarê xanîkî û bi bangînî bankir û got: "Werin biyakan, werin biyakan; biyokêñ çiya, biyokêñ avî û wek hermiyan in!"

Piştî bankirina Cemîl bi çend deqîqan, Keçikêñ xama, bûk, ciwan û pîrekên din, bi tevlî zarokan ve li ser serîn me hêwîrîn. Di destê hinekan de sehenên difrîn, di destê hinekan de legan û yê hinekan de ji bêjingêñ ji genim ê sor dagirtî bûn.

Cemîl ji min re digot: "Mamo hayîdar be da zarok biyakan dizî nekin!"

Cemîl ewil wan xist dorê; dûvre, ewil Cemîl li qutêñ wan dinêrî, da genimê wan paqije an na. Yêñ ku di nava genimêñ wan de kevir, zîwan, ax, xîlîlîg û dinêb hebana, Cemîl para dizivirand û digot: "Ev genim nabe! herrin qutê paqij bînîn." Genimê ku Cemîl biecibandana serî bi serî dibediland û mişterîyan bi rê dikir. Ên xwedîyêñ bêjingan hîle dikirin. Çaxê qûtêñ xwe nişanê Cemîl didan; destêñ xwe didan binê bêjingê û bêjing dagirtî xuya dikirin, lê çaxê Cemîl bêjing ji destêñ wan disendin, bi darê bêjingê digirtin, bêjing ne da- girtî nîvî diman. Cemîl û mişterîyan bi qerebalix û hengame dixistin serê

hev; xwedîyêñ geniman dixwestin bi- yokekê zêde bistînîn; Cemîl ji dix- west yekê kêm bide wan, lewra mîzîn û qapan nebû.

Me li Qasimiye ferek biyokêñ min qedand.

Çaxê me barêñ xwe barkirin û em ji Qasmîyê derketin; roj li rengekî zer rawestiyabû û xatirê avabûnê dix- west.

Riya papûrê ku ji Amedê tê û bi aliye Farqînê de diçê, di nava Qasmî de dibore; Cemîl pişta papûrê gund bi gund dizanibû lê, binê papûrê baş nedinas!

Em ketin binê papûrê û bi tariya êvarê re gihan bêderê gundekî! Lê Cemîl vî gundî nedinasî û nizanibû navê gund jî çiye. Wek mirîki ku serê wî li tehtêkeve û hêna zanibe mirî ew e! Cemîl li bêderêñ wî gundî vecinqî û got: "Li van deran gundêñ êzîdiyan hene! Dibêjin: Mirov bi şev here gun- dêñ êzîdiyan; êzîdî zarokêñ misilmanan ên piçûk serjedikin û pîrêñ wan dixwen! Divê em neçin gundêñ ku ez nasnakim. Vî gundê hanê ez nas na- kim, em naçin. Emê herin ser riyekî û emê herin gundekî din ku misilman in!.."

Cemîl vê tometa hanê ji kî hîn bûbû, ji ku seh kiribû û çawa pê- hesyabû nizanim: lê van tiştîn ewha di bergohêñ min de jî borîbûn, lê ne- dihatin bîra min, ka kê gotiye. Lê ev tometêñ weha di nava civata me de bi berfirehî belav bûn û hebûn; lê serçaviya van tometan bewlû nebû.

Lê min jî û Cemîl ji sedî sed baw- er dikirin ku êzîdî goştê zarokêñ misilmanan dixwin...

Ger Cemîl ditirsîya jî bewlû ne di- dankirin; lê yê min bi xwe ziravêñ min qetyabûn, ez hezar car kor- poşman bûbûm ku ez bi Cemîl re ha- time biyokfirotinê; lê mixabin ez bi Cemîl re bûm. Lê baweriya we ji Xwedê hebe, wê qewmandinê ew- qas havîl (tesir) li ser min hîştîbû ku ne anaka, ez hezar sal jî bijîm ez nik- anim ji bîra bikim.

Ez bê deng mam; Cemîl berê ker- ran ji ser gund vegetand û em di bêderêñ gund de bi banî, bi hêla roj- ava de borîn. Me bêder li paşve hîş- tin û emketin ser rêkî fire. De haydê

serî bi gorîyê linganbe, ez ji peya me û em keran bi çargafê dajon. Hinekên nizanibin û me bibîn wê bêjin ziftiyê romê li dû wan in! Her çiqas berê rê li rojavabû ji palek piçûk bû û ji bona em ji gund wenda bibin divê em bi diyarê girkevin û gund ji pêş çavan wenda bibe. Lê tevlî wî lezkirina me û zixtkutana keran, pal dikişandin û em bi diyar nediketin! Tariya êvarê weşyabû û ketibû erdê lê hêna mîriya xwe nedanibû ser zemîn; cîhan leyminî bûbû, hem gund ji me ve xuyabû û hem ji em ji gund ve xuyabûn. Lê kesên ku ji gund, ji serê xaniyan an jî, ji kevîyên gund li me binêrina ji xwuya nebû, kifş nedibû ka hinek me dibînin an na!

Ker li pêsiya me, em weke beb-eluskê, wek ecêloka şeytan dimeşin. Lê em ci bibînin! Li pêsiya me, li diyarê pal tefl û dûmanek rabû! Ew tefl û dûmana hanê naxira gund bi xwe bû; naxir ji wêde dihat gund û em ji bi aliye naxirê de diçûn. Xeyn ji wî rê ji tu rê û dirb li pêş me nibûn ku em pêde herin!

Hêna Cemîl tiştek negotibû pêsiya garanê giha me û em di nava garan û tefl û dûmana ji berlingên naxirê radibe de wenda bûn. Ga, gamêş, conga, madag, çêlek, nogin, golik û mozik di nava hev de, li ser wê riya serbejêr û fire; hinek congan bazdi dan ser nogin û çelekan, ew ji ji ber conegean direviyan û bazdidan. Lê gamêş, sak û madagê girantir û mehqlitir bûn. Ger çend kerên mihiñî û welaq hebûn ji di nava wê naxira mezin de, ji wê tefl û dûmanî de nexuyabûn.

Di nava wê derya tefl û dûmanî de em, gihan dawiya naxirê. Gavan, çovekî şûrkanî di dest de û garan da-jot lê; zilamek bist û pênc, bist û heft-heyş salî, simbêlpAlîk, qemer, cilêن wî cûda, tifingek mewîzer li milan û li hespek qer siwar û lipey naxirê di nava wî tefl û dûmanî de wek dêwek e û tê.

Gavan qet işe xwe ji me nanî û bi me re nepeyiivî, bi ajotina naxirê re mijûl di bû û karê xwe dikir. Lê siwarê hespê qer, xwediye tifinga ma-wîzer bi wê temtêla xwe ya xweş û bi

wan awirdanêñ xwe yên kubar li pêşberê min û Cemîl rawestî û pirsî:

- Barêñ we çinîn?

Cemîl:

- Biyok in.

- We li gund dani?

- Na.

- Çima we li gund dananî; hûn vê şevê kude derin?

- Emê herin Qerexanê.

- Hun ji ku ne?

- Em çiyayî ne.

- Ez zanim hûn çiyayî ne, hûn ji kijan gundi ne?

- Em Zengî ne.

Çaxê Cemîl got: "Em Zengî ne" zilamê siwar ji hespê qer peya bû, hat ber min û ji min pirsî: "Tu kurê Mîrza yi? Navê te Nadir e? Ev xortê ha ji lawê metika te Nazê ye?"

Em heirmayî man û min bersîva siwarê hespê qer da û got:

"Belê."

Siwarê hespê qer ez ko kirim, ez ramûsam, destê xwe di serê min da, gewriya wî tiji bû û çavêñ wî şil bûn.

Bi dostanîkê dilovanî (semîmî) û nerm gote Cemîl: "Ka xwarzê min; berê kerên xwe bizivirîne, hûn mîvanêñ min in."

Qabil (mîmkûn) nebû û Cemîl nik-anibû bibêje: "Na". Yê min ji mafê min û axaftinê nînbû û me nikânibû bêjin: "Na."

Cemîl ji bêmecaliyê berê herdû keran zivirand û me û xwediye hespê qer da dû naxirê.

Bi van hîsîn zarokîti ez heyirî mabûm, ziman di devê min de bûbû gulok, û ez lal bûbûm. Ev zilam kî bû? Di kude bavê min û metika min nasdikirin?

Cemîl ji ji tırsanan newêribû biax-ife û tiştekî pirske, an ji bibêje!

Naxir ji me dûr ketibû û serê naxirê gîhabû gund ji. Ji bakûr bakî bi ku-barî dihat û wê tefl û dûmana dû naxir bi başûr de wer dikir û li zevî û priyêzeyen kîleka rê dixeşandi.

Xwediye hespê qer dîse ling avêt ser hespê û bêyî bi me re bipeyive ket pêsiya kerê me û gote Cemîl: "Bajo xwarzê!"

Min bi dici ji Cemîl re got: "Wele vî mîrikî me dibe, wê işev me şerjêkîn û wê pîren wan me bixwin..."

Cemîl bêdeng ma û tiştek negote min.

Min ji Cemîl pirsî û got: "Evja ji ku Bavê min û Diya te dinase?"

Cemîl ji şaş û heyiri mabû û gote min: "Ez ji nizanîm; belkî li me fen dike! Gewriya Cemîl tiji bûbû."

Tevlî ku xwedî hespê qer bavê min û metika min tevde nasdikirin ji, em di nava şik û gumanan de bûn... Ji ber ku mîrik zêde tiştek ne gotibû. Em ji ji êzîdiyan ditirsiyan û me digot qey ev zilamê hanê ji êzîdî ye û li me fen û dekan dike û wê pîren gundiyan işev me bigurînin û wê me bixwin.

Cemîl got: "Cana êzîdî têñ tîtûnê distînîn, belkî vî mîrikî ji hatîye gundê me titûn stendî ye û li mala we mîvan maye û Bavê te û Diya min nasdike û navêñ wan ji dibêje!"

A rastî me xwe ji gurandin û xwari-na êzîdiyan re hazır kiribû û em bê mecal bûn.

Ew tirsa wê êvarê, ew tirsa za-rokîti, ne qabile ku niha ez kanibim bînime ser ziman. Dilêñ me, wek dilê kîrgokî ku destê nêçîrvan de be, lêdîdan û em bê pergal bûn.

Bi wan şik û teşüşan, me nêzîkî li gund kir.

Di qeraxê gund de siwarê hespê qer, tenê ji min pîrsa Diya min û herdû metikêñ min-binav kirin-kir ku çawandin, basınñ.

Min ji bersîva wî da û got: "Başın."

Ev gunde hanê Heyderekan bû, gundek ji gundêñ deşta Amedê û wek wan gundêñ din ê xaniyêñ wê ax, yek te beq (tof) û bê dar û ber bû. Di temamê gund de sê darêñ tuwan û darekî biyê bûn, lê wê dara biyê rewşek xweşik didan temamê gund. Wê dara biyê bi gulik û bi rîşik bû; şax û guliyêñ wê wek keziyêñ keçikêñ xama pêve dişindilîn, şax û xîlfîn wê yên xanxolik pêde dirijiyan ser axê. Beşn û temtêla wê dara biya bi rîşik ji wek başñ û temtêla Hedê bû. Hersê darêñ tuwan ji pîr û kevnare bûn: Yek romî, yek şamî û yek ji dara tuwêñ tehmandî bû. Heyderekan ne zehf mezin, ne ji piçûk bû; sîh-çil mal û xaniyêñ herrî di zik û pêşîrêñ hevde bûn.

Em di başûrê gund de, di qerax

de fitilin û daketin binê gund. Çaxê me çeq da xwe, em li ber derikê mezin û vekirî rawestiyâ.

Xortek wek Cemîl hat, dizgînê hespê qer girt, û siwarê hespê peya bû û bi ferman gote wî xortî: "Rîza keran bikşînîn hewşê û barêwan daynin! Van xortan mîvanêne me ne."

Xwediyê hespê qer destê min girt û em çûn hundirê hewşa mezin û servekirî. Zilamê destê min di nav lepêni vî de, bankir dayika xwe û gotê: "Dayê were min ji te re xelatek haniye!"

Min bi çavên bêhevî û bi tirs li pişta xwe li Cemîl nîrî, lê bêfeyde, Cemîl nêna li derive li ber keran bû û min wî nedî. Gevriya min tîjî bû; çavên min sor û şîl bûn; dilê min wek pêlên derya Wanê davêtin, ez direcîfim û bê qiyas ditirsiyam û min jî xwe re digot: "Vî zilamî mi ji bona diya xwe anîye; wê îşev min bigurînin, wê min bikêñ hêt, wê min di sîtilê de bipijînin û we diya zilam di goştê min de mejî reş bike."

Diya zilam, ji devê eywane, ji ser şaneşînko piçûk bersîvda û got: "Te ci xelat ji diya xwe re haniye berxê min?"

Zilam: "Min kurê hevalê xwe yê girtîxanê (hepsê) Mîrza ji te re anîye."

Pîrê şaş û heyirî ma û got: "Kurê Mîrzayê minê simbêlsosinî di kude derket? Ma qandê ku were û van doran bigere mezin bûye?"

Pîra rûgewezî û porhinekirî ji şaneşînkê daket, şîmk di lingan de û ber bi min hat. Çawa giha ber min û zilam, min hemêz kir, bi wan lêvên xwe yênil min ramûsa, maçı kir û hêsrîn Pîrê wek dilopan bi ser hinrokê wê de niqutîn xwarê." Ana birra jî ev qurê Mîrza ye, ana birra jî ev kurê Mîrzayê min e?"

Birra jî weke ku ji Pîra rûgewez re xelat ji alî xwedê ve ji ezmanê hafstan were xwarê ewa kêfa Pîrê hatibû.

Ez bi xwe şaş û heyirî û di nava Xellîli û Celîl de mabûm, lê min baş hilkiribû ku ev ne ten e û ne jî xef e. Birra jî vî malbatê mala ne, bavê min nasdikirin û dostê malbata me bûn.

Pîra rûgewezî bi fermandanê ban-

dikir û digot: Elyas ka zû elokek bigre û bigurîne!"

Di hewşê de, li quncikê alî rohilat sekükî mezin, li ser sekûyê textekê razan ê çarling û firre hebû; li ser wî textî doşek raxistî nazbalîf danandî bûn; Evdilrezaq (siwarê hespê qer) destê min girt, em çûn ser textê ser sekûyê.

Pîra rûgewez çû û bi şîvê re mijûl dibû.

Evdilrezaq av xwest.

Bûkekê ji min û Evdilrezaq re di şerbikekî piçûk de av û qedehek anîn.

Evdilrezaq gote bûka ku av hanibû: "Ka here wan wênen min û Mîrza ku me di girtîxana Farqînê de kişandibûn bîne!"

Çaxê bûkê wênen bavê min û Evdilrezaq anîn, lembe jî pêxistibû û bi xwe re anîbû.

Cemîl û Rîza jî barêwan keran danibûn, ker hewandibûn û Cemîl jî hatibû ser texte firre.

Evdilrezaq wênen xwe û ên bavê min, yeko yeko nişanî min û Cemîl dan û got: "Ez û bavê te em bûne desbirayê hev; çaxê bavê te sax bû ez pir dihatim gundê we. Em diçûn nav bexçeyen we yênil Qor, ava seleba nav bexçeyê we yênil Qor gelek qerisiye. Min û bavê te, me xiyar davêtin nav ava seleb hetanî xiyar biçiriyanâ. Ew tiifinga bavê teyê mavizer min û wî, me bi hev re ji Rîzayê 'mala Hecî send. Ez û bavê te, em salekî û heyşt mehan bi hev re di hefsa Farqînê de man. Ev gund yê me ye. Em Hezroyî ne, û mala me hem li Hezroyê heye û hem jî li vir heye. Yanî em du malî ne."

Piştî wê şîrovekirina Evdilrezaq, Cemîl got: "Xalo niha hate bîra min! Te, Xalê min û Keyayê Lasireynê we şevez di mala me de kilam (sitran) gotin."

Piştî me baş hev naskir; Pîra rûgewezî şîva me tevlî goştê elokê anî û me şîva xwe bê tirs û bê lerz xwar û vexwar.

Direngê şevê Cemîl kenî û mese-la me, êzîdiyan û fikarêni bi me re gotin Evdilrezaq. Em giş kenîyan û razan.

Evdilrezaq em du roja li gund

hiştin, em bernedan û em di nava milkêni xwe de gerandin.

Dû du rojan re: Herdû barêni me genim dagirtin; du elok jî dan me û em bi şahî bi rê kirin.

Dayika Evdilrezaq digote Cemîl: "Li lawê Mîrza, Nadirê min miqatbin û bêje diya wî bila wî neşîne biyokfîrotinê ha; tu bêjî ha!"

Bir a jî di deşta Diyarbekirê de heft-heyşt gundêñ êzîdiyan hene.

Piştî min xwe naskir; ez heyî li xwe bûm, min ji êzîdiyêñ gundêñ Bismil û Diyarbekirê, gelek êzîdî nasîn; xeyn ji êzîdiyêñ Amedê, ji êzîdiyêñ Pişêri, ji êzîdiyêñ Wêranşarê û hinek ji Şengalî nasîn û ez bi wan re bûm dost û yar. Min nasîn ku ne gedexwarin...

Min dît, min naskir û min xwend jî! Çawa em Kurdin; êzîdî jî wek me Kurdin. Êzîdî agirperestin, navê ola (dîna) wan zerdûşye. Pêxemberê wan Mîrza (Hezretî) Zend e. navê misehefa wan Awesta ye û berya van olêni heyî ev ol hebûye û Mîrza Zend Awesta jî Kurd e. Lewra wî demê temamê Kurdan zerdûşî bûne. Lê çaxê van olêni ereban hatine Kurdistanê, Kûrdêñ bê hisyet û bê şeref, serî li ber ereban tewandine, şexsiyet û kesîtiya xwe firotine û dev ji ola xwe yaku ola zerdûşî ji temamê olan demoqrattir û hêsantrî e; xeyn ji firebûn û demokratiya ola zerdûşî, wan pêxemberê ereban gelek tişt ji Awesta dizîne û gotine Xwedê gotîye-fire û demokrat berdane û ol guhartîn e, lê êzîdiyêñ mérخas û keleş, êzîdiyen egid û xweşmêran, serî li ber erebêñ bedewî û tolaz netewandine, râjerî nekirine û olêni ereban nepejirandine û napejirîn in. Mafdar in jî. Lewra ne bêşexsiyetin, xelkêñ biyanî bi ser xwe re nabînin...

Dûvre; neyarêni ku Kurdistan xis-tine bin destêni xwe, hespêni xwe têde ajotine; rabûne Kurd û Kurd bi olîti û bi tometan kirine neyarêni hev û li dij hev kirine agirê sor û bera hev dane."

Ez bi xwe piştî vî çîroka zarokîtiya Nadir û şîrovekirina wê tiştekî na-nivsînim û fikaran ji xwendevanan re dêhelim. Başe?

04. 01. 1990

# Binvîse!

## Sebrî Botanî

Xezalê hilo hilo  
Li gel Şahîn û Silo

Mîna Sîlan û Zînê  
Bajo karwanê jînê

Dîn û dewlet qelem e  
Nezanîn derd û xem e

Bixwîne ez xulamê  
Xezalê berxa mamê

Bêje bijî serbestî  
Tehl e jîna bîdestî

\* \* \* \*

Hêjayê hayê hayê  
Bê zehmet xweşî nayê

Ava ke warê tu lê  
Nivîskarê û aqilê

Bixwaze ya tu d'xwazî  
Bike hawar û gazî

Li nav bajar û gunda  
Li welatê me Kurda

\* \* \* \*

Xezalê hilî hilî  
Binvîse ya l' vî dilî

Bi wî zimanê şirîn  
Derman bike sed birîn

Mil bi milê gundiya  
Geş ke govenda çiya

Hawar ke Welat, Welat  
Ser û mal bo te xelat

Hilde ala wekhevî  
Keçê da tu serkevî

Ji diwana "Dilistan"ê.

# Al û Bûk

## Xamevan

Kurdistana min  
Tenê wek pepûk

bûkên cîhanê  
Rûken û nûjen

Kurdistan min  
Hîna pir fedok

Xeman meksîne  
Dota kezîzer

Va ne hilwestîn  
Xortêş şoreşger

Va ne peydabûn  
Serheng û efser

Va ye hişyar bû  
Nifşa rizgarî

Va ye ava bû  
Artêş û leşker

\* \* \*  
Bûkê de rabe  
Dakeve hember

Ev bejna zirav  
Ev laş û ev nav

Her çax û her gav  
Tim ciwan û ter

Ev bîn û gulav  
Berde ser hinav

Ev ala rengîn  
Ji bo te kember

Çavan tu kil de  
Ebrû leglegî

Bijangan hilde  
Xalan bîne der

Berde ser biskan  
Ev misk û ember

Ev por û gulî  
Perçem û qeter

Berde ser pêşîr  
Memkên gilover

Bila şâ bibin  
Zarok û mindal

Ev jinê delal  
Ev pîr û ev kal

Ev keçen bedew  
Ev xortêş şepal

Bila şâ bibin  
Gişt azadîxwaz

Bila şet bibin  
Dijminê seger

Bila şâ bibin  
Ev dost û heval

Bila biteqin  
Neyar û noker

Xawer: Cihê ku roj têra derdikeve.

# Eusana Bindestiyê

Gündî

Bila rakin  
Bila deynin  
Bila bipîvin  
Bila bijmîrin  
Kes ji bindestan çêtir bindestiyê nasnake

Lê bindestî ne tenê gotinek e  
ne tenê navek e  
yan awazek e...

Ka em temâşekin li rewşan û dozan  
li rabûn û rûniştina bindestan  
li zordariya zordaran  
Ka em temâşekin li mîzînan  
li pîvanan  
Ka em temâşekin li dîroka bindestan  
li dîroka zordestan  
li dîroka cîhan

Digotin: Eger dengkirin ji zîv be,  
dengnekirin ji zêr e

Digotin: Deng mekin!  
Eger kîncen we ji we kirin  
Eger malên we talan kirin  
Eger fermaña we rakirin,  
Deng mekin!

Deng mekin!  
Ew beg in,  
Paşa û sultan in  
Ew mezin in... gir in  
Ji erdê heya ezman in

Digotin: Eger ew hatin,  
destêñ xwe bi ser hev din!  
serê xwe daxin...li erdê temâşekin!

Digotin: Derewên wan ji rast in

Bi salan  
Bi sedsal û hezarsalan  
Diçandin  
Di tamarêñ me da  
Di dilêñ me da  
Di mijiyêñ me da  
Diçandin... diçandin  
Tirs û bêdengî  
Tirs û bêdengî

Digotin: Ew her tişt in  
zana ne... her tiştî dizanin  
bi hiş in... mezin in... şareza ne

Digotin: Em bextereş in... nezan in  
bê hiş in  
bê pişt in  
em ne tişt in

Digotin: Tenê ew kanin serdar bin  
qehreman bin  
mîr û şîr bin.

Tenê ew kanin leşkeran çêkin  
alan rakin  
dewletan avakin

Digotin: Li heniya me hatiye nîvîsandin,  
em barêñ wan rakin  
em qundereyêñ wan boyakin  
singêñ xwe ji wan ra bi mertalkin

Digotin: Dîsa li heniya me hatiy nîvîsandin,  
em fêri zimanêñ wan bin  
navêñ wan li xwe kin  
li zaroyêñ xwe kin  
li bajar û deşt û çiya kin  
pêwîst e em bi wan ra bin  
di siya wan da rabin  
di siya wan da rûnîn

Digotin: Gelo em kanin bibin tişt?!

Na, em nikânin bibin tişt  
em kanin bibin leşker  
lê em nabin serleşker  
em nabin şah û sultan  
em kanin bibin dergevan

Wisa di me da diçandin  
Keda me bo dijminan dişandin  
Pir caran xûna me erzan dirjandin

Dema bindest şiyar bûn  
Ji va xewa gîran rabûn  
Ditîn, kesek tune xûnhiştin  
Çi hejar û ci zengîn  
Ditîn, ev şah û sultan  
Xudanêñ dar û ferman  
Bi keda me bûne têr  
Di sayê me da bûne şîr  
Ewna netewa serdar  
Em ji bindest û hejar  
Ewna xudan dewlet in  
Em girtiyêñ welat in  
Girtin hawîr wek guran  
Bi sinor û kemberan...

Raperîna vê carê  
Ne wek rabûnêñ berê  
Keç û xort û jîn û mîr  
Ser hildane wek dilêr  
Roja teze poz rakir  
Bêdengiyê mal barkir  
Tirs ji dilêñ me derket  
Em ji dixazin dewlet...

29. 07. 1991

# Heyranok

Heyranok bi xwe stiranê keçen 12-15 sali ne. Naverokêwan jî gili û gazindên evînê ne.

Heyranok li Botan, Hekarî û Behdînan têne stirandin. Lî iro ji ber gelek ûstan (sebeb) kêm mane û berbi nemanê ve dicin. Ev çar Heyranokêni li jêr ji devê dayika Kurd Sora Botanî (60 sali) ji Zaxoyê, hatine girtin.

## 1- Kurdi - Beyat

Were delalê dilê mino

Mi go ez kevoka im, ax kevoka kerr (dîn) û gêj im,

hey lo delal

Were delalê dilê mino

Mi go kesek nîne û ez ê gilî û gazindê xwe jî, ax jêra bêjim,

hey lo delal

Were delalê dilê mino

Mi go ez ê kela dilê xwe yê şewitî verêjim,

hey lo delal

Were hey lo delal, hey lo delal, tu delal î.

## 2 - Kurdi - Beyat

Were kurko dîno mi go tu l' serbana meş meş ne ke, hey lo delal

Were kurko dîno mi go tu ag'rê cigarê l' mi geş ne ke, hey lo delal

Were kurko dîno mi go ez ya te me xwe şas ne ke, hey lo delal

Were kurko dîno mi go ez nexweş im ta dê girim, hey lo delal

Were kurko dîno mi go ez roj bo rojê xirabtir im, hey lo delal

Were kurko dîno mi go kul û xem û mereqê hewe l' vê dinyayê ez

pîr kirim, hey lo delal

## 3 - Hicaz

Ax de lêlê dayê, dînê, rebenê, malwêranê

Îro mi go êvar e rojkê ne ma dayê, dayê wey

Ax îro mi go, sihê girtî dorê reza,

dorê çema dayê, dayê wey

Kurko dîno, ez ne di xema

her sê birakên xwe me dayê, dayê wey

Ez di xema her sê hemaylokên lawê xwe me

Ax kurko dîno, b' Xudê j' ber te dê mirim wey

Ax de lê lê dayê, dînê, rebenê, malwêranê

Îro mi go stêra sibê l' mi geş kir dayê, dayê wey

Ax îro mi go, xelkê dinyayê

serbana xewka xweş kir dayê, dayê wey

Kurko dîno madem te zanî

dê çî eskerîya giran û nexweş dayê, dayê wey

Delalê malê, te çima bextê mi hemî reş kir

Ax kurko dîno, dê herî canê mi jî b' canê te ra wey

## 4 - Ecem

Roja me derket, ji kenarê Îranê

Şefeqa rojê havêtiye Kurdistanê

Felek xaîn e ez na gehme yarî

Hawar j' derdê vê jiyanê

Roja me derket ji Bidlîsa Botan

Şefeqa rojê havêtiye bejn û bala keç û xortan

Xwezî j' xêra Xudê ra, Xudê miradê miradxwaza kiriba

Bila min kirâsê ber laşê xwe bifrota

# Kurd Kê ne?

## Vanîkê Elîxan

Hûn dixazin ku bizanibin, Kê ne Kurd!  
Kê kuştîye, zérandiye, ew in Kurd!  
Kê bindest e, perçekirî, ew in Kurd!  
Bi zarê xwe kê deng nade, ew in Kurd!  
Hûn dixazin ku bizanibin Kê ne Kurd?  
Kê ku iro muhacir e, ew in Kurd  
Kê di zindan û hebsê da ne, ewin Kurd!  
Çiyayê bilind li kê sitar e, ew in Kurd!  
Dîsa bêjim ku bizanibin kê ne Kurd?  
Kê bê dewlet, text û tac e, ew in Kurd!  
Kê ser erdê xwe mîvan e, ew in Kurd!  
Cîhan kê ra ku kirê ye, ew in Kurd!  
Dîsa bêjim hela kanê kê, ne Kurd!  
Kê şkevt û serê çiya ne, ew in Kurd!  
Kê ku şev-ro ber xûrê ne, ew in Kurd!  
Mala kîjana zindan e, ew in Kurd!  
De bizanibin rind bizanibin, kê ne Kurd!  
Kê serihildan xwe ra kirye kar, ew in Kurd!  
Kê şev û ro ber xwe dide, ew in Kurd!  
Boy serxwebûnê kê şer dike, ew in Kurd!

Rewan (Yêrivan). 1991

## Bihar

### Naza Goyanî

Bihar za cîhan bû xoş  
Jîna me ya bûye coş

Ey Bihar tu b' xêr hatî  
Geş dikî vî welatî

Roj derket befir ne ma  
Xweşî, stiran û sema

Mêrgên me germ dibine  
Pez çiyayî diçine

## Bi hev ra

Yek ji bo hemeya  
Hemeya j' bo yekî  
Her dem pêkve bin  
Kar-xebat hingî  
Gelek fireh e,  
Dewlemend e jî

Zaxo, 1986

# DESTANA ŞİRİN Ú FERHAD

## Pîşka -2-

Beşîr Botanî

**Pîrê :**

Ferhadê mino dêbabêne te ji  
hatne kuştin  
Şivan û çetêne xo mala we ji  
talan kirin  
Eman, eman, eman,  
felek xaîn e

**Dastanbêj :**

Ferhad ji xem û keseran li xo  
dedit û xo birîndar dikit û dikevite  
erdî...  
Paşê li nik gundiyan diyar bû  
ku pîrejinê  
Xapînok e û derewîn e û gotinê  
Hey pîrê çepelê, bê wîjdanê

**Gundiyek :**

Pîra xayîn dîvêt bimî  
berî Ferhad û te hew  
Dît pere û zérên mîr Xesrew  
Xapînokê, xapînokê,  
dê te kujîn lê

**Dastanbêj :**

Lê Ferhadî dereng zanî ku  
pîrejin xapînok e û ji aliyê mîr  
Xesroyî ve hatiye şandin... Gundî  
ji pîrejinê dikujin û wê tavêjne  
newalê û dimrit.

**Ferhad :**

Bêstûn can, min peyivine hene  
çiyayê mino  
  
Bila j' bîra te ne çino  
Hey çiyayê Bêstûn, tu pîroz î  
  
Heke dost li mi' d'pirsin  
Bêje wan li aramgeha mezin  
gora min  
  
Hey çiyayê Bêstûn, tu pîroz î  
  
Hey lo çiya jiyan  
hemî derewîn e  
Tu zanî ji kesekî ra na mîne  
Hey çiyayê Bêstûn, tu pîroz î

Tu b'Xudê kî rewşa mi' ji  
bêje wan  
Ku j' dûriya Şîrînê bûme perişan  
Hey çiyayê Bêstûnê, tu pîroz î  
  
Eve gorî wê ye canê min  
Hay xaîn felek hay wax li min  
Hey çiyayê Bêstûnê, tu pîroz î

Ka bûka min, ka dêbabêne  
min û dostêne min  
Ka xîm û nasyar û cîranêne min  
Hey çiyayê Bêstûnê, tu pîroz î  
  
Felekê dimrim li ser  
çiyayê Bêstûnê  
Û bûme şehîd ji bo bejna Şîrînê  
Hey çiyayê Bêstûnê, tu pîroz î

**Dastanbêj :**

Ferhad rojekê li ber mirinê  
dimînit û dema Şîrînê zanî, ew  
hate çiyayê Bêstûnê...

**Şîrîn :**

Ay Ferhad, hawar e Ferhad o  
Pişti te ez nabime şad o  
Eman, eman, eman,  
Ferhadê min o

**Ferhad :**

Ey hawar eve tu yi Şîrîn can  
Tu mayî, mîra cavmestan  
Delalê, delalê, hemîj' ber te bû

Ji ber te min xo kuştî aman  
Ey qublegeha hevîndaran  
Delalê, delalê, hemîj' ber te bû

**Şîrîn :**

Te çîma we l' xo kirî, yar o  
Te pirsa mi' ji ne kirî, jar o  
Delalo, delalo, jaro dil o

**Ferhad :**

Gava min gu' lê bû navê

mirina te  
Li nik min yek bû derew e,  
yan rast e  
Delalê, delalê hemîj' ber te bû  
  
Niho l' ser ranê te serê min  
Ger bimrim ji dîsa xoş e mirin  
Delalê, delalê hemîj' ber te bû

**Şîrîn :**

Ez gorî Ferhad can o  
Te 'z kirime xemxwar û perişan o  
Delalo, delalo, jaro dilo

Te xo kuştîj ' ber min  
hîvya jîn im  
Bi Zeradeşti ne ma  
mîr Xesroyî bibînim  
Delalo, delalo, jaro dilo

**Dastanbêj :**

Ferhad bar dikit û ji kirasê  
Şîrînê kifnek jêra berhev dîkin û  
li goristanê vedîşêrin. Mişê mirov  
li şîna wî û li goristanê amade dibin.  
Û her li wê rojê pismîr Şêro  
Şapûrî ji karê xo derdixînit. Şapûr  
ji dizivirite nik jîna xo ya berê...  
Dilê pismîr Şêroyî ji kete Şîrînê.

**Xulamê Pismîr :**

Lê delalê Şîrîna nazdar  
Şêro hevîna xo j' bo te kiriye xuya  
û diyar  
Delalê, delalê, Şîrînxanê

**Şîrîn :**

Bêje pismîr Şêroyî, min gelek şert  
hene ez benî  
Ji bo te me ger wan bi cih bîni  
Pismîro, pismîro, tu jêhatî yi

**Dastanbêj :**

Xulam dibêjite pismîrî... Paşê  
Şîrîn dibite mîhvana wî...

**Şîrîn :**

Ger bixwazî b' hevînê şad bibî

Ya yekê divêt babê xo bikujî  
Pismîro, pismîro, tu jêhatî yî

Ya diwê mal û milkê wî  
bike wêran

Ya siyê pere û zêrên wîjî  
bide hejaran

Pismîro, pismîro, tu jêhatî yî

Hingê bi van biskêñ reş  
Li ser serê te dikim siheka  
hênik û xweş

Pismîro, pismîro, tu jêhatî yî

### Şêro :

Lê Şîrînê, lê Şîrînê, lê Şîrînê  
Jiyan ji kesekî ra na mînê  
Delalê, delalê, tu yar bibe

De mi' b' hevînê vejîne  
bêhna mi' teng e

Ez gorî dê mirim, nê dereng e  
Delalê, delalê, tu yar bibe

### Dastanbêj :

Pismîr Şêro bi harîkariya nobedârêñ xo babê xo li nîva şevê dikujit û xo dikite mîr. Termê wî li teniştä gora Ferhadî tête veşartin. Dîtra rojê ew dibite mîhvanê Şîrînê. Hingê Şivan jî xo berhev dikit heyâ ku koçika mîr Xesroyî bi zorê bistînit û koç ji xo ra bikite heyîn. Jar û belengaz jî nîzîkî wî dibin û hemî ji bo jiyanê...

### Şîvan:

Koçka min mala reben û jara  
Mîhvanxana biyanî,  
réving û koçera  
Aman, aman, aman,  
aman, aman

### Dastanbêj :

Li devera çiyayê Bêstûnê erd dihejît û koça Şîvanî kavil dibit û Şîvan li bin kevran dimrit. Gundî û koçer hemî têne şîna wî, wesan hejar û rebenêñ ku li bajaran dijîn.

### Şîrîn :

Hej mîr Şero te şertê  
yekê b' cih anî

û yêñ dî mane hey şêrê cîhanî  
Hey mîro, mîro, tu hevîna min i lo  
**Dastanbêj :**

Mîr Şêro roj bi roj şertêñ Şîrînê bi cih tînit û li dûmahiye ahengeka mezin tête berhevkirin... Hingê çete ji bo talankirinê xo nîzîkî koçê kirin... Şîrîn diçite germavê... Ew germava tarî ji ciwaniya wê dibite ronahî. Piştî hingê rêka xo digirt û diçite goristanê.... Gundî û bajarî lê kom dibin.

### Şîrîn :

Ferhad cano zîz i ji min  
Çima mit û xemgîn i ay li min  
Ferhado, Ferhado, canê min i

Delalo çavêñ mi ji te dûr bûn  
Ji lew ra kêmnnûr bûn  
Ferhado, Ferhado, canê min i

De bersiva mi' bide ez  
derbider im

Ferhado ez a te me xolîbser im  
Ferhado, Ferhado, canê min i

Mîr Xesro te soja xo b' Ferhêd ra  
berda û havêt  
Ji ber hindê tu hatî kuştin  
ey har û şêt

Hey zikreşo, zikreşo, tu sûcdar i

Te bê ûşt Ferhad kuştiye zanim  
tu hov i

Ji hevîna te ji ez bûme bê hîvî  
Hey zikreşo, zikreşo, tu sûcdar i

Mîr Xesro, mirovkujo tu genî bûy  
û niho

Li min çavê Şêro  
Hey zikreşo, zikreşo, tu sûcdar i

Hevalan Mîr Xesro mirovekî  
zalimo

Ez ê xo bikujim ji bo Ferhado  
Ne mînim, ne mînim,  
Ferhadê min

Hevalan wesiyyeta min  
Piştî min li Xesroyî û ruyê mi' I'  
Ferhêd kin

Ne mînim, ne mînim,  
mala we ava

Ho Ferhadê pîroz  
Ji bo te me û min daye te soz  
Eman, eman, eman, canê min i

Hevalan Xudê zanê  
Ez ji bo Ferhadî me tinê  
Eman, eman, eman  
ji derdê dilan

### Dastanbêj :

Şîrîn di cih da xencera xo dertînit û xo dikujit. Gundî û bajarî ya j' wan ve Şîrîn tinê distirit û rondikan dîbaranit. Lê kesî ne zanî ku Şîrîn dê xo kujit. Nobedarek ji nobedârêñ mîrî xokuştina Şîrînê bi çavê xo dibînit, yekser diçite koçê...

### Nobedâr :

Mîr Şêro, malwérano tu serxoş i  
Şîrînê xo kuştiye û tu hêj dinoş  
Hey mîro, mîro, de bes e lo

Gundî û bajarî ketine cemîn  
Weke pelên pahîzê li  
çar aliyên Şîrîn  
Hey mîro, mîro, de bes e lo

### Dastanbêj :

Mîr Şêroyî koda meyê havête erdî û xo ji serbanê koçê havête xwarê û mir. Leşker jêra gorekê li teniştä gora babê wî dikolin û termê wî vedişêrin. Wesan termê Şîrînê jî li teniştä gora Ferhadî vedişêrin. Hingê çete têne talanê û leşkerêñ welatê farisan têne loristanê û şerekî mezin rûdidit...  
Hûn xoş û serê we sax...  
Ji kesekî ra na mînit jiyan

Te miravo eman, eman, eman  
Rojek hingivîn e û pîvaz neh rojan

**- Hew -**

### Jêder:

- Delala Koxçer, Çiyayê Reş - Botan
- Aras Efl, Kerkik
- Heyranokêñ Sora Botanî
- Bi raskurîna du hevalan - Loristan

# Cafexanê

## Sikakî

Ehmed Şerîfi

**S**ikak xêlêkî gewrey Kurde ke le nawçey (soma) le beynî Urmê û Silmasê da dejin û Mako û nawendekey çarî(çehriq)ye.

Xelkî ew nawçe ye be Kurmançî serû qisan deken ke le Kurdistanî Êran da be zarawey Şikakî be nawbang e.

Le axîrî dewranî hukumetî Qacarekam da le Êran, Muzaferedîn şa Tewrêzê weliyahd debê. Peyam denêrête kin Aixanî Şikak ke kurekey Cafexan binêrête Tewrêzê.

Cafexan le gel çend kesan deçête Tewerzê û mîwanî weliyahî debê. Rojêk le rojan mîwan Cafexan û weliyahdî têk deçê û weliyahd destûrî Cafexanî hawalanî deda. Em beyt e Kurdî ye le ser em rûdaw e le nawçey mûkiryan da heye. Cewer axay sorgulî mezinî şikakan, be sê dengan gaz deka û debêjê:

De lê Miteberê, bo min bêne dar durbîna eynelîye. Emin birwanim le baskê, baske dirêjê, le diyarî le ne diyar, le ser rîye Tewrêzê wêranê, emin du suwarim dedim zor be cildîye.

Silamîyan dekird le Ceweraxanî sorgulîye.

Qaqezêkyan bo Cewer axay sorgulîye.

Le wê qaqezêkyan denûsiye Cewer axay sorgulîye.

Layekî serê le şarî Çarî bitaş, layekî le Tewrêzê bitaş

zor be gurciye.

Cewer axay gewrey şikakan, deçûye xizmet Mamend axay gewrey şikakan.

Cewer axa delê, Mamend axam gewrey şikakan welfî ahdî Tewrêzê ew kaxezey imza kirdîye.

Ew kaxezey awa denûsiy, Cewer axa gewrey şikakan bê bo Tewrêzê be mîwanîye.

Ca nazanim fermanê Mamend axam serok aylê me çîye?

Mamend axa gewrey şikakan, delê, Cewer axay sorgulîye.

Ke to deçîye Tewrêze wêranê, bawer meke be Eceman, be...be pepax reşan, hîç îmânîyan nîye.

Cewer axa gewrey şikakan delê Mamend axam, bâbê min, emin deçme şarî Tewrêzê zor be gurciye.

Natirsim le Eceman, le...mezeban ewan hîç hicetyan nîye.

Mamend axa delê, Cewerî sorgulîye.

Eger deçîye şarî Tewrêze wêranê, etû helkejêre hewt siwarî cengîye.

Hewt siwarî cengî le şikakan, le okakan le hesenîyan, le husinîyan û le Kurdan e.

Bigire dewrî Tewrêzê bikuje ewan Eceman, pepax reşan, tiryakkêşan cêwe cêwe dujmin be binemalî Alî xanîye.

Cewer axa deçuwe xizmet Miteberê çawcundîye.

Bo min bêne derê espêkî kuwêtî qapresî hududîye.

Lêy bike zînêkî ber û piş murselîye.

Bîyhawê serî lexawêkî dane mirvariye.

Cewer axa delê, lew rowe du qaqezim bo dehatin, yekî

yan ey welîahdî Tewrêzê, ewî dî ey serhengî Taranê be aynîye.

Ew çawî min ney dedî arziye.

Laqî min le rikêbî detaziye.

Destî min berde lo le dar durbînê eynelîye.

Cewer axa delê, eger çawim be îmzay kaxezan dekewtiye.

Ew çawê min ney dediyarzîye.

Laqî min le rikêbî da detirazîye.

Destê min berde lo le dûr bînê aynelîye.

Cewer axa delê, emin le seferî Tewrêzê naymewe be yekcarîye.

Belam eger min le wê seferî nehâtimewe be yekcarîye.

Le paş axay Cewer axayî mîrd le to heram bin xuryî Simayîl axayî biçkolaney bîrayî min.

Miteber delê, Cewer axayî sorgulîye etû ke deçîye seferî Tewrêzê, helbijêrê hewt siwarî de cengîye.

Bigire şarî Tewrêzê, wêranî bike be yekcarîye.

Beqa meke be Eceman bê namûs in hîç namûsîyan nîye.

Cêwe cêwe dujmin be binmalî Alî xanîye.

Cawer axa be sê dengan debêjê Miteberê to serî xo gerdinit bilind ke seet derhêne.

Le pencerê heta emin maç kem xalî gerdinê, nek min neyêmewe le wê çuke seferê.

Cewer axa delê emin heldebjêrim le şikakan le Kurdan hewt neferê.

Yekîyan xale Mîrzo, yekî Çeko ye, yek Kerîm axayî heyderîye û yek Mehmed Tewrêziye .

Siwarîyan dekem le rîzî pêyan degrim şarî de Tewrêzê.

Ewan hewt nokeran xiretiyan bê toley axayî xo deshînewe be tewawîye.

Ewê şewê deçûne şarî xewxanê be mîwanîye.

Sibeynê de gel beyanî le bin dîwarî Tewrêzê radewestan be amadeiyê.

Welîahdî Tewrêzê destûrî deda be erteşîye.

Bigirim dewrî Tewrêzê be meslehetîye.

Eger axayî Cewer axa silawî dekird le hazirîye.

Lêkra desrêzêkîyan dekerd be çend set topî cengîye.

Cewer axayan de gel sê nokeran dekuşt be meytîye.

Cewer axayan degirt de dirkê qışley siqîye.

Ceweraxa ke serî heldêna xale Mîrzo diyar nîye.

Deygût xale Mîrzo diyar nîye.

Deygût xale Mîrzo be miyîtê axay to giryawe derkî serbazxaney sipîye.

Were meytê(?) xot kewe be nêrdîwanîye.

We serkewe bo serbazxanî, bo qışley siqîye.

Xale Mîrzo delê, axam Cewer bê Xudê kem Rebiye.

Be serî Mamend axay şikakîye.

Le şarî Tewrêzê narom heta toleyî axayekê xom nestênim be tewawîye.

Xale Mîrzo delê, bo min bênin rimhêkî heşt top reşî hejde qefîye.

Tifengêkî çuk çabukîye.

Ta we serkewem bo qışley siqîye.

Bistênim toley Cewer axay gewrey şikakan ber tewawîye.

Cewer axa ewendî ruhî le

ber da dema û serî heldêna deygût:

Tu Xwa xale Mîrzo Ecem binase, her çî pepaxî reş nîye meykuje ewe Kurd e û Ecem nîye.

Xale Mîrzo radegerî be tundîye.

Hewtî dekuştin be tewawîye.

Deygût êsta be toley Cewer xanî nîye.

Xale Mîrzo hewt şew û hewt rojan le baxî Tewrêzê şarî dekird her çiwardewrî xale Mîrzoyan degirt, belam sibeynê le gel gerdî be xoyî be sê neferanewe der deçû le şarîye.

Dehatewe şarî Xewxanê mîwan debû le kin çayçîye.

Deygût ey çayçîye.  
Emin hewt şew û hewt roja hîçim nexwardîye.

Bo min bêne nanî de gel çayçîye.

De wê demê da bîst nefer Ecem we jûr dekewtin be mîwanîye.

Xeberîyan le xale Mîrzoy nîye.

Tifengîyan dadena û serîyan rût dekirdîye.

Hendêkîyan dadeniştin be bê xemîye.

Hendêkîyan xerîk debin be tiryakîye.

Xale Mîrzo pazde neferî lê dekuştin zor be gurcîye.

Pêncî esîr dikirdin, eslasye be wan heldegirtîye.

Deygût êsta be toley axay Cewer axam nîye.

Ewê şewê Miteber deçuwe xizmet Mamin(?) axayî ridêniyê.

Deygût piderê min gewrey şikakan ew şew min xewnêkim dedîye.

De wê xewnê da Cewer axa le gel çwar nokeran dexwazê

(?) le Tewrêzê zor be bê kesîye.

Manay xewnî min çî ye û çî niye?

Mamend axa debêjê miteberê eminiş her ewê xew-nêm dedîye.

Bo min bêne ewê dar durbîna Rûsiye.

Heta birwanim le ser rîye de Tewrêzê celebe siwarêk diyar e le nedîyarî le ser rîye Tewrêzê ra dêñ zor be gurcîye.

Pêm wa ye xale Mîrzo û Kerîm axay heyderîye.

Emin axay gewrey şikakan Cewer axayam le gel nîye.

De wê demê da xale Mîrzo silawî dekird le Mamend axay ridêniyê.

Muateber çekmey xale Mîrzoy maç dekird degût, tu xwa xale Mîrzo Cewer axay gewrey şikakanit bo le gel nîye?

Xale Mîrzo debêjê muateberê çaw cundiye.

Ew ro' hewt roj e xewer im le axayî xo Cewer axayî nîye.

Nazanim Cewer axam mawe ya mirdîye?

Emin(?) toley Cewer axam hestand zor be tewawîye.

Muateber delê, xale Mîrzoy rendîye.

Ecem bê namûs in, namûsiyan nîye.

Cêwe cêwe dujmin be bine maley Alî xanîye.

#### Têbînî:

Em beyt e le salîf 1965 le zarf stîranbêj Ewla çeyaran nûsrâwe-tewe. Ewkat Ewla temenî 42 sal bû, xelki navçey serdeshtê bû. Kar û pişey her sultan gotin bû. Nazanim êsta mawe yanîc. Kak awla zor dengxoş bû. Goranîye (stîran) konekanî Kurdi û Kurîtebeyîkî zorf dezant...

Cewer axa: Bira gewrey Sim-aîl xan (Simko Şikak)

Miteber: Jimî Cewer axa bû.

# Yekemîn çiroka Kurdi ya hunerî

Salimê Casim

Fûadê Temo dihete hejmartin ji yekemîn çiroknivisê Kurd. Wi li sal 1913'ê çiroka Kurdi ya yekê di kovara "Roji Kurd" de belav kir. Berî belavbüna kovara "Roji Kurd" cara duyê sal 1981'ê ji aliye Cemal Xeznederî ve. Cemil Saïf dihate hejmari mîna yekemîn çiroknivisê Kurd, wî li sala 1925'ê çiroka xwe ya bi navê "Le Xewma" belav kir bû. Lî paşî çapbüna kovara "Roji Kurd" çiroka Fûadê Temo hate dîtin û bi dîtina vê çirokê, dîroka çiroka Kurdi ya Hunerî ji sal 1925'ê vegeriya bo sal 1913.ê.

Fûadê Temo, ku yekemîn çiroknivisê Kurd e, ji Kurdêd bajarê Wanê ye. Fûad kurê Temo begê Wanî ye. Ew yek bû ji wan kesan ên ku komeleya "Hêvi" ya Kurd di sala 1910' li Stembolê damezirandin. Kovara "Roji Kurd" organa komeleya "Hêvi" bûye û fûadê Temo yek bûye ji niviskarên wê kovarê. Wi di sala 1913'ê de hejmara yekê û duyê de çiroka xwe belav kir. Lî çiroka wî bi dûmâhî nehat. Ji ber ku tenê sê hejmar ji wê kovarê derketin û paşê hate girtinê. Fûadê Temo çiroka xwe bi Kurdiye ka ciwan û peñi nivîsandiye. Li vêrê çirokê ji tipêr Erebî dikim tipêr latînî û ji we re pêkêş dikim.

## Çirok

Şevîş kurê şivanekiye, bo xa deh saliye zarok e, belê pir çav vekiriye.

Şevîş diya xo nedîye. Bavê wî reben û belingaz e, qet tiştekî wan tune... tinê meteka Şevîş hebû, ew jî pîrek bû. Şevîş carna bal wê diçê, dilê meta xo honik dikir. Şevîş tu sala ku lu gundi teşqele nedikir, ji kes ra tiştek nedigo, tim bi xwe gel hevala xo baş diçê. Bo wan ra gotina dilmayî nedigo. Heta êvarîdana li gundi bêdeng digere. Dileyeze roja xo derbaz dikir.

Ew ci gotina Şevîş pir xweş bû, ku di riyan diço hemo Şevîş hezdikirin, rîspîye gundi hero ew mala xo dibir, xwarina wî dida, bo wî xweyêtî dikir. Her kesî ra ew zarok qencî jêre digo.

Şevîş hero êvarîda ser rê bavê xo diçê, hêviyê wî dimîne, wekî bavê ewî tê pêşiyê wî dibeze, bo xwe ser kêlek bavê xo davêje. Destê wî digire, maç dikir.

Bavê wî jî her du çavê kurê xo maç dikir, dil honik dibû.

Rojekê Şevîş dîsa ser riyê çô, hêviya bavê xo bû, gavek bihorî, roj çô, hemo erdekî tarî ket bavê wî hêj nehatibû. Şevîş nava wê tarî da tinê ma, dilê wî lez dike, car caran gohdarî dikir, bavê xo gazî dikir, tu derê da deng nedihat?

Şevîş cêkî roniş, bona bavê xwe girî baş bo xwe çô bo. Bavê Şevîş hêdi-hêdi ji aliye niwale da dengê pezan deşnê girtibû. Şevîş wî dengîbihist, rabo gazi bavê xo kir:

- Bavo, bavo...

Bavê wî jî:

- Ah Şevîş lawo tu yî, tu wê derê yî?

Şevîş:

- Herê bavo ez im.

Bay:

- Were bal min mergê min gorî.

Şevîş baziya bal bavê xo destê wî girt, maç kir. Paşî got:

- Bavo tu iro bo ci dereng mayî? Bona ci zo nehatî?

Bav got:

- Kurê min peza têr nexarı bû, ez ji piçek westî bûm lema derengî hatim.

Şevîş got:

- Ez gorî tu êdi wesan derengî nemîne tu dizani ko mal da kes tune. Ez bal kê bimînim. Girî... bav girîna kurê xo dî, birîndariya dilê wî nû bû, ava çavê wî jî vala bû...

Şivanê kal bo xa hat. Serê Şevîş nav her du destê xo stand. Ava çavê wî paqî kir, radmosa. Paş go: Kurê min

xodê mezin e, mirazê ême jî dede...

Paşî destê kurê xo girt. Hêdi hêdi hatine gundi.

Sîvan pezan hefsî dakir, paşî gel kurê xoranê çon. Mala wa da lihêf balgî tişteki wesan tune bû. Tinê melîkekê hebû bav û kur paxilê hev ketin bavê milê xo bo Şevîşî balgî çêkir. Şevîş jî serê xo ser singê bavê xo danî milê xo jî stoyê bavê xo avetê.

Hê stêra subê derketi bû. Nêzikî subê dîka dida, bayê nerm hêdi serê daran lê dixist, pelan dihejyana, dengekê xweş çêdir, hemû alî da deng dihat. Hemû gundi rabibûn, lê kur û bav hêj razabûn.

Gavek jî çô bû, Sîvan xanî da hisyar bû gava pez rakirin ru bohri bû, belê Sîvanê kal nexoş bû, nav ciya xo de dinale, car caran jî royê kurê xo mêze dikir.

Wê gavê bû rîspîye gundi derê Sîvan lêda, paşî gazî kir:

- Sîvano, Sîvano

Sîvan jî di hundir da go:

- Ho lebê...

Sîvan ciqa dixast ko rabbit derî veket, belê nexoşiyê wî nedîhişt. Dengê derî Şevîş hisyar kiribû, rabo derî vekir, rîspî hundir da hat, Sîvan ra got:

- Sîvano, tu fro bo ci wesan dereng mayî, nîvro bûye, pez hêj nava hevşî da maye birçî û bê xoyî ye, gundi galgal dikin.

Sîvan jî got:

- Rîspî, ez ci bêjim, tu min dibînî, ez iro nexoşim, nexoşiyê min giran e, lema ez rakirnê nehatim, tu fro ciyê min miroveki bişîne, ka xodê çewa çêdike, ci derî nîvi royê min vedike...

Sîvan wê gotinê go, paşî nav ciya xo ket, nalîna wî rabû... Şevîş jî nalîna bavê xo dî, dil tarî bû, ser bavê xo ket, girî...

Ev dengê lawo ci dilê rîspî şewitand, ew jî nikarî bo kimî de (bi xem ket), ava çavê wî jî vala bû...

Paşî bo xa hat, bi Sîvan ra got:

- Sîvano dilê xo teng meke, xodê mezin e, nexweşiya te giran tune, du-sê rojan derbas dibe, ez herim êki ber pezan bişînim, tu jî iro rakev, bo xwe razê de.

Zikê wî jî noha birçîye, Şevîş bila gel min bê, ka mala me de ci lénandîne, piçek têşt bînît bixon, ez jî êvarî da bêm. Şevîş şand, gel hev çon. Şevîş rê da ne xweşî bavê xwe bi rîspî ra pirsîkir rîspî jî destê xo avête stoyê Şevîş got: Kurê min kovan meke, dil vekirî be, tiştî bavê te tune, du sê rojan ew rabe serxo. Ew gotina rîspî dilê Şevîş piçek honik kir. Gavek paşî mala rîspî hatin hondir da çon rûniştin.

Rîspî xolamê xo ra gazî kir, ji wî ra got:

- Rîzqo, kurê min Sîvan nexwoş e, iro ber pezan tu here, pez hevşî da qir bûn.

Rîzqo jî bi gotina mezinê xo kir, darek destê xo girt çô... Rîspî digel Şevîş zikê xo têrkirin, amanek ji tîjî kir, bi destê Şevîşî da got: Kurê min dilteng mebe. Ev jî hêdi hêdi bo bavê xo bibe, hêvi yê jîye, bal bavê xo bibe, gotina wî bike, ci dixaze çêke, dilê wî meşkêne ez jî têm.

Jêder:

1- Roji Kurd 1913, Cemal Xeznadar peşgotin li sernivêsi ye. Baxda 1981.

2- Kovara Beyan, hejmara 101-102, Reşîd Findî (Roji Kurd rojeka ges bû).

3- Kovara KARWAN hejmara 7, Ebdulkerîm Findî Doski (Fûadê Temo kîye û çiye).

Çirok ji tipêr erebî bê guhartin hatiye wergerandin bo tipêr latînî, ji ber vê yekê hindek zehmetî di xwendina wê de hene, yan jî çirok wesa hatiye wergerandin wekî çiroknivisi nivîsandiye.

# Lo Lo Wezîro

Nawê gundê me Mêrdîn e, xoş Mêrdîn e  
 Le ser de Kelê Hacî Axa ye, le bin da bajêr û  
 Qeyserîne  
 Le ber da Ferat şamlîne  
 Be ser da degerên kelekan û qayexan û nogemî  
 ne  
 Hendek beg in, begler in, çelebîn e  
 Hendekan le destê wan darê qelwîn e  
 Beg in begler in min go babo porefendîn e

Çi sube ye wey lo babo gel beyana  
 Sê zerî derkeftin mala Garo Xana  
 Subhanellah bejna wan keçkana  
 Gelek e ciwan in mîna telê reşe rihana

Cil û bergê wan qumaşê Entabî ye  
 Ser delîngêt wan qebzê Sultan Mehmûdî ye  
 Pişta wan min go kemereka Helebî ye  
 Sîngê wan mîna ferşê mermerî ye

Lêw û rûmetê wan sor in gul gulî ne  
 Didanet wan hur in merwarî ne  
 Broyêt wan reş in qeytanî ne  
 Min go hey lê babo çawê kur mala dayîne

Her sê zeriyêt mal Gare Xana  
 Dest wane qulpêt cerran û mesînan e  
 Çûne ser kaniyêt ber malane  
 Awê xo ïnan li ser milane

Wextê qestê mal kirdîne  
 Hatiye lawkê Çeçan e  
 Heceta devar ewdane  
 Rawesta li ser avê ber malan e  
 Li berayîkê wan sê zerîyan e  
 Li wan dawa kir, yek û xotê ramûsan e

Delo, wey lo lo, ax delo lo delo lo  
 Delo lo, delo lo Wezîro o o o o  
 Keçkê mezin dibêjît hingo dizanin,  
 wê sebabê çi gotiye  
 Soleka hetik, dawa le me kiriye

Kuro lawko Çeçan e  
 Berde berokê me keçan e  
 Hed hedê Sultan e

## Mehabad Kurdi

Navê ramûsanê def me eşîre Kurdan,  
 maqwîlo gele giran e  
 Eman dêngo berê xo bidenê çî demê kurkê we  
 gotiye  
 Eman go Fatê Xan rabiye  
 Gazî dikir ho kurkê Çeçan e  
 Bike xatira Xudê û Pêxemberê axir zeman e  
 Berde beroka me keçkan e  
 Mane erd erdê Sultan e  
 Ramûsanê me Kurdan gele giran e  
 Manê erz û namwîs naw me gele giran e  
 Ramûsana me ne ramûsanê Ehmedê Zêdan e  
 Qaçaxê dewletê Turkan e  
 Şaperê teyrane, çobîşê mîran e  
 Qesabê serê kurkêt Çeçan e  
 Belê Nurê gaz dikir:  
 "Ho kurkê Çeçan e  
 kuro tu berde rîka me keçan e  
 namûs li naw eşîra me Kurda, gele giran e  
 erd erdê Sultan e"  
 Dê bila xêra Xudê, qîrê mirazê min go  
 Ev ro gohê lawkê Zêdan kete ser qêrî  
 Bêtin gal galê te  
 Ditibû gal galê ta û qêrî me keçkan e  
 Berîkella li bo Ehmedê Zêdane  
 Nawê tivenga wî dar Aleman e  
 Dagirtî li pênc fişekê Kemalî û karxan e  
 Belê qamê tivengê danaser çıkê xora  
 Xoy welgîraye ser qama herdû ran e  
 Rûniştiye ser pencê xo li ser hêlê her dû qedeman  
 e  
 Gûhê wî lê bibû li gal gal û qêriyêt keçkane  
 Sam û heybeteka gele giran ketiye naw dilan e  
 Delo lo, lo lo, hey lo lo o o o o o o o  
 Maqûlo katiye ser herkêt giran e  
 Sed barîkella li Ehmedê Zêdan e  
 Dagirtî pênc fişekê kemalî û karxan e  
 Gazî kiryê ho kurkê Çeçan e  
 Tu dizanî ez qaçaxê dewletê giranim  
 Hukmê Wesman Paşa li dewletê Turkan e  
 Min heft qetil kirîne malwêran e  
 Tu dikeme heşt ser barê hemiyan e  
 Ho kuro tu kirdibît dawayêt ramûsan e  
 Ma tu nizanî def me Kurdan erz û namûs gele  
 giran e

Eman lawkê Çeçan çawa Me lekê Meftê gel wî  
mêwan e  
Xolî bi serî malwêran e  
Kurkê Çeçan go ho kurkê Zêdan e  
Tu dizanî ezê ser te ra kem nefir ame  
Etu qaçax û fîlarî li dewlete Turkan e

Berikella li bo Ehmedê Zêdan e  
Eman çokê çepê li erdê dane  
Cokê rastê metalê Aleman e  
Çawa qeamê Alemanî lê zûrî  
Kirde ber fişekê Kemalî û karxan e  
Tırqêne ewelê dane li ber sîngê Çeçan e  
Melekê Meftê li Kurkê Çeçan bu mêwan e  
Matu nizanî erz û namûs li naw qewmê me  
Kurdan gelek giran e  
Eman dêbila bixêrbêñ geleka giran e,  
xo ferman e  
Teqêne tivengan geyîste naw ordiyan Turkan e  
Wesman Paşa lêdaye li topê mezîqan e  
Lêden li teplêt herba giran e  
Dewre dabûn li Ehmedê Zêdan e  
Li subêdî heta ku hêwarê, ser kirdiye bi Aleman  
e  
Li gel ordiyêt eskerê devletê Turkan e  
Heft şew heft rojan bi qezma Aleman e  
Belan heyif û sê sed mixabin maqûlo eman  
Roja heşte girtin lawkê Ehmedê Zêdan e  
Ew xoş mîre kefte naw destê Turkan e  
Dest û pêyêt wî kete ber kelemçan û qeydane  
Berê wî dana ber hepisxanê û zîndane  
Eman her sê xuşkan bê agan e  
Li kure lawkê xo ra Ehmedê Zêdan e  
Roja siyanê zanîbûn keftîte hepisxan e

Delolo, delo lo, lo lo, ax wey lo lo, delolo  
Delolo, delolo Wezîro o o o o o o o  
Were hayê lê wayê, li min û babo - liwê dawayê  
Her sê zeriyêt mala Garo Xan e  
Her sêk destêt xo kirdin naw destan e  
Her yekê sed zêrî úsmanî kirdine naw reşî  
kerman e  
Eba dapêça ser serê xo dapêçane  
Eman xo geyandine cem Sultan e  
Rawesta li ber derê asîman e  
Belê min go ewce dane li derkê Sultan e  
Digo ya dad ya lêtdad ya Sultan e  
Em şahêdîn li bo Xudê û Pêxemberan e  
Ehmedê Zêdan Kuştîye lawkê Çeçan e  
Mera maqûlo ser namûsê me keçkan e  
Ya Sultan tu pê bizane, erd erdê Sultan e  
Bextê xo xirap neken, nawê ramûsanê, li naw me  
millettê Kurdan gele giran e  
Emê ketîne tor û bextê te û Xudê da

Ehmedê lawkê Zêdan nehawêje zîndan e  
Amêdiyê geleka tepe ciya ne nasan e  
Nehawêje hepsa Mîsilê ciya quesab û quesabxane  
Cihê bertiliyan û reşweyan e  
Nehawêje hepsa Bexdayê, tenageyin li zimanê  
Erebane  
Nehawêje hepsa Hewlîrê ciya kasib û coyaran e  
Eman Ehmedê lawkê Zêdan e  
Bawê hepsa Wanê ser rêka wankoçerê gîrn e  
Êlê me pêda dêt û deçêt li bo zozan û germiyan e  
Em ê her sê xo dawêyne ser namûsê Sultan e  
Em ê rabîn pirç û porê xo bideyne ber miqesan e  
Serê xo bideyne ber heşan û barê xeman e  
Çunke Ehmedê Zêdan şolî kirî ser namûsan û  
xîretan e  
Kuştîye lawkê Çeçan ser namûsê me her sê  
xuşkan e  
Ya Sultan dad û bê dad nawê ramûsanê qedîm û  
zeman  
Def me Kurdan gele gîrn e

Debê Sultan wezaniye tabî berdaye  
Kelekelê wan giriye go: "Çawa hosa lin aw  
Turkan qewmiye"  
Bang kire heresan û dergewanî e  
Bişkînen qifil û kilîlê wan heps û zîndan e  
Bang bikene hepsiyan, bihêne der - Ehmedê  
Zêdan e  
Go: "Çi hewce nîne ifade û mehkeman e"  
Madam Ehmedê Zêdan kuştîye lawkê Çeçan e  
Ser namûs û erzê islam e  
Min efû kir her heft maddê pêşî  
Sebebê kuştînê lawkê Çeçan e  
Eman lawkê Zêdane daye destê her sê xuşkane  
Her sê keçkêt mala Garo Xan e  
Derkeftin li bajêrêt giran e  
Her Çar geranewe berew malan e  
Li Ehmedê Zêdan girtin rêz û ihtiram e  
Hersê zerîya min go derê dîwxanî seknîne  
Gazî dikirin babo: "Te çi hediye kerem dikey li bo  
lawê Ehmedê Zêdan e"  
Digot: Babo Ehmedê Zêdan çendî bivêt  
Li mala dunyayê ez ê lê bê xudan im  
Bila bête destê min ez î li hersê keçkan  
Ekî jêra hediye bikem li bo lawkê Ehmedê Zêdan e

## Tewaw

**Serçawe:** Birwane goravî (Karwan jimara 63 azar û nîsanî 1988- Hewlîr). Em beyte le gotinî lawikbêjî  
rehmetî Mecîd Remezan buye. Lawikbêjî newbiraw  
xelkî gundi (Pîrbube) y ser be qezay buye, we sal  
jiyane. Em beyte le pîti erebî, Kirmancî Xuwarû bê  
hiç goranêk kirawete latinî, Kirmancî Jûrû.

# Protokola Hevkariyê

## Di Navbera

### Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan- YRWK û Komeleya Ronahî ya Kurdêñ Gurcistanê de

Civaka Kurdistanî gelekî ji êrîşên dagîrkeran kişandiye û hînajî dikişîne. Bi zoreka herî paşverû hemû nixxen civaka me hatine dizîn û talankirin. Hêviya dijminan tim ew bûye ku, gelê me di nava xwe de tune bikin û navê kurdan ji dîrokê derxin. Belê Kurdan tevli hemû zoriyan xwe parastine û dîroka xwe kirine dîroka berxwedan, rabûn û serîhildanê.

Niha ji her demekê bêhtir Rojhilata Navîn û welatê me Kurdistan, bala awira gelemperia cihanê kişandine ser xwe. Nemaze, pişû rawestandina şerê Xelîcê, domaneke nuh di jiyana gelên herêmê de dest pêkir. Bi awayekî hov û dirinde şer, derbasî ser xaka welatê me bû. Belê berxwedana gelê me ya şoresserî, li hemberê dijmin û dagîrkeran bilind bû. Gelek encam û guhertinênuh hatin der.

Gelê me, di başûrê Kurdistanê de, pişû jarketina rejîma Seddam serîhildanê serxwebûn û azadiyê bilind kir. Lê mixabîn, di ber valehiya ji aliye seroketiye de, nikarîbû ji wê rewşê sudeke mezin bigre û careke din rastê koçkîrin û qirkirînê bû.

Di demeke weha de, ku li başûrê Kurdistanê ev bûyer pêktîn, li bakurê Kurdistanê gel û gerîla serîhildan û livbaziyên xwe ji bo serxwebûn û azadiyê bi qehremqanî berdewam dikin. Her weha li hemû perçeyên Kurdistanê yên din jî gelê Kurd xwe ditevgerîne û di riya serxwebûnê de xwe amade dike.

Rewşa ku Kurdistan û gelê Kurd têde dijîn, pêwîstiyekê dertîne holê, ew jî yekîtiya gelê Kurd e. Yekîtiyeka ku di nava kar û xebatê de were avakirin û bi karvaniya xwe jî bibe hêviya sazkirina wenatekî azad, serbixwe û yekhev.

Li ser van bîr û baweriyan em "Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan - YRWK" û "Komeleya Ronahî ya Kurdêñ Gurcistanê", li paytexta Almanya Federal bajarê Bonnê li hev civiyan û me bi hevûdin re ev peyman li ser van her du xalîn jêrîn ên bingehîn, îmze kir:

- Pêşxistin û nasdana çanda Kurdi,
- Nasdana û piştgiriya şoreşa serxwebûn û azadiya Kurdistanê.

Karûbarêne wê protokolê wê li gora her (3) sê madeyên li jêr rêzbûne pêkbêne:

#### 1- Xebatênu her du alî bi hevûdin re bikin:

- a) Alîkariya havûdin di warê çapkirin û weşandinê de,
- b) Dan-standina informasyonan ji her du aliyan ve,
- c) Herdu alî wê salê carekê li hev bicivin. Heger derfet peyda bibin dikarin salê du caran li hev bicivin.
- d) Hevkariya di warê muzikê, şanoyê, folklorê û hwd. de.
- e) Hevkariya di warê şandina grûpê hunermendan, xortan, nivîskaran, jinan û hwd.

#### 2- Xebatênu wê Komeleya Ronahî pê rabe:

- a) Vergerandina axaşunê Serokê Eniya Rizgariya Netewa Kurdistanê - ERNK Abdullah OCALAN, bo zimanê Rûsi û belavkirina wan,
- b) Belavkirina weşanên ku YRWK dişîne. Her weha wergeradina nivîsên pêwîst bo zimanê Rûsi û belavkirina wan,
- c) Deranîna Rojnameyekê bi navê "Dengê Kurdistan",
- d) Xebata ji bo damezirandian şaxê YRWK li Gurcistanê,
- e) Materyalên ku di arşîv û pirtûkxaneyê Gurcistanê de hene ji bo navenda YRWK werin şandin. Li gora derfetan wergerandin û weşandina wan bi tîpêni Latîni,
- f) Şandina berhemên Kurdêñ li Gurcistanê dimînin, bo Navenda YRWK
- g) Hevkariya bi şevênu ku ERNK li Ewropa û li welat amade dike re. Ji bo vê jî şandina komên hunerî (muzîk, şano, folklor û hwd.)
- h) Şandina nivîs û wêneyên (çêkirî, kişandî) ji bo Kovara Rewşenê.

#### 3- Xebatênu wê YRWK pê rabe:

- a) Şandina weşanên ku saziyên ERNK dertînin,
- b) Çapkirin û pirkirina rojnameya "Dengê Kurdistan",
- c) Şandina komên muzikê ji bo pîrozkirina cejnîn netewi yên Kurdan li Gurcistanê,
- d) Alîkariya teknikî ji bo Komeleya Ronahî,
- e) Ji bo perwerdekirina zarokêni Kurd li Gurcistanê, şandina mamostayêni zimanê Kurdi. Her weha şandina Alfabeyêni bi laftînî.

Ev peyman di mêjûya 28. 06. 1991'ê de, bi sê zimanîn (Kurdî, Rûsi û Almanî) hatîye amadekirin û imzakirin. Ev protokol wê tim derbas bibe, heta aliye yan jî herdu alî dawiya wê danazan bikin.

Serokê Komeleya Ronahî<sup>\*</sup>  
Yora Nebiyêv

Yekîtiya Rewşenbîrê  
Welatparêzê Kurdistanê-  
YRWK  
Komîteya kargêr



# Nameyêñ xwendevanan

**Birayêñ hêja,**  
xebatkarêñ Komîteya Navendî  
ya Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welat-  
parêzêñ Kurdistan- YRWK

Nameyêñ we bi zimanê Kurdî û Îngilîzî ku we ji min re şandibûn gihîstine destê min. Bo guhdariya we gelekî spas dikim. Ji min re eşkereye ku hûn xizmetekî pir mezin ji bo gelê Kurd, ji bo rîzgarkirina Kurdistanê, dîkin. Min usa jî Kovara Rewşen û çend meteryalêñ din ji, ji we wergirtin. Di nava rûpelên Kovarê de gelek qinyatêñ pir bi qîmet he-ne, bo nivîsandina dîroka Kurda ya azadîriyê. Ez ê bi dilekî şâ alîkariyê bidime kovara Rewşenê. Hergav ji we re meter-yalan, dê bişînim, ji bo xurtbûn û naskirina wê.

**Birayêd hêja,**  
EZ bi xwe li ser dîroka Kurdistanê kar dikim. Bawer dikim ez ê di vî warî de pir alîkariya we bikim. Gelek pirtûkîn min di vî warî de çap bûne, her weha ji Rûsi bo Erebî jî hatine wergendarin. Hêvîdar im hûn di derheqa hal-wexta Kurdistanê de(sosyal, ekonomikî, şerkarî,...) li ser gelê Kurd, bo azadî û serxwebûnê ji min re bişînim. Bi kîjan zimanî dibe bila bibe.

Li dawiyê ez gelekî silavan ji dilê xwe yê geş ji we re dişînim. Ji bo wî karê 'mezin ku hun bona gelê Kurd, nav û namûsa Kurdistanê, azadî û serxwebûna wê, dîkin.

Doktorê Ulmê Dîrokê  
Prof. Şeref Aşîryan  
Rewan

## Bi navê niştiman Hevalêñ hêja,

Min nameya Cotyar Zaxoyî di hejmara 5'an a Kovara REWŞENê de xwend. Ez baş têgihiştîm ku çawa û bi çi rengî Erdewan Zaxoyî hatîye kuştin. Min bihîst ku stranbêjê bi nav û deng Eyaz Yusif jî bi destê awerteya (îdareya irfî) a faşîstên Baasîn Iraqê, bi asîdî hatîye şehîd kirin.

Heke derfet hebin, ez hêvî dikim ku hûn jiyana wî hunermendê bi nirx û hêja derxînin ber çavan. Weke ku we di hejmara 7'an de li ser Ebdulla Silêman (Goran) nivîsandiye, her weha li ser Eyaz Yusif jî binivîsin.

Ez li dawiyê gelek silavêñ hevaliyê li sernivîsariya Kovara REWŞEN dikim, serkevtina we daxwaza nin e.

Tebaxa 1991  
Dijwarê Mihsosê

## Rêhevalêñ hêja û delal...

Berî her tiştî em silavêñ xwe yên şoreshgerî pêşkêşî we dîkin.

Di sersala livbaziya 15'ê Tebaxê ya dîrokî de, em hevalêñ girtiyê şer we û hemû hevalêñ serxwebûn û azadiyê û hemû gelê Kurd bi hatina vê cejnê pîroz dîkin. Hêvîdar in ku di salêñ bê de em li ser xaka welatê xwe û di nava gelê xwe de bi hev re vê cejnê pîroz bikin. Me bi xwe jî ev cejn li vir bi şadîmanî pîroz kir.

## Hevalêñ hêjan

Roja 13'ê Tebaxê 1991'ê dadgeha min qediya. Çiqas ku tişt li ser min nedîtin jî, "8 sal û 4 meh" ceza dane min, her weha gelek işkence û lêdan jî bi me kirin.

Ji 8 sal û 4 mehan ez ê 20 mehan rakevim, heya niha ez 11 meh in di zindanê de me, 9 mehîn min di zindanê de mane. Bi vî rengî ezê careke din doza serxwebûn û azadiyê bi dijwarî di nava gelê xwe de bidominim.

Tiştîn we ji min re şandibûn, negîhiştine destê min.

Li dawiyê bi navê hemû hevalêñ li vir em careke din dibêjin: "15'ê Tebaxê li me tevan pîroz be"

M. Horo  
19 Tebax 1991  
Girtîgeha Malatya

## Hevalê Delall

Ew ro "Rewşen" kota mi dest. Zaf sa bine, mi ve zewq wend. Helbestê saniki meseley zv. folklora Kurdistan neşkerdene zaf şiren o. Çutirkê neşkerdey eve sa neşrkene, wendox ki eve sa wenano.

Ez ki des û di seryo bi lehcîy zazakî sanik, meseley, helbest, qese wireno klameyi zv. neşr keno. Mi xeyle çi kerd top. Ez wazenke sima "Rewşen" de neşkerdene mi çâ çide, emege mi ke sima re, Rewşen biwo.

Sima re ju sanike û di Helbesti rusnen, wes û war bimanê.

Biraye sima  
Usxanê Cemal  
Berlin/ 16 Gulan 1991

## Hevalêñ Hêja

Ez dixwazim we zor sipas bikim bo hejmaren Kovara REWŞENê, ku hûn ji min re dişinin. Ez û niferên mala min, usa jî Koma Şanoya Kurdi ya bajare Tibilisê, bi hewaskariyeke mezin REWŞENê dixwînîn û pêre şâ dibin.

Ez bi vî cûreyî difikirim, kî ku seba pêşdeçûyîna gelê me û çanda me bi qasî quwet û zanebûna xwe kar dike, ew jî weke pêşmergeyekî welatparêz û milethez e, û bi taybetî dema ku mirov wî karî bi hezkirin û bi dilekî temîz dike. Ez ji sedî sed zanim û gumanim ku Kovara REWŞEN bi quweta mirovên usa tê hazirkirin.

Bi giliyekî, ez pir şâ me ku kovareke usa ya çandî û hunerî belav dibe. Ez ê bi hewaskariyeke pir mezin li benda hejmaren REWŞENê bim.

Şanoya Kurdi ya Tibilisê ku xebata xwe dide meşandin, li Sovyetê şanoya Kurdi ya yekemîn e. Raste, li Ermenistanê li gundê Elegezê jî çend salan şanoya Kurdi hebû, lê hema hate sekînandin û vê gavê kar naake.

Me di nav van 12 salan de me 15 piyêş hazir kirine û bi sedan spêktakl nîşanî Kurdên Tibilisê kirine (li Ermenistanê, Kazakistanê, Maskova yê, Parisê,...)

Li aliyekekî din, REWŞEN kovareke çandî û hunerî ye. Ez guman im ku hebûna şanoya Kurdi li Sovyetê ji REWŞENê re jî heweskar e.

Ez ji we re pirtûkekê li ser şanoya me dişînim, ev pirtûk li vê dawiyê li Moskovayê neşir bûye. Helbet hûn nikarin bi pirtûkê nasayî temamî şanoyê bibin û bibînîn.


Ez hêvî dikim wekî hûn hevalêñ hêja di Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan-(YRWK) de, bala xwe bidîne ser şanoya me jî, weke karibûna xwe alîkariya me bikin. Helbet eme jî li gora quweta xwe alîkariya we bikin.

Ez dixwazim wekî hûn bîzanibin em pir çetin dijîn û kar dîkin. Tu kes ji bona xebata şanoyê peran nastîne, Koma Şanoya me jî bona gel e, bona pêşdeçûyîna çanda gelê me ye. Dîsa jî pir kêm mirov pişta me digrin.

Ez ê pir şâ bim wekî bersiva nameya xwe ji we bistînim.

Bi silavêñ biratiyê

**Mirazê Ûzo**  
Serok û rîjîsorê şanoya Kurdi ya  
Tibilisê



Warekî Kurdan ê bingehîn, pîroziya Kurdên Êzidî "LALIS"

## Pêrgamênta Silêmaniyê\*

Hormozgan riman atiran kijan  
Wîsan şardawa gewrî gewregan  
Zorkarî Arap kerdina xapor  
Gunaûî palê hêta Şarîzor  
Jin û kênîkan wê dîl bêşina  
Mêrd azad li wî rûyî hêwina  
Rêwişta Zerduşt ra mano bi des  
Bêzîka nahake Hormoz wê hiç kes

\* Ev heşt rêz weha hatine pejirandin ku kevintirîn perçe ye ji toreya Kurdî ya ku gihiştiye me. Sala 1920'an li nêzîkî bajarê Şarîzorê (Silêmaniyê) di şikefta Gêşanê de li ser çermê ga hatiye dîtin. Niha di muzeya Qahîrê ya netewî de hatiye parastin. Di hejmareke Rewşenê de em ê gotareke fireh li ser vê pirsê biweşînin. (Rewşen)

**YRWK**  
*Yekîtiya Rewşenbirêñ Welatparêzêñ Kurdistan*  
**Max Str. 50 - 52**  
**5300 Bonn 1 / BRD**